

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 75 | 2019



Îskana kurdên reşîl/rişwan

Dr. Mikailî

Pêşmergeyeka ji Heymaneyê, Şîlana Mala Emer

Ali Çiftçi

Mîrza Seîd, kurdê yekem li Swêdê (1893)

Rohat Alakom

Colo

İhsan Türkmen

Varan

Rûjhat Esîman

Guldesteyek ji edebîyata cîhanê

Yusuf Kaynak

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 75 | 2019

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Bêrivan Keskin, Dr Mikaili, Seyfi Doğan,
Xıdır Uso, Nuh Ateş, Nuhê Hecî Malê Herşid,
Rohat Alakom, Mem Xelikan, Mûlla Evîndar,
Mehtab İdeli, H. D. Tutak, Rûjhat Esiman, ÎhsanTürkmen,
Rohat Miran, Xızan Şilan, Yıldız Karagöz, Yusuf Kaynak

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK — Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro—Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec—Tryck AB



Pêşmergeyeka ji Heymaneyê li Başûr, salên 1980î Şilana Mala Emer

Wêneyê berga pêşin: Îna Heselmên li Xelika (Karacadağ- Kulu)

Wêneyên berga paşin: Salên 1930î li Încovê hilanîna xermanan

Ji arşîva Kartzade Halil Efendî (Tornî Xelî Girdê)

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîn,
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almaniyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ji bîrnebûnê, <i>Ali Çiftçi</i>	4
Îskana kurdên reşî/rişwan, <i>Dr. Mikailî</i>	6
Ji vir û wê, <i>Nuh Ateş</i>	15
Sohbetek bi Şilana Mala Emer re, <i>Ali Çiftçi</i>	18
1840 - 1844 ji Hilkeçikê ber bi Qandîlê, <i>H. D. Tutak</i>	34
Mîrza Seîd, <i>Rohat Alakom</i>	42
Şopên dema xatirxwastinê, <i>Nuhê Hecî Malê Herşîd</i>	55
Xerîbî, <i>Bêrîvan Keskîn</i>	56
Serketin azadî ye, <i>Yıldız Karagöz</i>	57
Siyarên deşta Anatolîyê, <i>Xidir Uso</i>	60
Çend gotin, <i>Seyfi Dogan</i>	62
Colo -1, <i>İhsan Türkmen</i>	65
Şadiyê dirêsim, <i>Xizan Şîlan</i>	69
Varan, <i>Rûjhat Esîman</i>	70
Nameyek ji <i>Selîm Temo</i>	72
Helbest: Jana dil, Şeveke payîzê <i>Mûlla Evîndar</i>	73
Quto, <i>Seyfi Doğan</i>	74
Çend peyv û gotinên me - 2 -, <i>Mehtab Îdelî</i>	75
Veqetî, <i>Rohat Mîran</i>	82
Guldesteyek ji edebîyata cîhanê, <i>Yusuf Kaynak</i>	83
Helbest, <i>Mem Xelikan</i>	90

Ji bîrnebûnê

Xwendevanên delal, em dîsan bi dilekî şikeştî bi hev re ne. Di vê demsala payîza ku em ber bi zivistanê ve diçin, însanên me li Rojavayê Kurdistanê dane ber devê topan, ji mal û warê xwe derbeder bûne.

Ev salên dawî li kuderê kurd bûne xwedîyê hinek destkeftîyan, li wir bûne hedefa dagirkeran. Li Bakur piraniya şaredariyên bajarên kurdan dema ketin destê kurdan, dewletê tamûl nekir, bi darê zorê dest da ser şaredariyan.

Li Başûr referandûm çêbû ji sedî 92ê erê kirin, dîsan bi serkêşîya dewleta tirkî erê û farisan êrîşê Kerkûkê kirin û qebûl nekirin.

Li Rojava ev çend sal in rêveberiya wir ketîye destê kurdan dîsan dewleta tirkî tamûl nekir, siftê êrîşeka pir dijwar bi rêya hevalbendên xwe yê wek *Dewleta Îslamî* anîn ser bajarê Kobanê, dûre Efrîn û niha jî seranserê Rojavayê dane ber topan!

Armanca dewleta tirkî di vê êrîşa hovane de ev e ku kurd nebin xwedî tu statûyê û ji bo wê jî dixwazin demografiya Kurdistanê xira bikin!

Em hêvî dikin rewş bi aqlêselîm çareser bibe û di zûtîrîn demê de ev kuştin û malwêranîya li Rojava bê sekinandin! Dilê me her ji bo Rojava lêdide!

Xwendevanên birêz, di vê hejmarê de Dr. Mikailî bi sernivîsa *Îskana kurdên reşî* li gor belgeameyên arşîva serokwezerata Tirkîyê yê dema osmanîyan bi pêşgotinekê wergera belgeameyan bi kurdî, tirkî û li gel orijînalê osmanî bi tîpên latînî amade kiriye.

Birêz Nuh Ateş, di quncika bi navê *Ji vir û wê* çend kurtenivîsên balkêş ji bîranînên xwe yê civakî, sosyal û çend nimûneyên înkârî, bêtehemûlî û nîjatperestîyê nivîsiye.

Hevpeyvînek bi Şîlan Yaşarê re bi sernivîsa *Sohbetek bi Şîlana Mala Emer re* hatiye kirin. Şîlan bi xwe ji Heymaneyê ye. Di dema cuntaya 1980î de pîştî ku ji hepsê derdikeve berî xwe dide Başûr û dixwaze bibe pêşmerge. Di vê hevpeyvînê de Şîlan li gel serpêhatîyên xwe rewşa berî cuntaya 1980î jî şirove dike.

Birêz H. D. Tutak bi sernivîsa *1840-1844 ji Hilkeçikê ber bi Qandilê*, ji arşîva serokwezerata Tirkîyê di belgeameyên osmanîyan de defterên kurdên Hilkeçikê yê nufûsa derheqê malbatan de wergerandîye kurdî û li

gel orijînalê belgeyan bo kovara med amade kiriye.

Rohat Alakom bi lêkolînên xwe yê li ser dîroka koçberîya kurdan tê nasîn û xebatên lêkolînên hêja kiriye û heta niha bi dehan kitêbên li ser koçberîya kurdan bi kurdî, swêdî û tirkî nivîsîne. Di vê hejmarê de dîsan lêkolîneka bi navê *Mîrza Seîd, kurdê yekem li Swêdê (1893)* nivîsîye.

Yildiz Karagoz, bi *Sernivîsa Serkeftin azadî ye*, Îhsan Türkmen bi rêze nivîsa *Colo*, Xîzan Şîlan bi helbesta xwe ya *Şadiyê dirêsim*,

Rûjhat Esîman bi devoka şêxbizîni *Varan Mûlla Evîndar* bi du helbestên xwe, Seyfî Dogan bi navê *Quto* kurtehelbestên nû û Mehtap Îdelî bi berhevkirina *Çend peyv û gotinên me* ev hejmara ji alîyê edebî û ziman de dewlementir kirine. Yusuf Kaynak, bi navê *Guldesteyek ji edebîyata cihanê* kitêbek nivîsîye. Ji bo Bîrnebûnê bahs kirîye ku wî ev berhem çawa û ji bo çi nivîsîye.

Heta hejmara bê bimînî di xêr û xweşîyê de!

Alî Çiftçi

Çend agahî bo hevkar û nivîskarên kovarê

Ev 22 sal in em kovara Bîrnebûnê salê sê an çar hejmara derdixînin. Ji 1997an heta niha 75 hejmar derketine. Di destpêkê de piraniya nivîsên ku ji kovarê re dihatin bi tirkî bûn û peyderpey nivîsên bi kurdî zêdetir bûn. Car caran nivîsên bi zazakî û şêxbizinkî jî hatine nivîsandin. Niha kovar wek tê zanîn tenê bir kurdî tê weşandin.

Wek her kovarekê ya me jî li gor hin prensîpên rastnivîsîna zimanê kurdî ji xwe re bilbijartîye.

- Eger navên taybetî nebin, ew nav di hevokê da bi herfên biçûk bînin nivîsandin. Nimûne: kurd, kurdî, almanan, almanîyan, reşî, canbegîyan. *Li Hamburgê canbegîyek rastî reşîyekî tê û bi hev re almanî deng dîkin.*
- Di tewandinan de koka gotina neyên guhartin. Nimûne: **alîkarî**, **alîkarîya min**, **bawerî**, **bawerîya min**.
- Di hevokên sernivîsan da gotin bi herfên biçûk bînin nivîsîn eger navên taybetî nebin. Nimûne: *Sohbetek bi Şîlana Mala Emer re, Îskana kurdên reşî*

Îskana kurdên reşî/rişwan

Dr. Mikaîlî

Xwendevanên bi rûmet, me di hêjmara çûnê da bi tevayî, giştî ji we ra qala îskana kurdan li Anatolîyê, bi piranî jî li Anatolîya Navîn kirî bû û kurdîya çend belgenameyan ji arşîva Osmanîyan pêşkeşî we kirîbûn.

Di vê nivîsê da em ê bi taybetî belgeyeka îskana kurdên reşî li devera Konya, Ankara û li Anatolîya Navîn ya bi zimanî Osmanî pêşkeşî we bikin.

Hîn pir dokument hene, le vava gelek girîng û zelal e. Ji bo vê me ew ji nav da hilbijart.

Zimanî osmanî da û di fermanên resmî da gelek pesinandina sultan û mîran heye. Ji ber ku bi piranî ne li ser naverokê ne, em vana li vir nanivîsînin. Em ê ji we ra qala bûyer û tiştên girîng bikin, yanê yek û yek wernagerînin kurdîya kurmancî!

Hêjayî gotinê ye ku piranîya êlan berî 1830an hatine Anatolîyê û hîn ji xwe ra gund û bajar ava nekirine. Lê ji ber ku xelkê derdorî wana ji zerar û zîyana kurdên koçber aciz bûne, eşîyane, hertim serî

li Stenbolê xistine, ew gilî kirine û ji wana şikayetdar bûne. Boyî vê Dewleta Osmanî dixwazin hendî wana li gundan parva bikin yan jî ji wana ra gundan ava bikin. Ew pêvajoya hetanî sala 1865an meşîyaye. Osmanîyan ferman dane ku hendî kurd li Anatolîya Navîn bi rîya tayîna memûrên Stenbolê, qaimaqama bêne îdarekirin.

Piştî 1865an şûva hendî kurd li Anatolîya bûne xadan gund û nekarîne herin zozanên, weka Uzunyayla-Sêwas, Çerkeş û Çankiriyê (Kengirî). Sedema herî giring ya îskana wana jî ew e ku devlet dixwaze ji wana baştirîn bacê hilgire û ji wana bona xizmeta xwe eskeran berhev ke! Ew mesele di va belgenameyan da gelek zelal û eşkere hatiye nivîsandinê.

Wekî din jî em dixwazin wek kronolojîk, ji arşîva osmanîyan ferman û bûyerên di derheqa reşîyan da li vir bidin we. Ew piranî bi tirkîya kevn ya osmanî ne.

Di belgenameyan da em dibînin ku qala *aşîret müdürü* yan jî mirî,



Xerîta îdara sancaxa Ankarayê

begî reşîyan tê kirin î ku navî wî Mustafa Beg bûye.

Qasî em dizanin li Konya û Heymanê ji reşîyan du Mustafa Beg hebûne.

Yek ji Incowê kalê malbata, be-
ra Qerta ye. Ew weka mala Xellî
Girdê jî dihatin naskirin.

Kalê Qerto Axa, bavê Hec
Ehmed Beg, Mustafa Beg e.

Di îskana gundî Kuşca (Hecile-
ra) da navê wî derbas dibe. Ew di
salên 1825an da jiyaye û mîrîtiya
êla nasirîyan jî kiriye.

Yê din jî dîsa ji êla nasirîyan,
gîrêdayî federasyona reşîyan, Kara-
gedikli Mustafa Efendî ye. Qasî em
dizanin, ew jî beg bûn û bi dewletê

va kar dikirin. Wî di encûmena
Heymanê da jî cih digirt. Di wextê
herba Yunên da jî piştgirîya Musta-
fa Kemal kiriye. Yanî 1922an da hîn
sax bûye. Wek sal û wext Karage-
dikli Mustafa Beg piştî dewrê îskanê
şûnva jiyaye. Bes em nizanin gelo
navê bav yan jî kalî wî çi bû? Yan jî
ji reşîya Mustafa begekî din bû?

Weka li vê derana qal dikirin û
digotin: Malbata Qerto derebegî
bûn. Hukmê wan di dewrekê de
dimeşîya. Îhtimala mezin î ku di is-
kana reşîyan da rolek lîstîye jî ew bû.

Fermanên ku tê da navê Mus-
tafa Beg derbas dibin ev in; Reisiya
Mustafa Beg di nav salên 1860-
1880 da ye.

Türkî:

29-10-1266 1850 Paşadağ ve Konya'da bulunan Reşvan Aşireti'nin iskanıyla uğraşan Halim Bey ve Cihanbeyli Aşiret Müdürü Alişan Bey, garazkarane davranarak aşiret mallarının telefine sebep olduklarından sahip oldukları makam, rütbe ve nişanların geri alınmasına, ayrıca Cihanbeyli Aşireti'ne kaymakam olarak Ali Ağa'nın tayin olunduğuna dair Ankara valisine şukka.

Kurdî:


M:1850: Şukkaya Valîyî Ankarayê: Ji ber ku mudirî êla canbegan Alişan beg û Halîm beg di îskana êla reşîyên ku li çiyayî Paşadax û Konyayê da diman, xerezî bi êlê kirine û xerawî bi mal û mulkî xelkê anîne, maqam, rûtbe û nîşanê wan ji wan bên stendin û Ali Axa li cîyê wî bibe qaymaqamê êla canbegan.

Türkî:

[H.20-11-1281 (M.1864) Rîşvan Aşireti Müdürü Mustafa ve Cihanbeyli Aşireti'nden Ömer Bey taraflarından Ankara Eyaletince olan irtibatlarının feshi hususuna dair Hüdavendigar mu-tasarıfının şukkası. (26. Anadolu)]

Kurdî:

Biryara qutkirina û birîna têkilîyên Mûdûrî êla reşîyan Mustafa Beg û êla Canbegan Ömer beg bi eyale-



Belgenameya îskana eşireta reşîya

ta Ankarayê va ji hêla Sancax begî Hüdavendigarê va. (Hüdavendigar navê bajari Bursa yê beri 1924an bû.)

Türkî:

[H.14-01-1297 (M.1880) Konya, Ankara ve Sivas Vilayetlerinde meskun Reşvan Aşireti'nin Reisi Mustafa Bey'in rüşvet ve yolsuzluğuna dair şikayetler üzerine, söz konusu vilayetlerden olayın araştırılarak neticesinin bildirilmesinin istenildiği.]

Kurdî:

M:1880: ji ber nebaşî û ruşvet-xarinên reisî êla reşîyan ya li bajar û vilayetên Konya, Ankara, Sivasê Mustafa beg da gîlî û gazinc hene,

ger li ser vê lêkolîn bên çekirin û encam bêt xebardan.

Sal Hicrî 1246 (Mîladî: 1830)

Tezkereya Alîşan begê di derheqa îskana reşîyan da; reşî dixwazin ne li Sivasê, li Ankara û Qonyê bên îskankirin.

(Not: Alîşan Beg mîre Canbe-gan e, piraniya kurdên Anatoliyê bi alîkariya wî û di bin îdara wî û mal-bata wana da hatine îskankirin.)

Hat 0446/22289 î

Ji Sultanî min î mezin, hêja û qe-dirbilind re...

Wekî tê zanîn kurdên reşî û êlên din ku li dorberî Ankara û Konyayê dimînin, li gor nivîsa, nameya Mûtesellîmî Sivasê Said Axa gelek zirar û zîyan dane dorberê xwe û gelek eşqiyatî kirine. Herçiqas kurdên reşî bi piranî hendî di bin kontrola dewletê da bin jî, hinek ji wana dîsa jî xerabîyê li xelkê fiqare dikin.

Ji ber vê ew hewceyî îskaneka mecbûrî ne, gerek em wana li dereka sabit bi cîhûwar bikin. Eger hûn emr û fermanê bidin, bi rîya walîyê Konyayê em dikarin vî karî bikin.

Wekî din ew pirsgrêk bi tu awakî din çareser nabe! Reşîyan he-ta nika tu li derekê avahîyeka wan

nîne û darek jî li ser vî erdî nereşan-dine û neçinandine.

Rêşî bi piranî li biharan bar dîkin terin Uzunyayla -Sivasê û payîzan jî dîsa têne dorberê çiyayî Paşadaxê. Konyayê. Uzunyayla 12 saet ji Sivasê dûrtir e. Di çûyîn û hatina wan da li ser rîya wana, xelkê van derana gelek zirar û zîyanê ji wana dibînin û ji wan gilîdar in. Gereg em bi îskana wana pêşîyê li wê bigrin.

Ji bo ku ew kar baş bê kirinê hewce ye ku hûn ji beg û begza-deyên wana ra fermanê bişînin û Mutassarîfî (Sancax begî) Kayserî, Konya, Bozok, Ankara û Sivasê jî bi hev ra têkildar bin û bi hev ra kar bikin. Wengî ew îskana wana baştirîn bi ser dikeve.

Ji bo ku ew li gundan bi cîh bibin û li dû pêz dîsa nerin zozan, lazim e ku pez û kerîyên wana ji destî wana bête hilgirtin û bibe malê we. Tenê *Kara sixir* (naxir) ên wana ji wan ra bimîne. Eger ew bi cotkarîyê va mijûl bin û gundî bin, hendî pêz xadî nekin, bar nakin, narin zozanan û tu zirarê nadin dorberên xwe. Hewce ye ku çûyin hatina wana ji bo dereka din, bajareka din, tenê bi îzna memûrên we be û bêdestûr nekarin ji cihên

Orijînala belgenamê bi zimanî tirkîya Osmanî;

Hat 0446/22289 İ

Rışvanların Sivas'da değil Ankara ve Konya'ya iskan edilmek istediklerine dair Alişan beyin tezkiresi Sene 1246

Devletlû inâyetlû âtîfetlû re'fetlû veliyyü'n-ni'am vefûru'l-cevd ve'l-kerem efendim sultanım hazretleri

Konya ve Ankara topraklarında meştâ nişin olan Rışvan ve sâ'ir aşâyirin bir taht-ı zâbıtaya idhâlleri zımnında lâyah-i hatır-ı çâkerî olan mütâla'âtın arz ve iş'ârıyla takdîm-i hak-pây-i veliyyü'n-ni'amîleri kılınan arîza-i çâkerânemin vusûlünde Sivas mütesellimi Said Ağa bendeleri tarafından vurûd eden tahrîrâtta zikr olunan Rışvan ekrâdının (Kürtlerinin) Bağdad caddesinde ne suretle habâsete ibtidâretmiş ve sâye-ime'âlî vâye-i hazret-i cihandârîde bertaraf olmuş ise de bunların iskânları takdirinde ta'addiyât-ı vâkı'alarının indifâ'ıyla nice muhasse-nât ve intifâ'ı müstelzim olacağına mübtenî muvâfık-ı irade-i seniyye buyurursa iskânları maddesinin suret ve mevsimini etrafiyla tahrîr edeceğini yazmış olduğundan cümlesi huzur-i mekârim-nüşûr-i hazret-i padişahiye arz ve takdim ile meşmûl-i lehâza-i

cenab-ı şehinşâhî buyurularak bu Rışvan aşiretiyle aşâyir-i sâ'irenin ekserisi öteden beri gasb ve gâret ve dürlü fezâhat ve şekâvet ile me'lûf olarak bir takım ahali ve fukara ellerinden bî-zâr olmuş ve her ne kadar vülât ve hükâm bunların indifâ'-ı mazarratları maddesiyle uğraşmış ve uğraşmakta ise de kendülerinin yer ve yurdları ve bir mahalde dikilür ağaçları olmayup usûl-i idareleri dahi taht-ı zabıtada bulunmamak hasebiyle şimdiye kadar zabt ve rabtları layıkıyla mümkün olamamış idüğünden Konya ve Ankara topraklarında Rışvan'dan mâ adâ meştâ nişin olan aşâyirin cümlesine inhâ-yı çâkerî vechile Konya Valisi bulunan vüzerâyı izâm hazerâtı nâzır nasb olunarak takayyüdât-ı lazıme derciyle iktizasına göre bir kıt'a memuriyet emri şerîfi isdâr olunması ve mârru'z-zikr Rışvan aşireti ol ...Sivas'ın on iki saat ilerisinde Uzunyayla ve Habeş nam mahallere azîmet ve güz mevsiminde Konya tarafında kâ'in Paşadağı'na avdet ve ara yerde olan elviye ahalisine envâ'-ı hasâret etmekde olmaları hasebiyle bunlar dahi Sivas civarında kabile kabile münasib mahallere iskân olundukları surette yaylakları mahall-i karîb düşerek ol vakit kendüleri dahi Sivas'da hane ve emlâk

ashabından bulunacaklarına göre Sivas'da bulunan hükkâmdan çekinerek zabt ve rabt ve idarelerine ez her cihet sühûlet geleceği me'mûl olmak hasebiyle bu madde dahi mütesellim-i mûmâ-ileyhe bildirilerek evvel emirde iskânları ne surette ve hangi mevsimde olmak lazım geleceğini bi'l-etraf tahrîr ve Sivas kazalarından bu madde zımında i'lâm ve mahzar ahz ve tesyîriyle ba'dehû sudûr edecek emir ve irade vechile harekete ibtidâr eylemek üzere mütesellim-i mûmâ-ileyhe iş'âr kılınması bi't-tensîb ol vechile icrası hususuna irade-i seniyye-i şahane ta'allukuyla ol babda levhâ pîrâ-yı sudûr buyurulan hatt-ı hümâyûn-i kerâmet-makrûn-i tâcdârî mücebince emr-i şerîf-i mezkûrun tasdîr ve savb-ı çâkerîye tesyîr olunmuş ve mütesellim-i mûmâ-ileyh bendelerine dahi vasâyâ-yı mukteziye tahrîr buyurulmuş olmağla icabı vechile mütesellim-i mûmâ-ileyh ile bi'l-muhâbere infaz ve icralarına mübâderet kılınmak ve kerâmet-efzâ-yı sudûr buyurulan hatt-ı hümâyûn-i mülûkânenin bir fıkra-i münîfesinde bu vesile ile gerek vali ve gerek hükkâm ve mahâll-i sâ'ireden akçe kazanmak misillü tama' ve irtikâba sapılıp

da hak ve hakikati üzere mahv ve layıkında nizâm ve intizâmına bakılmaz ise bir güne te'sîri olmayarak nizâmın dahi pâyidâr olamayacağı emir ve ferman-ı mülûkâne buyurulmuş idüğü ifadesini şâmil zeyb-i edâ-yı enmîle-i tefhîm olan emir-nâme-i sâmilîleriyle emr-i şerîf-i mezkûr zîver-i pîrâ-yı cây-ı ta'zîm ve mantûk-ı emr-i âlî ve mezâyâ-yı tahrîrât-ı sâmilîleri rehîn-i ittîlâ'-ı çâker-i müstedîmleri olmuş ve derhal Konya ve Ankara topraklarında meştâ nişin olan aşâyir beyleri ve bey-zâdeleri ve sâ'irlerine emr-i şerîf-i mezkûrun suret-i mûmzâsı ve mücebince vasâyâ-yı lazıme derciyle bu tarafa gelmeleri için buyuruldular tasdîriyle söz anlar mübaşirler ile tesyîr olunmuş ve emir ve iradelerine imtisâlen mütesellim-i mûmâ-ileyh bendeleriyle iskân maddesini mükâtebeye ibtidâr üzere iken işbu iskân maddesine dair mütesellim-i mûmâ-ileyh bendelerinin mahsus tatarıyla savb-ı çâkerîye vurûd eden tahrîrâtında işbu aşâyir hakkında savb-ı çâkerîden istid'â-yı âcizânemle tarafından vâkî' olan inhâsı bi'l-müsâdefe taraf-ı eşref-i veliyyü'n-nî'amîlerinden tarafına tastîr buyurulan emir-nâme me'âlinin icmâlen ifadesiyle bu Rîşvan aşâyiri

zıkr olunduğu vechile Sivas havali-
sinde yaylayup ve güz mevsiminde
Konya toprağında Paşadağı'nda
meştâ nişin olduklarından aşâyir-i
mezbûrenin kâffe-i hayvanat ve
hiyâm ve emvâl-i sâ'ireleri yedlerin-
de iken münasib mahallere iskân
olunsalar bile me'lûf oldukları aşâyir
usûlünden çıkmayup yine yaylaya
azimet etmek dâ'iyesinde olacakları
nümüvdâr ve bu suretle i'tiyâd eyle-
dikleri şekâvetten geri durmayacakları
âşikâr idüğünden bunların iskân su-
reti meştâdan hareket etmeksizin
icra olunması muhasenâtta hâlî
olmamak hasebiyle hemen bir an
akdem maslahata şurû' olunarak
Kayseriye mutasarrıfı ve Sivas ve
Bozok ve Ankara mütesellimleri
çâkerinizle birleşüp müste'inen bi-
tevfikillâhi ta'âlâ oldukları mahalde
hasr ve taziyik ve yedlerinde bulu-
nan şeterân ve ağnâm ve hiyâmları
cânib-i mîriyçün zabt olundukdan
sonra kusûr-ı yedlerinde kalan kara
sığır hayvanatıyla emvâl-i sâ'ireleri
kendülere terk olunarak münasib
mahallere ik'âd ve iskân ettirildiği
halde bi'z-zarûr çift ve çubuk asha-
bindan olacakları cihetle ol vakit
kendülerden asker tahrîri ve sâ'ir
hidemât-ı seniyye tanzîmi mümkün
olacağı beyanıyla işbu ifâdât-ı nezd-i

çâkerîde tasvîb kılındığı surette bu
vechile hâk-pây-i aliyyelerine da-
hi arz ve inhâ edeceğini bi't-tafsil
istihrâc gûne iş'âr etmiş olmağla fi'l-
hakika mütesellim-i mûmâ-ileyhin
işbu ifâdât ve iş'ârâtı üzere

Bu aşâyir taifesinin böyle bir kavî
taht-ı râbıtaya idhâlî sureti istihsâl
olunmadıkça yoluna girmeyecek-
leri zâhir olduğundan mütesellim-i
mûmâ-ileyhin inhâsı vechile bu
keyfiyetin savb-ı âlîlerine taraf-ı
çâkerîden arz ve inhâsı hayliden
beru hâtır-ı çâkerîde deverân etmek-
te ise de bu hengamda memâlik-i
saltanat-ı seniyye ahalisinin tahrîr
ve sebt-i defter olunması maslahat-ı
hayriyyesi henüz desîde-i hitâm ol-
mamış olduğuna ve malum-i âlîleri
buyurulduğu üzere bunlar hakkında
bu iskân suretinin icrâsı haylice uğ-
raşılmağa muhtac olacağına binâ'en
tahrîr-i ahali madde-i hayriyyesi
bi-tevfikillâhi ta'âlâ rehîn-i hüsn-i
hitâm oldukdan sonra kaleme alın-
mak ve evvel emirde işbu sudûr
eden emr-i âlî mücebince beyleri
şurût ve kuyûda rabtla bi'l-intihâb
nasb olunmak ve bir mahalden bir
mahalle gidüğ gelenleri kefaletle
bağlanarak mürûr tezkiresiyle gidüp
gelmek misillû mevâdd-ı ma'lûme
ile bunlara bu yüzden teklif-i itaat

olunup içlerinden kabul edecek ve etmeyecek takımları anlaşılacak şimdilik şöyle oldukça taht-ı zabıtaya idhâl olunduğu takdirce ileride icabı vechile taht-ı nizama rabtlarına mukaddem hüsn-i suretleri arz olunmuş idüğü beyanıyla mütesellim-i mûmâ-ileyhin işbu gûne vâki' olan ifâdâtı şu tahrîr-i ahali madde-i hayriyyesi rehîn-i hüsn-i hitâm olmaksızın işbu iskân maddesine başlanılması nezd-i çâkerîde tensîb olunmadığı suretleri mütesellim-i mûmâ-ileyhin savb-ı çâkerîye vurûd eden tahrîrâtına cevab olarak yazılmış ve zikr olunduğu vechile bu havâlide olan aşâyir beyleri ve söz sahiblerinin taraf-ı çâkerîye celbi zımnında suret-i emr-i âli ile buyurulduklar gönderilmiş ve aşâyir-i mezkûrenin işbu suretin kabul ve adem-i kabulünde ne vechile harekât ve mu'âmelâtı anlaşılırsa icab ve iktizası vechile taraf-ı veliyyü'n-ni'amîlerine lede'l-arz ne vechile irade-i seniyye ta'alluk ederse ona göre hareket olunacağı dahi mütesellim-i mûmâ-ileyhe bildirilmiş ve mütesellim-i mûmâ-ileyh tarafından vurûd eden tahrîrâtı dahi leffen takdim kılınmış olmağla bi-mennihî ta'âlâ keyfiyet

tahrîrât-ı mezkûre mütâla'asından dahi malum-i âlileri buyurulduklarda gerek mütâla'a-i çâkerî vechile husus-ı mezkûrun tahrîr maddesi bi-mennihî ta'âlâ rehîn-i hüsn-i hitâm olunca kadar tevkîfî ve gerek mütesellim-i mûmâ-ileyhin iş'ârı üzere hemen iktizası vechile evâmîr-i şerîfesinin isdârıyla icrasına ibtidâr olunması şıklarından her hangisi muvâfık-ı re'y-i âli buyurulur ise bezl-i makdûr olunmak üzere keyfiyetin savb-ı bendegâneme iş'ârına sarf-ı lehâza-i inâyet buyurmaları niyazı zerî'a-i te'kid-i ubûdiyetim olmuştur inşallah ta'âlâ muhât-ı ilm-i menât-ı rahîmâneleri buyurulduklarda ol babda ve her halde emir ve ferman devletlü inâyetlü âtîfetlü re'fetlü veliyyü'n-ni'am vefûru'l-cevd ve'l-kerem efendim sultanım hazretlerindir.

Fî gurre-i C sene 46.

Çavkanîya xerîtê:

Ankara Sancağı İdarî bölünüş haritası
T.C. ANKARA ÜNİV. SOSYAL BİLİMLER
ENSTİTÜSÜ, COGRAFYA (TÜRKİYE
COGRAFYASI) ANABLİM DALI

ANKARA SANCAGI'NIN TARİHİ
COGRAFYA BAKIMINDAN YERLESME VE
NÜFUSU (1871-1907)

Yüksek Lisans Tezi

Birsan Edanur Yıldırım, Ankara-2006

Ji vir û wê - Çend kurtenivîs-

Nuh Ateş

Kuştina pîrik, moz û mişkan

Meriv, bi taybetî jî cîsnê wî yê nêr heyîyekî jîndar û kujer e. Meriv ne tenê merivan, ew heyvan û nebatan jî dikuje û xeraw dike. Bi gotineke din, ew jîndarekî xerawkar û gu-nehkar e. Pir caran ew guh nade ser şîret û qedexeyên kulturî û dînî yên derbarê kuştinê da jî.

Li tetîla havîna îsal li gundê Xelika (Karacadag) li ger û çerxbûnan ez raste pîrik, moz û mişkan, kurm û kêzan, têyr û tûyan dihatim.

Bi van rasthatinan demên zaroktî û xortanîya min û xerawîyên ku min bi heval û hemsalîyên xwe va li wan dikirin dihatin bîra min û li ber çavên min rêz dibûn. Ez pê vi ber xwe diketim.

Heşên hîngê bûn, çi heyf e, me ezîyatên giran li wan dikirin û ew dikuştin. Xortên nûgihêştî bûn em. Me guh nedida şîretên mezinan. Zîyankar zêdetir xort bûn, keçikên hemsalên me pir teve van gune-karîyan nedibûn. Niha, dixwazim qala çend nimûneyan ji wan bikim.

Min û heval û hemsalên min me mozek ji yên sersor digirt. Mozê sersor yekî li gor yên din dirêj e û çar

perikên wî hene, jê dudîyên dirêj û dudu jî kurt bûn. Li rast û çep, li her keleka wî perikekî dirêj di bin wî ra jî yekî kurt heye. Sewê ku ew nefire û ji dest me nehere, me perikên wî yên dirêj jêdikirin. Wî nedikanî bi perikên kurt bifire. Me serîkî dezîyê dûrinê yê vîqasî du-se bihosta dirêj, li nava wî girê dida. Serîyekî dêzî din jî dest yekî ji me da bû.

Paşê em li qula pîrikê digerrîn. Ku me qula pîrikê didît şûnda, vê carê me dixwast em kontrol bikin ka di vê qulê da pîrik heye na. Yekî jî me devî xwe nêzikî qulê dikir û digot “kurrrr” û çend cara ev dubare dikir. Bi vî dengî û bi teperepa me pîrik bi lez berve dêrî qulê dihat û dadiket lê dernediket derva. Li ber derî qula xwe bi lîngan li ber xwe dida ku hêlûna xwe biparêze. Paşê, me moz berdida qulê pîrîke, lê serîyekî dêzî di dest yekî ji me da bû. Moz dadiket qulê. Demekê me dipa û ji xwebixwe ra wer digot: “Moz gihêste mala pîrikê. Pîrikê moz kire mîvan û jê ra qehweyek çêkir. Wan qehwe vexwarin û dûv ra moz li stuyê pîrikê nihîşt...” Ga-veke şûnda me dezî giran û giran

berve jor dikişand. Moz pîrik dida ber xwe û ew ji qûlê viderdixist. Me pîrik dikuşt û moz berdida. Lê ji ber ku perikên moz hatibûn jêkirin, wî nedikanî ku bifire. Yanê me ew jî terke mirinîyê dikir.

Me xêr bi mişkên çolê jî nedikir. Me bi keviran bere wan dida. Carna jî me av berdida qula wan û hînge ew ji qulê viderdiketin. Dûv ra me ew didan ber keviran. Welhasil me eziyet li wan dikir û ew dikuştin. Me hêlûnên çûçik û kevokan dixelandin û hêkên wan dişikênan...!

Ez pir pir poşman im.

Kuştin bûye bêtesirkirin

Di medya Tirkîyê da îsal jî li tetilê dîsa xewerên li ser şer, kuştî û şehîdan. Leşkerên ku di şer da tên kûştin wekî şehîd tên bi navkirin. Lê hemberîyên wan, gerilayên ku tên kûştin wekî terorîstên ku hatine bêtesirkirin tên binavkirin. Çi sêyre, malneketno, mîna ku bibêjî, ew ê kuştinê an mirinîya di şer da rewayî kurdan nabînine. Kurd jî mirîyên xwe yê di şer da wekî şehîd û mirîyên hêla din wekî leşkerên hatî kuştin bi nav dikin.

Meriv dikane him leşker û him jî gerilayên ku tên kûştin wekî qurbanîyên şer jî bi nav bike. Gerek

e ku şer bihê bêtesirkirin û sebebên şer bihên rakirin û mafên miletê kurd bîn qebûlkirin û bi taybetî jî rê li ber perwerdeya bi zimanê kurdî bê vekirin....

Çend nimûneyên înkari, bêtehemulî û nijadperestîyê

- Di lîsteya zimanan a nexwaxaneyaya Medical Elezîzê da ji bo nexwaxên ku bi tirkî nizanin 17 zimanên bîyanî hene, lê zimanê duyemin yê ku pirtir li Tirkîyê tê dengkirin, kurdî di vê listeyê da tune.

(Evrensel 22.01.2019)

- Wekîlmiletê CHPê Sezgin Tanri-kulu li ser hesawê xwe yê Twitterê bi kurdî gotiye; “*Hêvîdar im ku sala 2019an bibe sala dadî, azadî, aşitî û biratîyê. Sersala gelê me û hemû gelên cihanê pîroz be!*” Ji ber ku bi kurdî bûn, ev gotinan di programe rojnâmeya televîzyon ya kanalê netewî ji aliyê şîrovekar Halil Nebiler va bi qirf û uslubeke piçûkxistî bi guhdarvanan va hat parvakirin...” Û wî got, “..*Lawê min, kurmancî dizanî, em dixwînin, lê lawo ma ev ne tişteki xeraw be...kî dizane ew çi dibêje!*” (Duvar)

– Xwaztina vîsîtkarta bi kurdî ji aliyê Meclisa Tirkîyê da hat redkirin. Teamûlên meclîsê rê neda vîsîtkarta bi kurdî. Wê daxwaza

wekîlmiletê HDPê yê Hekarîyê, Sait Dede ji bo ku rûyekî visitkartê bi kurdî be, red kir. Cîgirê serokê meclîsê, Şentop got: “teamûl ûsa ye.” (*Birgün*, 23.01.2019)

- Di çerçeveya Roja Makzîmanan a Dunyayê da li meclîsê, wekîlmiletê HDPê Garo Paylan bi zimanê ermenî û wekîlmiletê CHPê Mehmet Bekaroglu bi zimanê lazî deng kirin. Wekîlên MHPê reaksiyon nîşandan û gotin dibe ku ew heqeret li me dikin.... Gotinên Paylan, Bekaroglu û wekîla serokê guruba HDPê Fatma Kurtalan yê bi kurdî di protokola meclîsê da bi herfa x hatin qeyitkirin (*Duvar*, 21.02.2019): Herfa x tê meneya zimanê nenas, tune...

- ... Soylu referanduma serxwebûnê li Kurdistana Iraqê bibîranî û got: “*Amerika û Ewropayê tehrîk kir. Derdê wan kutana taqozekî li Başûrê Turkîyê bû. Xwastin ku li Efrînê navenda terorê ava bikin, koridoreke çêbikin.... û Tirkîyê biçûk bikin. Ma wan li Bakûrê Iraqê dewlet çêkin? Na, nikanibûn çêkin, Recep Tayîp Erdogan nehîşt ku ew çêbikin.*” (*Duvar*, 18.03. 2019)

- Serokkomar Erdogan li mitînga Trabzonê dengkirinên wekîlmiletên HDPê dan mêrandin û got: “*Pir jê hez dikine li Bakûrê*

Îraqê Kurdistan heye, yalla herin wir, Kurdistanê. Li vî welatî şûna wan tune!” (*Arti Gerçek*, 03.03.2019)

Gotinên hundir vehesandinê yên dema hêrs û bêzarbûnê

Gava meriv ji rawûn û rûniştin û gotinên kesên xerawkar û înadkar hêrs û bêzar dibin, hingê ew bi gilî û gotinên lomebar û bi tîn hundirê xwe vedihesînin. Li jêr, êz ê çendekan ji wan yê ku dema zaroktî/xortaniya min ji devî jin û mêran derdiketin û di bîra min da mayî, rêz bikim:

- Vayî/Vayê/Vanê tê/tênê însên
- Vayî/Vayê/Vanê însên ji jêr (yar, post) viderdixê/derdixine
- Vayî/Vayê/Vanê vi îcrê însên didê/didine
- Vayî/Vayê/Vanê cinê serî însên radikê/radikine
- Vayî/Vayê/Vanê însên radigerînê/radigerînine
- Vayî/Vayê/Vanê însên dîn dikê/dikine
- Vayî/Vayê/Vanê însên dibihecînê/dibihecînine
- Vayî/Vayê/Vanê însên heta dêv tîne/tînine
- Vayî/Vayê/Vanê li ser qefesê însên rûniştîye/rûniştine
- Vayî/Vayê/Vanê diçêrê/diçêrine
- Vayî/Vayê/Vanê ji rê viderketiye/viderketine

Sohbetek bi Şîlana Mala Emer re



Şîlan Yaşar

Tu bi xêr hati! Ji destpêkê tu bikarîbî malbata xwe ji bo me bidî naskirin?

Kî ne û ji ku ne?

– Min li Heymaneyê ji dayîk bûme, li merkez. Min dizanî ku hemû cihan kurd e. Ji ber hemû malbat, der û dor, xismên me hemû kurd bûn. 65 gundên Heymaneyê hene, min dikarim xelet bim, ji ber dûre hinek gund dan ser qezayên Konyayê û hinek dan ser ên Enqerê û belav kirin. Hingê min zarok bûm, Heymane ji bo kurdên Anatolîyê merkez bû. Rojên îniya ji hemû gundan xizmên me dihatin Heymaneyê ji ber rojên îniya bazar li Merkezê yanê Heymaneyê vedibû, gundî dihatin tiştê xwe li bazarê difrotin, wek mirîşkên xwe, mast, penir, zebze û beşek ji bo doktor, beşek ji bo mehkema ji ber merkez bû

herkes dihat wira. Wê çaxê navê Heymaneyê di nav kurdên Anatolîyê de wek merkez dihat binavkirin.

Wê çaxê hinek gundên ku îro bi ser Kulu, Cihanbeylî û Yunaxê ne, girêdayî Heymaneyê bûne.

– Erê, paşê vana dîsan dudela kirdin, beyna du gunda gundekî çerkez, boşnak beyna sê gundan gundekî tetara ava kirdin ji bo ku gundên kurda wek caran cejnên xwe, çûyîn û hatinên xwe ji hev qut bikin yanê gundên تازه ava kirdin.

Min heta heftsaliya xwe wisa dizanî ku hemû cihan kurd in. Ji ber hemû kesên min didîtin kurd bûn, yanê hemû Heymana kurd bûn. Tirk hindik bûn. Ekseriyete yanî piranî kurd bûn û kurdî dihat dengkirin. Eskerîye hebû, tirk bûn.

Eskerîye pir bû. Kî dihat Heymaneyê berî eskerîye didît. Yanê Heymane îşqal bûbû, tirk antîpatîk bûn bo kurd. Ji tirkî hez nedikirin. Digotin; tirk qelêş in, bi wan bawerî nabe. Tirk tirsonek e, tirk pîs e!

Çima tirk pîs e? Ji ber tuvaletên wan li hundur e. Ê me li hewşê bû bo wê digotin tirk pîs e! Li tirkî hez nedikirin. Ême bi wê pîsikolojîyê gewre bûn. Esker tirk bu, mamostegel



Şilan bi hevalên xwe yên pêşmergeyan ve li Başûr, salên 1980î.

Xêro Xan, Xecê (Hatice Yaşar), Ronakxan û Mela Bextîyar jî di nav wan de ne.

tirk bûn, li postê memur tirk bûn. Piştî min lîse xelas kir, ew kate min mêze kir memur û mamoste û Reise Belediye kurd bu, êdî teror a esker li ser kurdan kêmtir bû. Heft salî min dest bi mekteb kir. Ew kate li mal jî bi tirkî qisekirdin qedexa bû. Me bi tirkî fedî fikir ku qise bikin. Çunkî dayîkê min, porî min û hemû xîsmî me bi tirkî nedizani. Yanê zimanê me hemû kurdî bû. Kîngê ku min dest bi mekteb kird, min zanibûm ême kurd in û zimanekî din lazim e, em fêr bin. Li mal yek kelîme min bi tirkî nedizani! Mamoste dibêje, kurdî qise nekin! Xecê jî nedigot ku mekteb bi tirkî ye. Xecê û xûşkên min berî min çûbûm mektebê.

Xecê mezina me ye. Ez ji kiça rêza pêncê me. Li mektebê hîn bûm ku navê min navekî din e li malê navekî

min din hebû. Li mal yek nav bi kurdî, li mektebê navekî din! Hemû man du navî me heye. Xecê li *yatili okulu* mekteba mamostetîyê, berî li Konya bû, paşê li Bursayê xwend. Ku mezûn bû tayîna xwe li Gercûşê derket.

Xecê mamostey fransî bû. Bavê min got; çênabe tu herî li Gercûşê mamostetîyê bikî! Tu kiç î, ew der dîr e! Bapîrî min wit: Eger mamostey fransî bo kurd faydeyî xoy nebe, çima dixwîne? Min qayîl bûbûm ku keçik bixwîne bo xelkê xwe xizmet bike! Min ew kate fahm kir ku bapîrî min Kurdistanî ye! Û Xecê hilda, bi tîrenê, bi qîtar, rê de hemû der bi Xecê nîşan dide dibe: vira wisa ye, vira Kurdistan e, vira filan der e. Xecê digot: ez şaş mam. Dema min dest bi dibistanê kird, mamosteyê min digot: nebêjin kurd, bibêjin kurt.



Dêya min deng û hawar bû
Dîroka dengbêj û çîrokbêjan
Dêya min Kurdistanê azad bû

Şîlan Yaşar

Bapîrî min ew dem radyoya Erîwanê guhdarî dikir, tu dizanî li Heymaneyê kaplica, ava germ heye. Li mala ava germ tunebû, me diçû li wir hemam dikir, li gundên derûdorê jî xizmên me dihatin li Heymaneyê kom dibûn. Bapîrî min her li wan kom dibû li radyoya, Erîwanê an ji Baxdatê guhdarî dikirin.

Zaroktîya te li ku û çing derbas bû?

Bûyereka ku di zaroktîya te de bûbe û te ji bîr nekiriye?

– Çend bûyer hene, ez ê bi kurtahî bahs bikim. Rojên îna li Heymaneyê bazar vedibû. Wê hingê bi sedan xizmên me ji gundên derûdora Heymaneyê hebûn, xal û por me gelek bûn. Me bi rastî nedizanî xal an porî me yê rast kîjan e. Kurd ew dem pir nêzî hev dibûn. Germîyeka mezin hebû. Hevdu digirtin. Bi sedan kes dihatin merkezê. Heymane merkez bû, malî me jî li Heymaneyê

li merkezê bû. Bazar jî li ber mala me dihat vekirin

Çûyîn û hatina malî me pir bû. Ên ku dihatin ser doktor, rojekê berê dihatin, li mala me diman. Her roj malî me bîst kes bûn. Yanzdeh kes jî em bi xwe bûn.

Dêya min neh zaroyên wê hebûn. Du xalên me jî li ba me diman. Qelebelix bû, yanê jiyana me wisa bû. Malî me jî gewre bû, hewşê me hebû, bax û bostan hebû, yanê feqîr nebûn. Kengê ku hatim Swêd min ferq kir ku min li vir feqîr im. Wek usul kesek jî feqîr nebû. Kurd ew dem alîyê hev digirtin. Di nav hev de îdara xwe dikirin. Problemek bibûya mezin diketin nav. Di nav hev de hel dikirin. Rûyê xwe bi polîs û esker nedikirin, bi usulî eşîrî dihat helkirin. Reîseşîrî me jî tunebû, lê bi hev girtin pir baş bû. Malî xwe kilît nedikirin. Min, rojekê ji dêya xwe ra witim; tu çima kilît nakî? Wit: Xelk ji esker û polîs re mirîşk, hêlke,

mast dibin, Koro diçe ji destê wan werdîgirê. Koro merivê me ye. Kî dikare were ber derîyê me!

Tirk ew dem ji me pir ditirsîyan. Mamostegel li hember me pir kîbar bûn, ji ber em pir bûn. Tişteke bibûya bi sedan kes piştgirîya hev digirtin. Lê esker li bazarê gelek zordestî li gundîyan dikirin

Dihatin helkeyên wan ê mast di ser serê wan de dirijandin, mirîşkên wan berdidan û heqeret dikirin, digotin: ”*Kuyruklu Kürt, pis Kürt...*” Min cara ewil li şeş-heftsalîya xwe de ev gotina ”*Kuyruklu Kürt*” li bazara Heymaneyê, ji devê başçawîşkê bihîstibû. Eskeran wê demê li Heymaneyê resmen teror dikirin. Qet ji bîr nakim! Porî min li Enqerê, li Anafartalar, di *yürüyen merdivenê* de etegê wi di ber merdîvenê de dimê, porî min merdîvenê dide sekinandin. Ew kate tirk bang dikin dibên: ”*Kürdün kuyruğu sıkıştı.. Kürdün kuyruğu sıkıştı...*” Wê gotinê qet ji bîr nakim. Ez wan herdu tiştan qet ji bîr nakim, ew gundîyên feqîr bi zor û zehmetî li gundê xwe tişt dînan bazarê wan başçawîşên tirk, ew di ser serê gundîyan de dirijandin, heqeretî bi wan dikirin. Ya din jî ev gotina *Kürdün kuyruğu sıkıştı*. Dêya min û xelkî Heymaneyê heta ez diçûm liseyê jî hîn kincên kurdî, sêetek li xwe dikirin. Heta salên 1980î jî terzîyên me, Mim Qutume li Heymane kincên

kurdî didirûtin. Sêetek li xwe dikirin. Yanê ev şoreşa Mistefa Kemal Atatürk ya cilûberga (*kıyafet devrimi*) hê nehatibû alî me. Piştî modaye maksî derketin, ev kincên dirêj, ew kate dîya min kincên xwe guhartin. Asîmîlesyon piştî vê dest pê kir.

Bav û bapîrê te bi çi navî dihat binavkirin? Yanî ji malbata we re çi dibêjin?

– Heta ew roja ku bapîrî min bi Xecê re biçûya Gercûşê min nedizanî ku welatekî bi navê Kurdistan heye, Kurdistan ji navbeyna çar dewletan de hatiye perçekirin, me nedizanî. Dema bapîrî min bi Xecê re çû Gerçûşê pişt re bo me kat kir ku merivên wî li Elezîzê hene û ew çûye seredana wan ku em ji wir hatine Heymaneyê. Lê negot kîjan salê hatine. Bapîrî min wisa nedigot, bes dema qise dikir te dizanibû ew kurd e! Ji tirkî hez nedikir.

Rojekê min dît bi erebeyeka xweşik çend jin û mêr bi kincên modern, hat li ber avahîya mektebê sekînî û pirs bapîrî min kird û wit; Mala Emer, Abdullah li ku ye? Ji ber mala me li merkeza Heymaneyê bû mekteb, camî û hemû li dorûberê me bûn. Navbeyna me û mektebê sê çar metre bûn. Hertişt li ber lingên me bû. Û jinik hat û xwest ji malbata Emer mala Abdullah bizane. Ji ber



ew kes bapîrî min bû, bêyî ku bersiva jinikê bidim, min bazda çûm mal û min witim; Babî Tetê jinikek hatiye, te dipirse. Katê ku min ev got, bapîrî min got: ew hatiye parê dixwaze.

Dema bapîrî min wan li Xarpûtê hatine, pênc şeş aile bûne. Wê demê bi xwe re gelek dewar û naxir anîne, bi peya ji Xarpûtê heta Heymaneyê hatine. Dema bapîrî min wit, ew ji bo parê, yanê mîrasê hatiye, min witim: Na ew jinik bi erebeyê hatiye, modern e. Dewlemend xuya dike. Dê û bavê wê li Xarpûtê, ew bi xwe li Stenbolê dima û yeka xwenda bû.

Pişt re çend kesên din jî ji xizmên me yên Xarpûtê hatin. Herçiqas em wê demê xwedî bax û bostan bûn jî em feqîr bûn. Em di xanîyên kerpîç de diman.

Dewlemediya me ew hevqirtina me bû! Em gîştik wek malbatekê bûn. Me piştgirîya hev digirt. Em li Heymaneyê piranî bûn. Heymana ji ber kurdbûyîna xwe feqîr mabû. Bapîrî min ev kate hindik ji me ra bahs kir ku malbata Emer bi heywanên xwe ve; pez, dewar û heta segên xwe jî bi xwe re ji Xarpûtê anîne Heymaneyê. Siftê hatine Deşta Emera bi cîh bûne. Eşîra wan re dibêin şexbizeynî. Ew ji derûdora Kerkûkê hatine Xarpûtê û ji wir beşek hatiye Heymaneyê. Pir bi detay bahs nekir ka ji ber çi û kijan salê hatine.

Ew dema ku tu hîn li Heymaneyê bûyî, te bahsa bazara rojên îna kir, li bazarê bi çi zimanî dihat dengkirin, kurmancî an sêxbezeynî?

– Bi herduyan jî dihat dengkirin. Dêya dêya min kurmanç e, ji eşîra Zirkî ye. Ew li gundê Zirikan diman. Dêya min hersal diçû li gundê Zirikan penêr çêdikir. Xecê jî du sê car çûbû wî gundî. Çûyîn û hatina me wê hingê zor baş bû. Kurd ew demê zor piştgirîya hev dikirdin. Mesela li Ankarayê bazara teksî û halê di destê kurdên me da bû. Hîn jî ev wisa ye. Lê ne hêsan bû. Kurd ji aliyê tirkên wek şerker, cesûr dihatin dîtin, lê ji kurda hez nedikirin. Kurd bi *Kuyruklu Kürt* nav dikirin.

Te lîse û xwendina bilind li ku xwend, gelo tu astengî ji te ra çênebûn?

– Êmin şansê min zor hebû. Wexta min dest bi lîsê bikira, li Heymaneyê lîse vebû, ez yekem kes bûm, min li Heymaneyê dest bi xwendina lîseyê kird. Hîç lazim nebû ez herim Polatlîyê an Ankarayê.

Jiyana te ya xortanîyê bi karûbarê siyasî û tevgera kurd û Kurdîstanê re derbas bûye û te di temenê xwe yê ciwanîyê de pêşmergetî jî kirîye. Tu dikarî hinekî qala serpêhatîyên xwe yên wê demê biki?

– Min her zarok bûm meraqa min li ser kurdî û kurdîtîyê hebû. Navbeyna min û Xecê de teqîben neh sal hene. Ev kate suneta birayên min kirdin,

wê demê tu zanî li Ankarayê DDKO hebû, hemû hatibûn mala me û Xecê jî 18 salî bû. Li mala me her bi kurdî dihat dengkirin. Kurdî ji me ra zimanê baştirîn bû. Zimanê me yê edebî bû. Berê çîrokbêj hebûn. Te pere dida wan, ew dihatin ji zarokan re çîrok digotin. Bapîrê diya min jî her çîrokbêj anîne bo zarokan çîrokan bêjin. Dêya min li ber wan çîrokbêjan zor çîrok fêr bûbû. Bo wê dêya min çîrokbêjeka zor baş bû.

Gelek çîrokên kurdî ji me ra wek sitran digot, carna sê roj, be stran digot teva nedibû. Dengê wê jî gelek xweş bû. Bapîrî min jî wisa bû. Em bi dengbêj û çîrokbêjên kurdî ve mezin bûn. Çîrok û dengbêj ji me ra wekî av û nan bû. Li mala me em bi gotin û marşên kurdî mezin bûn. Ême marşa *herne pêş* di zaroktîya xwe de fêr bûbûn. Xecê emdama DDKO bû. Xecê delalîya malê bû. Ji ber li *yatılı okulê* dima, pir li mal nedibû, dema ku dihat, li malî me cejn bû. Heta Xecê nedihat bavî min qurban serjê nedikir. Xecê pir zû dest bi xebata siyasî kir, piştî DDKOê li nav Rizgarî, Ala Rizgarî de xebat dikir. Bavê min jî dihat naskirin heta ji ber karê siyasî qaçax bû û zû mir. Yanê bavê min, dayîkî min tevayî kurdîtî dikirin û tesîra wan jî zor bû. Herî pir tesîra Xecê bû. Tesîra Xecê ne tenê li ser me, li ser

hemû Heymaneyê bûbû. Xecê pir sosyal bû, diçû nav xelkê bi herkesî re dikaribû sohbet bike. Însaneka cematê bû. Hemû xelkê Heymaneyê zor pêyan xweş bûn. Li Heymaneyê, di mesela kurdîyê de tesîra Xecê zor hebû.

Te lîse xilas kir û tu çûyî Ankarayê?

– Min imtîhana universîteyê dabû. Min *İzmir Ege Üniversitesi Hukuk Fakültesi Gazetecilik Halka İlişkiler Bölümü* kazanç kirdim. Ez çûm li Îzmîr min qeyîda xwe kir. Li wê demê devam mecbûrî nebû. Min diçûm imtîhan didan û paşde vedigerîm. Bavê min jî di yönetima CHPê ya Heymaneyê de bû. Altan Öymen re gotibû ku îşekî bo min peyda bike. Bi rêya Altan Öymen min Ankarayê *Petrol Ofisi Genel Müdürlüğü* de karekî memurîyê wergirtibû.

Wê demê, zor parlamenterên CHPê hertim dihatin malî me, li Heymanyê. Beşek ji Xecê ku hemû kurd bûn û, beşek jî hevalên Ayşe Dev-Yol, hemû tirk bûn, beşek jî hevalên bavê min ên CHPê tekili kurd û tirk bûn: Yanê malî me ev bû.

Berî ku cunta bê ser hukum min li Ankarayê du car hatibûm girtin. Yekem car min, Xecê û İnci be hev re bûn. Xecê *Rizgarî Yazı İşleri Müdürü* bû. Min gelek tişt ji Xecê jî fêr bûm ku meriv çing îfade bide. Yanê tercu-

beyên min berî cuntayê jî li polis çêbibûn. Rojane genc dihatin kuştin. Faşîstan çend caran bi êvaran kêr dabûn qirika Xecê û zordarî dikirin.

Ew dem Dev-Yol aktîv, atak û eskerî bû. Min jî gênc bûm, bo min ew cazîb hat. Li mal jî serkirdayetî Dev-Yolê hebû û tesîra wî jî hebû. Min berê bi tanzîmê kurd re bûm. Gelek car Orhan Kotan û jina wi le malî Xecê diman. Jina Orhan Kotan mamoste bû li gundê Karagedikê bû. Min du sê mehan wek asîstanê Orhan Kotan li malî wan dimam. Ew dem kovara *Rizgarî* amade dikirin. Ewî dinivîsand û ji min re digot; bixwîne, min bi dengê bilind dixwend û ew gelek pê kêfxweş dibû. Digot: Şîlan, ev bombe ye bombe! Bi rastî bombe bû, manifestoya kurdan bû. Le dûre min tanzîma kurd berda, çûm ba Dev-Yolê.

Sebeba ku te tanzîma kurd berda û tu çûyî ba ya tirkî çi bû?

– Tu dizanî salên ku li Hekkarîyê, KDPê hinek hevalên Yêkîtiyê girti bû, problem çebû. Tanzîma Rizgarî ji ber mesela li Hekkarîyê bûbûn du beş! Li Ankara û Stenbolê di telebe yurduyê de piranîya xwendekarên wir hevalbendîya Ala Rizgarî dikirin. Li Ankara hemû endamên ASK-DERê tarafê Ala Rizgarî girtin. Di nav tanzîma de kuştinek çêbibû.

Bê sûç bê guneh yek endam hatibû kuştin. Ev bo min pir naşîrîn bû. Wê demê di nav tanzîmên çep de yên wek Dev-Yol û Dev-Sol ku li hev cuda dibûn taktîkên klasîk li hember hev bi kar tînan. Şerê hev dikirin, li hev însan dikûştin. Orhan Kotan di cerîdeyê *Rizgarî* de nivîsên li gor cudabûyîn pir naşîrîn nivîsand. Mesele pir basît girtin, wek dêdîkodu! Yanê ev bûyera tesîreka pir mezin li min kir, min nikaribû qebûl bikim û ev bû sebeb ku min dev ji tanzîma kurd berda çûm ba Dev-Yolê. Dev-Yol ji min re got; tu li tanzîma kurd zor rûniştîye, em te dişînin mintikayê şer wek berpirs. Ji me re întensîv kurs dan. Ji bo min, birayê min û xuşka min kursên taybetî dan. Ji bo me sê kesan *êğitim çalışması* û perwerdeya eskerî hat dayîn. Tabî me li wir ferq kir ku di navbeyna tanzîma kurd û tirk da zor ferq heye. Îmkanatên tirk zor hebû. Hemû ji malbatên burjuva bûn, meseleyê wan yê pûlî tunebû. Zarokên dewlemenda bûn. Kesên bakan, milletvekili, doktor, muhendîz û kurmay subay bûn.

Ji eskerîyê kesên subay, pispor dihatin bi sîlah em perwerde dikirin. Li Natoyolu, Îmrahor, Mamak, Ankarayê min perwerdeyeka eskerîya pir rind wergirtibû. Ji ber meraqa min ji hebû. Li Ankara piranîya mekteban

di destê Devrimcî Yolê da bûn. Diçûm li yurda ODTÜyê de dimam. Di nav Dev-Yolê da profesyonel devrimcî bûm, li du sê meheleyan de mesûl bûm. Min wê demê le Petrol Ofisi derketibûm, di mîtînga de mesûl bûm, le mîtînga qisem fikir, seminer dida, di şerê li dijî faşîstan de rêberî dikir. Tu dizanî berî cunta bi du salan Tirkîye wek cehenem bû! Her roj însan dihatin kuştin. Her roj *çatışma* habû. Yanê ez ji bi tesadufî jîyam! Rojek tanzîma *Kurtuluş* li ber Siyasal Fakultesîyê hevalekî me kuştin. Li serkirdayetîya Dev-Yolê beyanek hat ku em herin hevalên Kurtuluşê bitirsînin ku wê mintîqê terk bikin ji ber ev der mintîqa me bû. Min jî ji hevalên xwe re got, bila herin du sê dabanceyan bînin, em herin tenê wan bitirsînin ku ew ji wir herin. Min nedixwest bila şer û kuştînî çêbe. Em pênc kes derketin der ku çi bibînin eskeran rê girtîye. Ji ber ev hevalên li ba min, her çar jî ji vê mehelê bûn, ew ne wek min profesyonel bûn. Ji ber wê qelebalixîyek çêbû, hemû jinên wê mehelê êrîşî eskeran kirin, dixwastin bila zaroyên wan berdin. Ew û esker ketin nav hev, eskeran bi dîpçikan li jinan dixist û qelebelixîyek çêbû. Di gîrfanê min de kaseta Şivan hebû min ew avêt, lê eskerekî dît. Bi piranî alevî bûn, ji qetlîama Sivas û Çorumê hatibûn li vir bi cih bibûn. Wan li devrimcîya hez dikirin, digotin;

devrimcî me ji faşîstan diparêzin bo wê em diparastin. Em girtin û pênc roj li îşkencê de yek mang li zîndan mam. Di nav wan de pir li ser min disekinîn. Lê esker şahîdê min bû ku ew kaseta Şivan min avêtîye. Min ji wan re gotibû, min bo zîyareta kirîvê xwe hatime Ankarayê û li wê malê mame. Tanzîma me ev tişt berê ji me ra gotibû: dema hûn bên girtin wisa bibêjin.

Tahliye bûm, le 12ê îlonî cunta hat. Min dîsa qaçax bûm, ber sibê saet 5an, li mala ku min lê dimam, tabanca dabûn serê min, ez şîyar kirim û bi linga li min xistin, ez birim emniyet sarayî Du sê hafta li îşkencê de mam. Her çiqas min hertişt înkâr jî dikir wan her li min dixistin û pirs dikirdin ka depoya sîlaha li ku ye, we sîlah li ku weşartine û her îşkence dikirin. Tabî polîs dizanî ji ber ew dem bi rastî, sîlehên atomat yên giran di destê Dev-Yolê da hebûn. Berî cuntayê carna Dev-Yol bi sîlahên atomat bera cemseyên polîsan didan û polîs li ber wan direvîyan. Lê min dîsa qet tişt qebûl nekir. Ên ku berî min girtibûn hemûyan disa navê min î kod ê tanzîmê dabûn. Ji ber navê min a di nav tanzîmê de *kod îsmî* bû. Edresa min a resmî Heymane û kîmliga min a rastî jî navekî din bû. Min îşkence dît, piştî îşkencê ez avêtibûm

odeyeka bi betong, texteyeka razanê û tenê karton hebûn. Ez tam 15 rojan li muteferîqa, bi van birînên xwe yên îşkencê li ser kartonan mabûm. Paşê wan ez birim Mamak Eskeri Cezaevîyê. Li wir min 5 mang mam. Bûbûm berpîrsê koxuşê. Hemûyan îtîmat bi min dikirin ji ber ku ez baldiza Melih Pekdemir, xuşka Xecê û Ayşe Pekdemîrê bûm. Mesûle komun û îdara koxuşê di berpîrsîyarîya min de bû. Ji ber vê li hapisxanê jî zerara herî pir min didît. Carna bi şev dihatin yeko yek însan dibirin îşkence pê dikirin. Ême nobet digirt. Ji bo ew îşkencecî neyên hundir me hemû ranze didan ber derî ku neyên. Wan derî û pencere dişkandin diketin hundir û çî dibe: qîdemlî û perpîrsê koxûşê kî ye wê dibin û herî pir li wê dixin. Yanê min ji şoreşgerîyê tu feyde nedît, li zîndan herî pir min îşkence didît, min birçî dimam û cixara herî kêmin dikişand. Paşê avokad hat. Demek derbas bûbû ser îşkenceyan ve êdî birînên me hinek baş bûbûn. Heta hîngê jî hîn tu sûç û tiştek li ser min nehatibû tespîtkirin. Dema ez berdî, ez 38 kîlo bûm. Zaten ez dema hatim berdan neçibûm mala dêya xwe, ez dîrek çûbûm mala xalê xwe ku dêya min ev halê min nebîne, wek îskelet bûm. Hê 24 saet derbas nebûn dêya min xeber şand ku polîs

li min digere. Ev kate navê min yê kod û kîmlîk tespît kirine. Eger ez bigirtima bi kêmanî heft heşt sal ceza li min dibirîn û min nedikarî di bin îşkenceyeka din de derketima. Ez hevqas hêrs bûbûm min digot: herim Kurdistanê întiqamê bigrêm.

Ew zîndan şûnî însan nîne! Tu dibînî du sê polîs du metro pejna wan, yekî digrê weka seyê ku har bûye îskencê pê dike. Cîyeke ku tu birevî tune! Yanê wehşetek e.

Di rewşa Tirkîyê ya wê demê de ewqas quwet û sîlah ji ku peyda dikirin? Te bahsa perwerdeya eskerîyê kir ku ji nav eskerîyê kesên profesyonel dihatin hûn perwerde dikirin. Gelo ev çîng dibû?

– Ew kata di nav eskerî û polîsan da cudatî bûbû. Mesela *devrimci esker*, *devrimci polîs* hebûn. Wek POL-DER, bi rêxistinî bûn. Endamên Ala Rizgarî jî di nav Pol-derê de hebûn. Ewana hebûn ji berî de. Ew jî girtin, îşkence kirin, ji kar avêtin. Heta gelek kes ji CHPê jî girtin. Yanî hevalbendên tanzîma çep a tirkan dewlemend û alîgirên xwe li her tabaqayê civata Tirkîyê de hebûn.

Erê, te bîryara xwe da ku derbasî Kurdistanê bibî. Ka hinekî jî bahsa wê prosesê bike?

– Axir min dit ku tanzîma tirkan jî wek a kurdan hiç û pûç bû.

Kurtarîlmîş bôlgeler, komiteler hemû fiyasko derket. Merkez Komite û gruba doktora ku korsan ameliyat çêdikir, ew kesên ku kîmlîk çêdikirin hemû hatibûn girtin. Me hemûyan dizanî ku cunta tê. Psîkolojîk hazirîyek bûbû. MÎT, polîs û esker hemûyan bi hev re êrîşî xelkê dikirin. Bingeh ji cuntayê re hazir dikirin. Bes tanzîmê tu tedbîr negirtibû, hiçîyan! Weke ku hiç cunta nebûye, hiç kesek îdam nebûye! Rihet bûn! Cunta hat hemû tirk kemalist man û hemû qebahat li serê kurdan ma. Dûre wan bi rêya Yunanîstanê gelek însanên xwe derxistin û bo min jî îmkan hebû lê min qebûl nekir û min witim diçim Kurdistanê, bo welatê xwe şer dikim. Ji wan veqetîm.

Çûyîna te ya Kurdistanê hêsan bû?

– Na, berê çend car çûbûm Kurdistan. Lê piştî cuntayê tu kes nemabû. Tenê, esker, polîs û sîmîtçî! Jiyaneka din dest pê kiribû, polîs li narkotîkayê digerrî. Êdî yên siyasî kes nemabûn. Ez çûm Diyarbekirê mala dê û bavî hevalekî mam. Du mang li benda Ala Rizgarî mam ku min li sînora derbas bikin. Em be hev re çûn heta Başkalê, ji wir bi pîya meşîyan heta ser sînora. Şevekê li ser sînora man. Em pênc kes bûn. Bi şev firtina derket, wê şevê jî me tirseka mezin derbas kir. Hem qerekol nêzik e, ne tenê ev, gur jî hebûn. Berf

barîye, her der cemed e, çiyayên wir jî pir bilind in. Lingê te xîj bibe tu çûyî! Herder tarî ye. Tu ronîyeka ku tu xwe lê bigrê tune. Li wirana dema tarî dibe xelk pencereyên xwe dadixin da ku bila kes nebîne. Tabî rêberên rênasên me yên Ala Rizgarî rêberîya me dikin axirê, ji dûr ve ronîyek xuya kir, em çûn ew şev li wir man. Em derbasî rojhilat bûn. Ew kate mintiqayê rizgarkirî hebû. Ji her çar parçeyên Kurdistanê xelk hebûn, Min Dr. Qasemlo li wir dît. Hat, kêfa wî pir hatibû digot: wa ye li her derê Kurdistanê însan hatine! Em li Soma Bradost, Bikaner, Şirvan, Seqizê diman. Ez ji wir çûm Mehabadê.

Em êdî bi pêşmergeyan re diman. Wek kommunist, bîst sî kes li şûnekî diman. Jiyana me ya pêşmergeyî li wir dest pê kir. Xecê ji bo ku em ziman fêr bibin em li mintiqeyên cuda cuda belav kirin. Me li wir dest bi perwerde û semîneran kir. Min ewil li wir fêr bûm ka Lenin û Stalîn çî kirdine bo kurdan.

Li Tirkîyê ev mesela mabû serînsafa tercumanan, wan çing werger kiribûn me jî wisa dizanî. Helbûkî ne weng bû. Li Tirkîyê wan du rê dabûn ber kurdan. Yan rêya leninizmê yan jî ya muhamedî. Kurdîti, kurdbûn tunebû bo marksîstên tirkî! Yê marksîst digotin: di rêberîya proleterya de meselê netewî hel dibe! Em çûn welêt,

li welat ne proleterya ne jî burjuvaya heye. Xelkê me digot: ma bila gundî întîxar bikin! Çi proleterya! Em li wir hişyar bûn! Tanzîma me xelet bû. Me ev li Kurdistanê dît! Rêxistina lenînîstî bo kurd asteng bû!

Tu çend sal li wir ma?

– Teqrîben sê sal.

Tu kîjan salê derbasî başûrê welêt bû?

– Sala 1981ê derbasî başûrê bûm.

Lê em piranî li Navzengê, di sînorê Îran û Iraqê de diman. Ew der ser sînor bû, herdem em diçûn Rojhilat, Başûr, Bakur û Rojava.

Dema hûn wek hevalên Ala Rizgarî

li Kurdistanê di nav pêşmergeyan de bûn we bi çî zimanî bi hev re deng dikir?

– Berî cunta ku em hîn li Ankarayê bûn, li komela, hevalan bi hev re kurmancî deng dikirin, dema min deng fikir henekên xwe bi min dikirin, digotin: ev çî ziamanê çûçikan tu deng dikî, galte û henekên xwe bi min dikirin. Li *Komal Yayınevî* min bi Xecê re her bi şêxbizinkî deng fikir. Xecê li her derî hertim bi kurdî deng fikir. Hevalên kurmanc li Komalê bi kurdîya me dikenîn û digotin: *Kuş dili*. Û kurmancên canbega jî ji me ra digotin: *witim witim*. Kîngê em çûn Rojhilat û Başûr carna min ji hevalên kurmanc re tercumanî dikir.

Hevalên Rojhilat û Başûr ji min re digotin: kurdekanê Bakur. Tena min kurd bûm li ref wan. Min jî ji hevalên kurmanç re digot: Ha binêrin ev zimanê çûçikan e! Kî kurd e niha? Min jî li wir henekên xwe bi hevalên xwe yê kurmanç dîkir. Ziman bo min hîç problem nebû. Dema min qise dîkir Mela Bextîyar digot; aha! bapîrim wisa qise dike. Û Noşîrwan digot dapîrê min wisa deng dike. Yanê lehçeyê me kelhûrî ye, bapîrî min jî wisa digot: kelhûrî jî bingehê kurdî ye. Min zor fayde dît, bo min ziman hîç problem nebû. Min li wir gelek kesên ji eşîra xuman nas kir.

Ew li mintîqa Şêxbizîni, navbeyna Silêmanî û Kerkûkê de dijîn. Ewna dihatin seredana me. Pir kêfxweş dibûn. Yanî ev sê sal bo min gelek bi bûyerên balkêş û dewlemend derbas bûn. Min pir tişt fêr bûm! Weke ku ez li mala xum bûm. Teqrîben, cil û berg û zimanê çirok û stranên wan her wek yê li Heymaneyê bûn.

Ew sê salên di pêşmergetîya te da bûyer an serpehatiyên te helbet gelek çêbûne.

Ji wan ên ku herî pir li ser te tesîr kirîye an tu qet ji bîr nakî, çi bûn?

– Gelek in. Ew zûrûf zor zor xirab bû! Wek min planet guhartim. Şokek mezin bû, bo min! Ez di nav hewqes bûyerên pir giran de jiyam ku bi gotinan îfadekirin têr nake!

Nevîya Pîremêrd Ronakxan, jina Mela Bextîyar, rojekê sibê zû hat, got: em divê herin Silêmanî. Mela Bextîyar xebera wî tune ye, ew çûbû cewlê. Ewê boxçeyek da min û got em herin. Tam jî ew dema ku Saddam yasaya pîşmanîyê derxistîye, hinek pêşmerge jî bi sîlehên xwe çûne teslîm bûne, li Silêmanî hene. Û Ronakxan jî ji malbateka naskirî, jina Mela Bextîyar e. Kî li Silêmanî bibîne yê nas bike. Min witim: Ronakxan, tu dîn bûyî û te bi xwe bo me qal kiriye, her roj cesedekî davêjine ber malekê, wallahî yê te îdam bikin, em çing dikarin herin! Min çî got jî feyde nekir û min jî naxwazim ew bi tena serê xwe here. Mecbûr mam min qebûl kir. Di boxçeya ku anîbû de cilên kurdî hebûn. Min ew cilên kurdî li xwe kirin, cilên pêşmergeyê jî ber xwe kirin û em çûn ba mektebê eskerî, ba Mulazim Omer. Xeberî wî hebû, xuya bû ew îkna kiriye. Mulazim Omer 500 dînar derxist da min, wek *xerclix*. Min got layê me jî wisa ye, edet e. Dema mêvanek dihat, bavê min derdixist *xerclixek* dîkir berîyê, heta xwarin jî didayê. Min dît hemû adetên me wek hev in! Hîç ferq nîye! Û em çûn Qeladizê. Li wir min dît li binê daran, pênc hespên qaçaxçîyan rawestîne. Em bi wan qaçaxçîyan re çûn Silêmanî. Ew rêyeka dûrûdirêj bû. Di rê da pir caran şer û pevçûn bûn. Çîroka wê pir

dirêj e, min di bîranînên xwe yên bi navê *Pêşmergenin güncesi* de bi dirêjî nivîsîye. Li Qeladizê teqe bû. Min xum li Ankarayê jî *çatışma* dîtibûm. Lê ev tiştekî din bû! Xanî difrandin hewa! Heta sibê bi qombela, bi sîlehên mezin teqînî berdewam kir, heta beyanî em raneketin. Paşê teksî hat em bi rê ketin. Li rê esker û *Ceyşê Şabî* ku jê ra dibêjîn, li nokteyan kontrol dikirin. Di kontrolê de serî xwe dikirin nav teksîyê. Yanê ew cesareteke gewre bû, eger em nas bikirina! Min xwe ji bîr kir û li xwe nedifikirîm, telaşa min Ronakxan bû! Ê yekser îdam bikirana. Lê qet netirsîya! Em di nav çar penc seyteran re derbas bûn, her alîyê me esker bû! Yanê em di tuneleka tirsî re gêhiştin Silêmanî.

Dema em hatin Silêmanî, me dît, Silêmanî di çembera agîr da ye. Roja me ya duyem bû; em li malekê diman, ne mala merivên Ronakxanê bû, min ber sibê qîjîniyek bihîst, ez ber bi wê malê ve çûm, çi bibînim: jinek ser û rûyê xwe diçûrîne, diqîje û şînê dike. Du keçikên bi ser cesedekî de sekinîne, xorteka 15 16 salî, kuştine û anîne avêtine ber malê, nênikên dest û pêyan hatine kişandin, çermê serî hatiye jêkirin, yanê bi îşkencê kuştine. Hem ew yasaya poşmanîyê derxistine û hem jî jin û zaroyên pêşmerga berhev dikin wek rehîne ku pêşmerge

teslîm bibin! Her roj cesedekî davêjin ber mala pêşmergeyan. Wek îbret be, bi şeklekî hovane hatibû kuştin. Ev trawmayek bû bo min. Tu dizanî, şer e, şerê birakujî dest pê kiriye, bixwazî nexwazî psîkolojîya meriv xerab dibe. Ev ji trawmayek mezin bû bo min.

Ji alîkî de eskerên Saddam, ji alîkî da Îran bombe dike û ji alîkî din de jî Tirkîye. Em pêşmerge ne, nabe teslîm jî bibî, divê heta dawî jî tu ber xwe bide. Weke di nav zîndaneka girtî, destûpîyên te girêdayî bin. Derûdorê me hemû girtîye. Saddam gundên dora me hemû vala kirine, birine kampan!

Dema derve xeber nayê ji alîyê moral ve meriv dikeve. Dunya li serê te biçûk dibe û perspektiva te jî biçûk dibe. Wek zîndan! Her tiştekî biçûk jî rê dida ku însan bi rû hev diketin, bi hev re şer dikirdin. Hemû ji bi sîlah in! Bi xeletî car hebû 10 pêşmergeyên YNKê dimirin! Ev tehlike dest pê kiribû.

Bi bombeyên an ji zihêrê nava xwarin, Noşîrwan û Mam Celal çend car hindik mabû bimirin! Şeş pêşmergeyên Mela Bextîyar mirin. Ber sibê, saet pêncan de balafir dihatin, bi dengê balafirê guhên meriv diteqîya! Me hema xwe davêt sengeran! Yên ku xwe nedigihandin sengeran, dimirîn. Yanî mirin hertim bi me ra digêrî!

Zîndan çawa ne cîyê însan e, çiya jî ne şûna însan e! Şûnê heywan e: dupîşk e, mar e, Îran e, Iraq e, Tirkîye ye. Erê dibên; çiya dostê kurd e lê ne cîyê însan e! Her roj ji alîkî de balafir yan ji Tirkîyê yan ji Îranê yan jî Saddam te bombedaran dike, tam teror! Tu nerihet dibî!

Û vegera we?

– Ji wir heta Qamişlo çar mehan ajot. Em bi rojan di şikeftan de diman. Me nedikarî rasterast bên Qamişlo ji ber di ser sînore em dihatin. Ji alîyeka me qereqolên Îranî û ji alî din jî yên Iraqê bûn. Yanê rêya me her zîqzaq dibû.

Erê, hûn derbasî Surîyê bûn, ji wir çing derbas bû?

– Em teqrîben bîst û pênc kes bûn, Ew dem Xecê li Qamişlo û Şamê mal girt. Min û Xecê li mala Heme Hecî Derwîş û Mam Celal diman. Li Şamê çûm ziyareta Dev-Yol. Du sê roj cem wan mam. Ji me ra pasaport çêkirin. Navpeyna tanzîma tirk û filîstînîyan baş bû, bi pasaporteka filîstînî 1984an de min hatim Swêdê.

Piştî em hatin hêdî jiyana pêşmergeyê li şax teqrîben xilas bûbû. Pêşde em, hevalên Komelê, Şêx Îzzeddîn û hevalên wan ji şax derketin.

Hinekî jî bahsa jiyana xwe ya Swêdê bike, li vir jiyana çing bû?

– Em hatin Swêdê. Lê ya rastî min ev jiyana li Swêdê qebûl nedikir, hertim bi hevalên pêşmergeyê ku hatibûn Swêdê, li bajarê Uppsalayê em bi hev re bûn, me digot: em ê vegerin. Ji ber di serê me de her welat hebû, heta dema Halebçê, 1988an de min xwest vegerim herim Halebçê.

Min li çiya serkirdayetîya Yekîtîyê de li ba Dr. Fuat gelek kar kiribû. Min dizanîbû birîndaran derman bikim.

Me ji bo Halebçê birçîbûnî danî, çar çadir hatibûn vekirin. Her roj li Komela Uppsalayê hemû endamên serkirdayetîya Komelê me bi ezîm kar dikir. Hem ji bo Halebçê û hem jî ji bo girtîyên zîndanên li Tirkîyê me kar dikir.

Yanê xebata te ya ji bo kurdeyatîyê li Swêdê jî her berdeuam bû?

– Erê, xelkê Swêdî jî gelek piştgirî didan me, dilsoz bûn û em aktîv bûn. Heta dema serferberliga li hember DAÎŞê îlan kirin jî dîsan çûm min navê xwe nivisand wek pêşmerge herim Kurdistanê. Ji ber perwerda min ya eskerî pir baş bû. Lê min nehxeş ketim. Hertim min dixwastim layê pêşmerge bim. Bo min ferq nedikir, Başûr bûye, Bakur bûye! Ji ber wazîfeya kurd dema lazim be divê li ku be meriv piştgirî bide. Ji ber pêşmerge bo şexsiyetî me şer dike, berpirsiyarîya me ew e ku em

xizmetî wan bikin. Başûr her çiqas niha jî problemên xwe hebin, îdare û parastin di destê kurdan da ye. Yanê serxwebûneka qismî be jî ava bûye.

Tu weke keçeka kurd, ji Anatoliyê çûye, nav pêşmerga, li çiya maye û te pêşmergetî kiriye. Piraniya pêşmergeyan wê demê û niha jî mên in. Tu wek jin di nav pêşmergeyan da maye. We rojên tarî, zor û dijwar di wan salên 1980î de bi hev re derbas kirine. Piştî hewqas dem, tu niha çi difikirî, te ferqîyek didît, di navbeyna jin û mên de?

– Li mal û Ankarayê min hîs nekir. Yanê birayê min çaka bû em jî wisa bûn. Li şax hinek hesûtî hebû, digotin: Şîlan çawa dikare bi linga hewqas biçe, bêwestan. Roj hebûn em panzdeh saetan dimeşîyan. Digotin, Şîlan çima hewqasa rê diçe, neket! Di gelek alîyan de min yek ji wan ên serkeftî bûm, di meşan de, di bikaranîna sîlahan de. Ewan digotin: Şîlan çawa dikare! Hinek hesûtî dibû! Li Ankarayê, li ba soreşgerên tirkên ne wisa bû. Peya û keçik wek hev didîtin! Li Kurdistanê ne wisa bû. Heta ez xwe îspat bikim, yekûyek dîtî, îkna bûn ku ferqa Şîlan û peya nîye! Xecê li serkirdayetiye bû, ez pêşmerge bûm. Gotin: Şîlan tu yekem kes e wek keçeka pêşmerge li Bakur hatiye. Heta ewê rojê kesek neçûye, Dr. Qasemlo jî mesela kêfa

wî hat ku ne tenê peya, keç jî hatiye. Mam Celal dihat, kêfa wî dihat, destê min digirt û digot: Şîlan, te gûz xwariye. Me ji darên gûza gûz berhev dikirin. Yanî îhtîram û hurmeta wan gelek bû. Yanê min xûm îspat kird.

Berî wê dixwestin moralê min nizm bikin. Ev ferqa min dît. Min di wan şertan de xûm îspat kird. Hem ji alîyê psîkolojîk de hem jî ji alîyê xebatê de! Ew pêşmergeyan ku birîndar dibûn, ji bo hîjyen, baqîjî û sihata wan min av germ dikir, min kincên wan dişûşt, porê wan kort dikir. Min xizmetî birindaran kirdiye. Zor tişt jî fêr bûme li ber destê Dr. Fuad. Di wan şertên çîyan de Dr Fuad emeliyet jî dikir. Yek car pêşmergeyek destê xwe jêbûbû. Dr Fuad ew bi emeliyetê dirû piştî şeş mang xweş bû. Dr. Fuad li Almaniyayê jî kar kiribû, bi rastî doktorekî gelekî jêhatî bû.

Çûyîn û hatina te ya Heymaneyê

heye, herî dawî tu kengî çû

Heymaneyê û tu rewşa kurdên me yên

Heymaneyê çing dibînî?

– Berî şeş sal, dengbêj û çîrokbêj, dêya min wefat kir. Wesîyeta wê bû ku em cenazeya wê bibin welêt! Ji min re digot: aman aman, tu min bibe welêt, ji ber ew piranî li ba min dima. Dema em çûn Heymaneyê, tu zanî mala me li wir nemaye, lê min dît hemû Heymane serferber bûye!

Ji me ra *Kulturevi* girtine, hertişt amade ye ji bo tazîyeyê. Ji xwarin û vexwarinê bigrê heta çay û qehwê!

Em çûn camîyê, her der *tıklım tıklım*, ji hevalên Devrimci Yol, Ala Rizgarî, xelkê Heymaneyê, Polatlîyê û Cihanbeylîyê, hemû nas û xizmên dêya min civîyane. Qelebelixîyeka pir mezin! Ferqeka mezin çêbûye!

Berê hîçyan tirkî nedizanîn, porê min, xalê min, mamê min hemû tirkî fêr bûne û di destê wan de jî Quran heye. Tesîra AKPê pir bûye! Ji gundan gelek kes hatine nav bajêr. Nav ciwanan de hîn jî hemû hefle yanê dawet û şahîyan de bi kurdî stran dibêjin. Lê hema bêje gîştik bi neviyên xwe re tirkî qise dikin.

Yanî asîmîlasyoneka xort dest pê kiriye?

– Erê, weke berê nîye. Lê dîsan jî li pir ciyan, dema ez didîtîm kurdî qise dikirin. Xortên panzdeh şanzdeh salî bi kurdî kilam digotin, ev tişteki xweş bû!

Dema tu salên 1980î û niha bidî ber hev, li gor tercûbeyên xwe yên salan tu rewşa kurdên Anatolîyê ji aliyê nasnama kurdî û ziman de çing dibînî?

– Berê, kurdek ji Heymaneyê dema diçû Ankarayê, pir nizm didîtîn, lê

niha ne wisa ye, têkilî çêbûye, kurdan dinasin. Berê keçeka tirk ku dereng dizewicî, ku jê ra digotin; keçê du di mal de maye, kes te hîlnagrê, digotin; tişt nabe, ez ê xwe hinekî boyax bikim lêvên xwe sor bikim kurdek tê min hildigrê. Yanê li rewangê jî wê demê keçikên tirkan ku di mal de diman tunebûn. Lê niha ne wisa ye, gelek têkilî çêbûye. Lê hin kurdên aliyê me piranî nabêjin, em tirk in. “*Yê ku eslî xwe înkâr bike, heramzade ye! Eslê me kurd in*”, dibejin. Berî 1980î ji Heymaneyê re digotin *Yavru vatan*. Lê niha tenê dibêjin Heymana.

Mala te ava te wexta xwe ji me ra veqetand û heta vira hatî! Tişteki ku tu ji bo xwendevanên kovara Bîrnebûnê bibêjî an peyameka te hebe, fêrm!

– Dema min hejmarên Bîrnebûnê yên ewil dîtîn, xwend. Min pir kêfweş bûm. Dîroka kurd bi nivîskî pir tune ye, a ku hebû jî hatîye şêwidandin! Di kovara Bîrnebûnê de dîrok û folklor kurdên Anatolîyê hatîye nivîsîn. Kurd û kurdî namire!

Baş e, ez spas dikim!

– Ez jî spas dikim û her serkeftî bin!

1840 - 1844 ji Hilkeçikê ber bi Qandîlê

H. D. Tutak

Di dewleta osmanî de hejmartina gel

Di salên 1830 de Devleta Osmanî cara yekemîn dest bi hejmartina gelê devletê kir. Devleta Osmanî, ji ber sedemên aborî û leşkerî, dixwest biza-nibe ka ewê ji çiqas kesî bacê bigrin û çiqas xort û mêr hene, ku ewê wan bikin leşker. Di wan salan de di hemû heremên Devleta Osmanî de, hemû xort û mêr hatin hejmartin. Navê her kesê ku hatibû hejmartin, xistin nav defteran. Ew defterên ku heta îro win-da nebûne, nuka di nav “*Arşîvên Welêt yên Serokwezîriya K.T.*” de tên weşartin. Hinek ji van arşîvan, bi rêya internetê ve pêskeşî gel hatine akirin.

Defterên kurdên hilçikê ji dewleta osmanî de

Di salên 1830 (hîcrî 1246), 1834 (hîcrî 1250), 1837 (hîcrî 1253), 1840 (hîcrî 1256) û 1844 (hîcrî 1260) de kurdên Hilkeçikê hatine hejmartin. Ji bo her hejmartinek defterek hatiye nivîsîn. Ji van 5 hejmartinan di destê me de 5 defterên nufusê ya kurdên Hilkeçikê hene. Ji van defteran, sê² defter ji hêla



1 T.C. Başbakanlık Devlet Arşivleri.

2 Jimarên ew sê defteran weha ne: A- NFS.d. 3489 (sal 1830 - hîcrî 1246); B- NFS.d. 3490 (sal 1834 - hîcrî 1250); C- NFS.d. 3509 (sal 1837 - hîcrî 1253).

Necmettin Aygün ve, ji Osmanî hatine wergerandin û di kitêba bi navê *“Nüfus Defterleri’nde Aksaray’ın sosyal ekonomik tarihi (1830-1845)”*³ de hatine weşandin.

Du⁴ defter hîn nehatine wergerandin û weşandin. Lîsteya malbatên ku ji herêma Hilkeçika Aksarayê barî Qandîlê kirine di defterê bi jimare NFS.d. 3506 (1844) de ye. Min beşa lîsteya malbatên ku barî Qandîlê kirine ji tîpên erebî-osmanî wergerandine tîpên tirkî-latinî. Beşên din yê wê defterê, hema hema weke defterên ku N. Aygün wergerandî ne. Bo vê yekê me hewceyî wergerandin (translation) û tîpguheziya (transliteration) hemû defterê nedît.

Deftera bi jimareya NFS,3506

Ew deftera nufus yê kurdên Hilkeçikê di sala 1844 (hîcrî 1260) de hatiye nivîsîn û bi jimare NFS.d. 3506 ve di nav „*Arşivên Welêt yê Serokwezîriya K. T.*“ de tê veşartin. Di vî defterî de ji bilî navên kurdên ku li Herêma Hilkeçike dijîn, navê kes û malbatên, ku ji herêma Hilkeçikê barî Qandîlê kirine jî, hatine nivîsin.

Di ser defterê bi jimare NFS.d. 3506 de bi zimanê osmanî vaha nivîsiye: „*Aksaray Kazasına Tabi’ Ekecik*



*Aşireti Defteri Nufusu*⁵ yanê “Defterê Nufusê eşîra Hilkeçika ku giredayî qezaya Aksarayê ye”.

Di rupela pêş ya di hundire defterê de bi zimanê osmanî weha nivîsiye: „*Qaryeyi⁶ Ekradi Ekecik der Qazayi Aksaray.*” Yanê „Gundê kurdên Hilkeçikê di Qazaya Aksarayê de”.

Herçiqas kurdên Hilkeçikê, wê demê di 22 gundan de dijîyan, di vî

3 “Di defterên nufusê de dîroka Aksaray ya cîvakî û aborî (1830-1845)”

4 A. NFS.d. 3505 (sal 1840 - hîcrî 1256); B- NFS.d. 3506 (sal 1844 - hîcrî 1260).

5 NFS.d. 3506 numarali, “Aksaray Kazası, Ekecik aşireti, Nufus Defteri”

6 Peyva “Qarye” bi Kurmancî „gund” e. Lê li vir qest ji “qarye” yê herêm e.

defterê de navên gundan bi xwe nehatiye nivîsîn. Hemû kurdên herêma Hilkeçikê li ser sê taxan (meheleyan) hatine parve kirin. Navên van sê taxan ev in: **Şeref**⁷, **Algin**⁸ û **Qilvîran**⁹ (Qilori). Taxên Algin û Qilvîran (Qilori). Kurmancî qise dikin. Taxa Şeref dimilikî qise dike. Di daviya listeya taxa (mehele) Algin û taxa Qilvîran da navê malbat û kesên ku ji Aksaray barî Qandîl'a Konyayê kirine, hatiye nivîsin. Piraniya van kesan cotkar (çiftçi) bûn. Du kes şivan (çoban) bûn û yek kes jî hêştirvan (devci) bû ye.

Di vê listeyê de navên 112 mêr û xort û zarokan hene. Navên jinan û keçikan nehatiye nivîsîn. Ji van 112 kesan 21 kes (7 malbat) ji taxa Algin û 91 kes (36 malbat) ji ji taxa Qilvîran in. Jiber ku hêjmara mêr û jinan hema hema di hemû civakên cihanê de nîve nîv e. Em bi hêsanî dikarin bêjin ku li dora 225 kes ji herêma Hilkeçikê (Ekeçikê) çûne gundê Qandîlê.

Bê şik divê berî sala 1844 û du vê salê jî, ji Hilkeçikê mirov û malbatan bari Qandîlê kiribûn. Ew kesên ku di listeya jêrin de ne, bes kesên ku di navbera salên 1840 û 1844 de barî Qandîlê kirine. Dibe ku ji wan mirovan, hinek kes şûn de wegeriyana Hilkeçikê û hinek kesên din jî ji Hilkeçikê barî Qandîlê kirine.

Navê eşîra Hilkeçikê

Di van defteran de gelek caran qala eşîra Hilkeçikê (Ekeçik Aşireti) tê kirin. Ji xwe eşîrek kurd ya bi navî tune ye. Devletê ew Kurdên ku li deridora çiyayê Hilkeçikê de dijiyan û ji eşîrên cuda cuda bûn di bin naveki nu de kom kir û ew hemû xistin bin vî navî. Osmanîyan gelek cara weha dikir, ji ber ku bi wî awayî gel bi hêsanî dihat kontrol kirin. Em ji belgeyên osmanî dizanin ku eşîrên **reşvan** (reşî), **siweydi** (suwedî), **cenan** (şark canan) û **doqan** (doqî) li Aksaraye bi cih bûbûn. Devletê Osmanî gelê van (çar) eşîran di bin navê „**Ekeçik Aşireti**“ de kom kir û bi vî awayî eşîrek nu bi navek nu ava kir. Belgeya herî kevn ya ku navê „Ekeçik Aşireti“ tê de derbas dibe, ji sala 1804 e. Ji ber vî sedemê êdî piraniya gelê herêma Hilkeçikê navên eşîrên xwe yên eslî nizanin.

Devleta Osmanî di dîroka xwe de gelek caran, ji eşîrên ku zor dihatin kontrol kirin, di bin navekî û serokek nu de eşîrek nu awa dikir. Mînaka wê ya herî baş eşîra **Okcu Izzeddinli** ye. Ji eşîrên kurd yên ku li derûdora Kîlîsê bûn û osmanîyan wan bi zor kontrol dikirin, di bin serokatiya (miritiya) Okcu Izzeddin û di bin navê „Okcu Izzeddinli“¹⁰ de eşîrek nu awa kir.

7 Dibe ku ew nav wek “şerq” jî xwendin.

8 Dibe ku ew nav wek “Alxan” jî bê xwendin.

9 Ew nav îro li Hilkeçikê wek “Qilori” (Qiloran) tê bikaranîn.

10 Ji vê eşîrê re **Oxcîyan** jî tê gotin.

Defterê nufusê kurdên Hilkeçikê ya Sala 1844

Rûpel 24 ya defterê nufusê: NFS.d. 3506

Di serê rupelê de bi Osmanî „**Qandil qaryesinde kain xaneleri**“ nivîsiye. Yanê „Malbatên (taxa Algin yên) ku li gundê Qandilê dimînin“.

HANE¹ 144:

Orta boylu, kîr sakallî, çiftçi **Mustafa**,
veledi² Hüseyin, Çolaknabioğlu³, yaşı 44.
Oğlu **Nabi**, yaşı 4

Amcasinin⁴ oğlu uzun boylu, kara
bıyıklı **Mehmed**, veledi Nabi, yaşı 26

HANE 145:

Orta Boylu, kumral sakallî, çiftçi
Mustafa, veledi Çolaknabioğlu⁵, yaşı 46

HANE 146:

Orta boylu, kîr sakallî, çiftçi **Ibrahim**,
veledi Ibişoğlu⁶, yaşı 55

Oğlu **Bekir**, yaşı 12

Diğer (oğlu)⁷ **Battal**, yaşı 4


Kardeşi⁸, orta boylu, kîr sakallî **Hasan**,
yaşı 49

Diğer (kardeşi) uzun boylu, kîr sakallî
Veli, yaşı 47

(Veli'nin) Oğlu **Dede**, yaşı 4

HANE 147:

Diğer kardeşi, orta boylu, kîr sakallî



NFS.d.03506

çiftçi **Timur**⁹, yaşı 45

Kardeşinin oğlu, şabb-ı emred¹⁰

Hüseyin, veledi Hüseyin, yaşı 16

HANE 148:

Orta boylu, kîr sakallî çiftçi **Osman**,
veledi Köle Ahmed, yaşı 50

Oğlu **Hüseyin**, yaşı 16

Yegeni, Orta boylu, ter bıyıklı **Ali**,

veledi Veli, yaşı 21

1 Di defterê de wek “Xane” hatiye nivîsin. Jê qest “malbat” e.

2 Tê vateyê „kur, law, zar“.

3 Dibe ku ev nav “Çolaknebi” be jî.

4 Di defterê de “Ammisi” nivîsiye.

5 Dibe ku ev nav “Çolaknebi” be jî.

6 Dibe ku ev nav “Ateşoğlu” be jî.

7 Hemû nivîsên di nav kevan de min li ser nivîsê zede kirine.

8 Di defterê de “Karindaşı” nivîsiye.

9 Ew nav wek “Teymur” jî tê xwendin.

10 “Şabb-i Emred” tê wateya “xortê ku simbêl û rihê wî hîn nu derketiye”

HANE 149:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Veli**,

veledi Nabioğlu Resul, yaş 49

Oğlu **Resul**, yaş 10

Diğer (oğlu) **Hüseyin**, yaş 8

HANE 150:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Deli**

Hayta, veledi Arikoğlu Ibiş, Yaş 48

Kardeşi, orta boylu, kır sakallı **Ali(k)**,
yaş 47

Oğlu **Osman**, yaş 3

Rûpel 33 ya defterê nufusê: NFS.d.

3506

Di serê rupelê de bi Osmanî vеха

nivîsiye: „**Aşireti merqumdan**,

Qılviranlı mahallesinden Qandil
nam qaryede kain xanelerin, sin ve
eşkallerinin tasrihiyle defteridir ki ber
vechi ati zikr olunur“.

Bi Kurmancî: „Sal û dirufen malbatên, taxa
Qiloriyan, ya eşîra ku hatiye hêjmartin, ku
li gunda ku navê wê Qandîl e, dimînin.
Weke ku bê, hatiye nivîsin“.

HANE 90:

Orta boylu, kır sakallı **Ali** efendi, veledi

Şenbedoğlu¹¹ Ali, yaş 68


Oğlu orta boylu, kara sakallı **Osman**, yaş
40

Torunu¹² **Hasan**, yaş 7

Diğer (torunu) **Ali**, yaş 1

HANE 91:

Orta boylu, kara sakallı, çiftçi **Ali**, veledi



Subhioğlu¹³ Ali, yaş 43

Oğlu **Mustafa**, yaş 3

Kardeşi orta boylu, kara sakallı **Hasan**,
yaş 41

Kardeşinin oğlu orta boylu, kara bıyıklı
Ömer, veledi Mustafa, yaş 30

Diğer (kardeşi) orta boylu, kara bıyıklı
Nabi, Yaş 25

HANE 92:

Orta boylu, kara bıyıklı, çiftçi **Süleyman**,
veledi Ismailoğlu Memiş, yaş 25

HANE 93:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Süleyman**,
veledi Alikêoğlu Deli Mehmed, Yaş 60

Oğlu orta boylu, kara sakallı **Mehmed**,
yaş 40

Diğer (oğlu) orta boylu, kara bıyıklı

11 Dibeke ew nav “Seyyid” be jî, jiber ku baş nayê xwendin.

12 Di nivîsa Osmanî de “Hafîdî” nivîsiye. Bi Tirkîya iro tê wateya “Torun”. Bi Kurmancî “Nevî” ye.

13 Dibeke ew nav Sa(b)rioglu be jî, ji ber ku baş nayê xwendin.

Ömer, yaş 31

Diğer (oğlu) orta boylu, kumral bıyıklı

Osman, yaş 27

Kardeşi, orta boylu, kır sakallı **Mustafa**,
yaş 55

HANE 94:

Orta boylu, kara sakallı, çiftçi **Mustafa**,
veledi Yahyaoğlu Hacı Abdullah, Yaş 42
Oğlu **Osman**, yaş 10

Diğer (oğlu) **Hasan**, yaş 3

Biraderi orta boylu, kumral sakallı, çoban
Ahmed, yaş 45

HANE 95:

Uzun boylu, ter bıyıklı, çiftçi **Abdullah**,
veledi Çerkezoğlu Ali, yaş 23
Kardeşi **Mehmed**, yaş 13

HANE 96:

Orta boylu, kumral sakallı, çiftçi
Mustafa, veledi Mustafa, yaş 48
Oğlu **Ali**, yaş 3

HANE 97:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Mehmed**,
veledi Hamoğlu¹⁴ Abdullah, yaş 58
Oğlu orta boylu, kara bıyıklı **Mustafa**,
yaş 32

Diğer (oğlu) orta boylu, kara bıyıklı

Timur (Teymur), yaş 26

Diğer (oğlu) orta boylu, ter bıyıklı

Süleyman, Yaş 24

HANE 98:

Orta boylu, sarı sakallı, çiftçi **Mustafa**

veledi Şatiroğlu Talha¹⁵ Yaş 44

Oğlu **Mustafa**, yaş 1

**Kardeşi oğlu orta boylu, kumral bıyıklı
Ahmed**, yaş 29

Diğer (kardeşi) orta boylu, ter bıyıklı

Hüseyin, yaş 21

Diğer (kardeşi) orta boylu, kumral bıyıklı
Osman, yaş 25

HANE 99:

Orta boylu, kara bıyıklı, çiftçi **Mustafa**,
veledi Rusanoğlu¹⁶ Hasan, yaş 30
Oğlu **Mehmed**, yaş 4

Rûpel 34 ya defterê nufusê: NFS.d. 3506

HANE 100:

Orta boylu, kumral bıyıklı, çiftçi
Abdullah, veledi Yahyaoğlu Osman, yaş 29
Amcasinin oğlu, şabb-ı emred **Osman**,
veledi Hacı Bekir, yaş 16
Diğeri **Ali**, yaş 11

HANE 101:

Orta Boylu, kumral sakallı, çiftçi **İbiş**,
veledi Sarı Nabi, yaş 45
Oğlu **Ahmed**, yaş 7

HANE 102:

Orta boylu, kara bıyıklı, çiftçi **Osman**
veledi Sarıoğlu¹⁷ Ahmed, yaş 33

HANE 103:

Yetim **Hüseyin**, veledi Reyhanoğlu
Mehmed, yaş 13

HANE 104:


Uzun boylu, kır sakallı, çiftçi **Mehmed**,

¹⁴ Dibe ku ew nav “Sam” yan “Hadim” be jî.

¹⁵ Dibe ku ew nav “Nalî” yan “Nabî” be jî.

¹⁶ Dibe ku ew nav “Rohanoğlu” be jî.

¹⁷ Dibe ku ew nav “Sabrioğlu” be jî.



veledi Yahyaoğlu Resul, yaş 44

Oğlu **Mehmed**, yaş 11

Kardeşinin oğlu **Kanber**, veledi Hüseyin, yaş 12

(Kardeşinin) diğer (oğlu) **Ali**, yaş 10

HANE 105:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Bekir**, veledi Yanıknabioğlu, yaş 58

Oğlu **Mehmed**, yaş 8

Diğer (oğlu) **Mustafa**, yaş 6

HANE 106:

Orta boylu, kır sakallı, çoban **İbrahim**, veledi Kasımoğlu Hasan, yaş 49

Oğlu **Ali**, yaş 5

Amcasinin oğlu, orta boylu, ter bıyıklı **Mehmed**, veledi Veli, 26

HANE 107:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Hasan**, veledi Akkaşoğlu Mahmud, yaş 59

18 Dibe ku min ev nav çewt xwendiye.

Oğlu **Haci Mehmed**, yaş 4

Amcasinin oğlu orta boylu, kara bıyıklı

Ahmed, veledi Memiş, yaş 36

HANE 108:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Ömer**,

veledi Oksüzhasan oğlu, yaş 44

Kardeşi orta boylu, kara bıyıklı **Hüseyin**, yaş 27

HANE 109:

Uzun boylu, kır sakallı, çiftçi **Mehmed**, veledi Deliansioğlu ¹⁸ Abdullah, yaş 50

HANE 110: 23-50?

Orta boylu, kara sakallı, çiftçi **Mehmed**, veledi Karafakioğlu Mustafa, yaş 42

Oğlu **Hasan**, yaş 3

Kardeşi orta boylu, kara sakallı **Ömer**, yaş 26

HANE 111:

Orta boylu, kumral sakallı, çiftçi **Ali**, veledi Bıyıklıoğlu Hasan, yaş 42

Kardeşi orta boylu, ter bıyıklı **Osman**, yaş 24

HANE 112:

Orta boylu, ak sakallı, çiftçi **Hüseyin**, veledi Bıyıklıoğlu Mehmed, yaş 64

Oğlu, orta boylu, kumral bıyıklı **Yusuf**, yaş 38

HANE 113:

Orta boylu, kara bıyıklı, rençber **Hasan**, veledi Habib, yaş 30

Rûpel 35 ya defterê nufusê: NFS.d. 3506

HANE 114:

Orta boylu, kumral sakallı, deveci **İsmail**, veledi Aslanoğlu, yaş 41

HANE 115:

Orta boylu, kumral bıyıklı, çiftçi
Kanber, veledi **Melle**¹⁹ İsmail, yaş 26

HANE 116:

Orta boylu, kara sakallı, çiftçi **Hasan**,
veledi topal Yusuf, yaş 47

Oğlu **Ali**, yaş 1

Kardeşi orta boylu, kara sakallı **Memiş**,
Yaş 40

HANE 117:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Osman**,
veledi Kemaloğlu Musa, yaş 60

Yiğeni, orta boylu, şabb-ı emred

Süleyman, veledi Süleyman, yaş 18

HANE 118:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Süleyman**,
veledi Yahyaoğlu Hacı Abdullah, yaş 55
Oğlu Abdullah, yaş 5.

HANE 119:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Mehmed**,
veledi Akcacoglu Mustafa yaş 56
Oğlu, orta boylu, kumral bıyıklı **Hanefi**,
yaş 30

Diğer (oğlu) **Yusuf**, yaş 15

Diğer (oğlu) **Ali**, yaş 10

HANE 120:

Uzun boylu, kır sakallı, çiftçi **Ali**, veledi
deli Alibek (Alibey), Topalvehhaboğlu
Mehmed, yaş 50

HANE 121:

Uzun boylu, kır sakallı, çiftçi **Ahmed**,
veledi Topalvehhaboğlu, yaş 62

Oğlu, şabb-ı emred, **Mehmed**, yaş 16

HANE 122:

Ortaboylu, kır sakallı, çiftçi **Satılmış**,
veledi Deliismailoğlu, yaş 46

Oğlu **Hasan**, yaş 3

Kardeşi orta boylu, (şabb-ı) emred

Osman, veledi Ali, yaş 13

HANE 123:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Hüseyin**,
veledi Azizoglu Ali, yaş 48

Oğlu **Mehmed**, yaş 5

Kardeşi, orta boylu, kumral bıyıklı
Haydar, yaş 40

HANE 124:


Orta boylu, kumral bıyıklı, çiftçi **Osman**,
veledi **Cursımoğlu** Ali, yaş 31

Kardeşi, orta boylu, ter bıyıklı **Mehmed**
Cebrail, yaş 24

HANE 125:

Orta boylu, kır sakallı, çiftçi **Mehmed**,
veledi Sarınabioglu Mehmed, yaş 43

Oğlu **Ömer Hüseyin**, yaş 6



NFS.4.03.506

19 Di nivîsê Osmanî de "Monla (Molla)" nivîsiye

Mîrza Seîd

kurdê yekem li Swêdê (1893)

Rohat Alakom

Ev lêkolîna jêrîn ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de jîyana Mîrza Seîd bi tevayî û di beşa duwem de mayîna wî ya li Swêdê tê nasandin. Wek sernivîsa vê lêkolînê jî nîşan dide armanca amadekirina vê xebatê zêdetir ronîkirina hatin û mayîna doxtorê kurd Mîrza Seîd (1863-1942) li Swêdê ye. Ew, dema di sala 1893an de tê Swêdê qasî sê mehan li vir dimîne. Wek em ê li jêr jî bibînin di vê dema kurt de ew çûye seredana gelek cîh û navendan. Ev agahiyên li ser mayîna wî ya li Swêdê hêvî dikim ji temamkiririna portreyeke wî ya giştî re jî bibin alîkar.

Kurtejiyana wî

Mîrza Seîd kurê kesekî bi navê Resul bûye ku ji Kurdistanê Tirkîyê çûye Sineyê (Senendec/j). Lê belê di çavkanîyan de derbas nabe gelo ew ji kîjan devera Kurdistanê Tirkîyê çûye. Navê jina wî, Muhlîse bûye. Resul wek kesekî zane hatiye nasîn. Bi terîqeta Nexşîbendî re tê girêdan, zanyarî û agahiyên xwe yên di derbarê olî da pêşta dibe. Heyşt zarokên vê malbatê hebûne. Pênc heb ji wan li dû hev dimerin. Du kurên Resul dimînin, navê yê piçûk Seîd û yê din jî Keko bûye. Bavê wan ew bi perwerdeya oldarîyê mezin kirine, erebî û farisî hînî wan kiriye. Seîd dema 12 salî bûye bavê xwe winda dike. Bi zên û zanebûne xwe xortekî gelek serwext û hişyar bûye. Dema bavê wî dimre şûna bavê xwe digre. Şênîyên herêmê hurmeta ku ji bavê wî re nîşan dane, ji wî re jî nîşan didin. Carekê jî di sala 1879an de keşekî suryanî bi navê Johanan (suryanî: Johannes) ligel du kesên pirtûkfiros jî Urmîyê tên Sineyê. Dema Johanan dixwaze farisî fêr bibe, jê re Mîrza Seîd tewsîye dikan. Mîrza Seîd gelek di bin bandûra wan de dimîne. Dema belav dibe wekî Seîd derbasî ser ola xiristîyanîyê bûye êdî li Sineyê şansê mayîna wî kêmtir dibe û li hemberî wî dijayetîke mezin peyda dibe.

Mîrza Seîd di dawîyê de biryara xwe dide û koçberî bajarê Hemedanê dike. Ev bajarê dîrokî çawa tê zanîn wek paytexta Dewleta Medan hatiye nasîn. Berê navê bajêr Ekbatana bûye. Piştî rêwîtiya 6 rojên bi zehmet Seîd tê Hemedanê. Li vir êdî bi rehetî dikare tevbigere. Navê wî Mele Seîd li vir dibe Mîrza Seîd. Ew li wir rastî hin mîsyonerên amerîkayî tê. Mîrza Seîd li vir bi alîkarîya doxtorêkî amerîkayî perwerdeya pratîk û teorîk ya doxtorîyê (tip) dibîne, bi îmkânên xwe vî pîşeyî (meslek) pêşta dibe. Vê demê fêrî zimanê îngilîzî jî dibe. Di nav demeke kurt de dibe wergêrê van kesên amerîkayî.

Mîrza Seîd li Hemedanê qasî 12 salan wek mamosteyê ziman, berendamê doxtorîyê û doxtor kar dike.¹ Di sala 1883an de birayê wî Keko tê Hemedanê, li wir li hev tînin û birayetiya wan ji nû ve jîndar dibe. Di roja 10/4 1887an de bi awayekî resmî tê waftîzkirin û dîn diguhirîne.² Dema Mîrza Seîd ji zarokên keşe Sîmon re li Hemedanê mamostetiya zimanê farisî dike, dilê wî dikeve keça malê. Piştî çend mehan bi keça Sîmon re dizewice. Navê wê Rebecka bûye. Li bajarê Urmîyê çûye lîseya keşan. Dema Rebecka xwendina xwe diqedîne li Hemedanê di dibistaneke keşan de dibe mamoste. Sê zarokên Mîrza Seîd çêdibin, du kur û keçek: Samuel, Lemuel û Sarah. Ji van Samuel bi salan li Îngiltereyê maye û li wir mihendîsî xwendiyê. Lemuel di sala 1927an, di 31salîya



Wêneyê Mîrza Seîd dema li Swêdê

1 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Vittnesbörd från Kurdistan*, Sâdd och Skörd Förlag, översättning: Janne Carlsson, 1987, rûp.38.

2 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Vittnesbörd från Kurdistan*, rûp.33.

xwe de gelek zû dimire û wî li Îngîltereyê binax dikin. Keça wî Sarah paşê bi doxtorekî ermenî re mêr dike û li Hemedanê dimînin.

Seîd piştî gera Swêdê (1893) payîza eynî salê bi keştiyekê di ser Behra Bakur re diçe Îngîltereyê. Di destpêkê de di “Mala Hizûrê ya Deryevanên Skandînavî” de dimîne. Li Îngîltereyê doxtorekî bi navê Charles Warren alîkarîya wî kiriye. Heta terîxa 30/11 1895an li vir qasî du sal û nîvan dimîne. Wek kurê malê li bal vê malbatê dijî. Çawa em ji çavkanîyên dîrokî fêr dibin Mîrza Seîd paşê du caran dîsa di sala 1902³ û sala 1913an de berbi Îngîltereyê rêwîti kiriye. Di gera xwe ya sala 1902an de di warê doxtoriya çavan de perwerde bûye. Dema Mîrza Seîd çûye Îngîltereyê, di van seferên xwe de hin çavkanî û dokumenên kevn yên edebîyata kurdî jî li gel xwe biriye û li wir teslîmî rohilatnasan kiriye.⁴ Mîrza Seîd dema li Îngîltereyê dimîne, nasîya xwe dide îranîst û rohilatnasê îngîlîz Edward Granville Browne (1862-1926) û têkilîyên xwe xurt dike. Mîrza Seîd berhemên dûrîdest yên doxtorê navdar Îbnî Sîna jî berhev kirine, bi xwe re biriye Îngîltereyê.⁵ Yek ji wan helbestên kevin ku tê gotin Mîrza Seîd berhev kiriye paşê wek helbesteke kurdî ya yekem û nivîskî tê hesibîn. Ev helbest tê gotin ku li ser çerm hatiye nivîsîn. Niqaşên di derbarê vê helbestê de her berdewam in.⁶ Belavbûna gotinên vê helbestê paşê di nav kurd û biyanîyan de kelecaneke mezin peyda dike. Helbest bala lêkolerên biyanî jî dikêşîne, wek mînak helbestvanê swêdî Gösta Ågren dema di sala 1969an de di derbara zordestîyên li hemberî kurdên Iraqê nivîsekê diweşîne, berî nivîsa xwe van rêzên jêrîn yên vê helbesta dîrokî wek epîgraf bi kar tîne. Di binê epîgrafê de vê notê çîh girtiye: “*Helbesteke anonîm ji sedsala 800an dema ereban Kurdistan zefî kiriye*”. Ev helbesta bi navê *Hurmuzgan* zordestî û êrişên ku kurdan di dîrokê de dîtiye bi awakî vekirî radixe ber çavan:

3 Anthology of Gorani Kurdish Poetry. Compiled by A. M. Mardoukhi (1739-1797). Edited by Anwar Soltani. Soane Trust for Kurdistan, 1998, rûp.7-8.

4 Gösta Ågren, Irak mîrdar kurderna, *Expressen*, 22/3 1969.

5 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Doktor Saît*, rûp.1952-153.

6 Aso Zagrosî, Pîrşalyar, Hurmuzgan Şiiri ve Dr. Saîdxan Kurdistanî, <https://www.alayekiti.com/pirsalyar-hurmuzgan-siiri-ve-dr-saidxan-kurdistani/> (6/2 2017).

Cihên îbadetê wêranbûyî ne, ocax vemirîne
Mezinên mezina xwe veşartine
Erebên xwînxwar gundên paleyan nehiştin.
Heta herêma Şehrezorê hatin
Jin û keçên wan bi xwe re birin
Şervanên mêrxas di nav xwînê de can dan
Ayînên olî yên Zerdeşt zêde nayên şopandin
*Kes nemaye êdî dilê Ahura Mazda pê bişewite.*⁷

Dema Mîrza Seîd li Swêdê maye, di şeveke muzîkê de helbestên wî bi wergera Erik Nyström hatine pêşkeşkirin. Rojnameya *Dagens Nyheter* ku cîh daye vê nûçeyê Mîrza Seîd wek kesekî nivîskar daye nasandin.⁸ Çavkanîyên din jî dîyar dikin ku wî hin helbest nivîsîne.⁹ Têkilîyên Mîrza Seîd ligel kurdnasên navdar jî çêbûye. Minorskî di lêkolîneke xwe de Mîrza Seîd wek “Saîd-Xan Kordestanî” dinavîne, di warê jîyana kurdan, ziman û kevneşopîyên kurdî de wî wek kesekî zane dide nasîn û wî wek hevalê xwe “hevalê min” dihesibîne: “*Di sala 1917an de hevalê min Seîd Xan Kurdistanî mersîyeke (teksteke şînê) ku Ahmed Xan Komastî li ser jina xwe ya mirî nivîsîye gîhande min*”.¹⁰ Seîdê ku Minorskî qala wî dike ji hin alîyan ve hinekî dişibe mamoste, informator û şêwirmendê Nikitinê ku di navbera salên 1915-1918an li Îranê maye û wek konsolosê rûs li Urmîyê kar kiriye, navê wî jî Mele Seîd bûye. Divê em li vir dîyar bikin ku ev herdu Seîd ji hev cihê ne. Ji ber hevşibandina nav, cîh û deman di hin çavkanîyan de carina navê van herdu Seîdan hatine tevlihevkirin. Seîdê ku Nikitin qala wî dike, ne doxtor e û ne jî ol guhartiye, oldarekî sade ye. Seîdê ku Minorskî qala wî dike ango “Seîd-Xan Kordestanî” û kesê ku mijara vê lêkolîna me pêk tîne di sala 1942an de bi hemdî xwe dimire, lê belê Seîdê ku Nikitin qala

7 Gösta Ågren, Irak mördar kurderna, *Expressen*, 22/3 1969.

8 En musikstund i Vaxholm, *Dagens Nyheter*, 2/9 1893. Angorî agahîyên rojnameyê ev şev wê di roja 3/9 1893an de çêbibe.

9 a Janne Carlsson & Börje Egfors, *Kurderna -det glömda folket?* Sâdd och Skörd Förlag, 1983, rûp.10.

10 V. Minorsky, The Guran, *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, Vol. 11, nr 1/1943, rûp.96.

wî dike di sala 1918an de tê kuştin. Ev Seîdê tê kuştin wek Mele Seîdê Şemdinanî jî hatiye nasîn.¹¹ Nikitin di xebata xwe ya li ser kurdan de bi sergirtî qala Mîrza Seîdê me jî dike. Dema ew qala nameyekê dike wek mînak di cîhekî de dibêje ku ev name ji aliyê “*Xortekî ciwan yê kurd ku li Sineyê li bal mîsyonerên katolîk perwerde dibû*” hatiye nivîsîn.¹²

Mîrza Seîd piştî ku li Îngîltireyê doxtorîya xwe pêşta dibe êdî gelek tê nasîn. Mal û cîhê karê xwe dibe Tehranê û gelek salan li wir dimîne. Di nav nexweşên wî de gelek kesên navdar hebûne. Havînan diçe aliyê Hemedanê, li wir çend mehan havîna xwe darbas dike. Mîrza Seîd piştî gelek salan şûnda diçe seredana bajarê kal û bavên xwe li Sineyê. Vê carê ji aliyê gel de bi kêfxweşî tê pêşwazîkirin. Carekê di sala 1937an de ji ber şandina nameyeke serxweşiyê tê girtin qasî 99 rojan di zindanê de dimîne.

Di sala 1939an de jina wî Rebecka, di sala 1940an birayê wî Keko vefat dike. Mîrza Seîd êdî xwe tenê dihesibîne. Ew bi xwe jî di sala 1942an de, di heftê û neh salîya xwe de li Hemedanê can dide. Dema dimire li wir li dêrê bona bîranîna wî civîneke mezin çêdibe. Di bin dareke gûzê de li kêleka gora dostên xwe yan jî şagirtên xwe Hawkes û jina wî tê binaxkirin. Berî salan Mîrza Seîd ji wan re mamostetîya zimanê farisî kiribû. Di hin çavkanîyên kurdî de tê gotin ku Mîrza Seîd di sala 1925 yan jî di sala 1939an de miriye ku ne rast e. Zane, filozof û doxtorê navdar Îbnî Sîna (980-1039) ku bi latînî *Avicenna* hatiye nasîn ji Mîrza Seîd re dibe nimûne, mîna keke ku hertim çav daye wî. Çawa tê zanîn Îbnî Sîna dema miriye li Hemedanê hatiye veşartin. Mîrza Seîd gelek hewl daye bona vî mezinê mezina abîdeyekê li Hemedanê çêbike. Lê belê ew di vî warî de bi ser neketiye. Ev daxwaza Mîrza Seîd bes piştî mirina wî di sala 1954an de tê cîh.

Berbi Swêdê

Navê Mîrza Seîd cara yekem dema min di derbarê têkilîyên kurd û swêdîyan de agahî berhev dikirin, bala min kişand.¹³ Min di pirtûka xwe

11 Ergin Öpengin, Mola Said Şemdinani'den I. Dünya Savaşı Esnasında Kürtlere Alternatif Bir İttifak Önerisi, *Kürt Tarihi*, nr 26/2016, rûp.4-6.

12 Basil Nikitine, *Kürtler*, Örgün Yayınevi, 2010, rûp.203.

13 Di çavkanîyan de hin caran navê Mîrza Seîd wek “Mele Seîd”, “Seîd Xan” yan jî “Seîd Xan-i Kurdîstanî” derbas dibe.

ya ku di sala 2000an derket û çend cîhên din de li ser jiyana û kesayetîya wî hin agahîyên kurt pêşkêş kirin.¹⁴ Çawa em li vir jî dibînin hatin û mayîna Mîrza Seîd li Swêdê ev cara pêşîn e dibe mijara lêkolîneke cihê û serbixwe. Kesê ku cara yekem bala xwendevanên swêdî kişandiye ser jiyana Mîrza Seîd mîsyoner L.E. Högberg (1858-1924) ye. Wî di bîranînên xwe de beşek ji Mîrza Seîd re veqatandiye. Högberg di vê pirtûka xwe ya ku di sala 1920an de hatiye weşandin bi hûralî qala Mîrza Seîd dike. Wan di sala 1893an de li Îranê hevdu nas kirine.¹⁵ Di hin nivîs û pirtûkên din yên Högberg de jî navê Mîrza Seîd derbas dibe.

Di sala 1983an de li Swêdê pirtûkeke ku kurdan dide nasîn hat weşandin. Ev pirtûka piçûk jî ku ji aliyê Janne Carlsson û Börje Egfors li ser kurdan hatiye nivîsîn bi kurtî cîh dide jiyana Mîrza.¹⁶ Piştî çend salan ji van nivîskaran Janne Carlsson bi serê xwe bîyografiya Mîrza Seîd ku di sala 1957an de hatiye nivîsîn, piştî 30 salan werdigerîne zimanê swêdî.¹⁷ Ev xebata paşê bi zimanên din jî derdikeve, wek tirkî.¹⁸ Teksta tirkî angorî ya swêdî dirêjtir e. Wisa xuya dibe ku teksta swêdî wek formeke kurtkirî hatiye weşandin. Ev bîyografiya ji aliyê du kesa ve tê nivîsîn. Ji van nivîskaran Jay M Rasooli birazîyê Mîrza Seîd e, kurê Keko ye ku li Lozanê tip xwendiyê û bi salan li Amerîkayê wek doxtor kar kiriye û Cady H Allen jî mîsyonerek e ku qasî 44 salan li Îranê maye. Yek ji wan lêkolerên ku piştî salan di xebateke xwe de bi kurtî qala Mîrza Seîd dike jî John Hultvall e.¹⁹ Di van salên dawîn de em ji çend nûçeyên di derbarê gera Mîrza Seîd ya sala 1893an li Swêdê de jî agahdar bûn. Bi saya van nûçeyên ku di çapemenîya swêdî de derketine bi kêmanî em fêr dibin ku ev kurdê yekem li Swêdê li kijan herêmên vî welatê bakur maye, çi kiriye û tevî çi çalakîyan bûye.

14 Rohat Alakom, *Svensk-kurdiska kontakter under tusen år*, Apec, 2000, rûp.181-182.

15 L.E. Högberg, *Bland Persiens Muhammedaner*, Svenska Missionsförbundets Förlag, 1920, rûp.178-193.

16 Janne Carlsson & Börje Egfors, *Kurderna -det glömda folket?*, rûp.7-10.

17 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Vittnesbörd från Kurdistan*, Sâdd och Skörd Förlag, 1987.

18 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Doktor Sait*, Yeni Yaşam Yayınları, 1997.

19 John Hultvall, *Mission och vision i Orienten-Svenska Missionsförbundets mission i Transkaukasien och Persien 1882-1921*, Verbum, 1991, rûp.115-117.



Nûçeyêke di derbarê Mîrza Seîd de (*Dagens Nyheter*, 19/6 1893)

Ev serpêhatiya Mîrza Seîd ya li Swêdê bona wan bi deh hezaran penaberên ku rêça Mîrza Seîd şopandine hatine vî welatê Ewropaya Bakûr ji bûye mijareke heweskar. Ev kurdan xwe wek peyketiyên Mîrza Seîd dibînin û li vê dîrokê xweyî derdikevin Yek ji wan cihên ku Mîrza Seîd li Swêdê zêde maye Vaxholm e. Di roja 3/9 2019an de ez bi keşîyê çûme Vaxholmê, çend saetan li wir mam û paşê careke din bi otobosê vegeriyame Stockholmê. Min bi rêya vê seyrana xwe xwest ku wan mekan û cihên ku Mîrza Seîd berî salan lê maye û tevî çend çalakîyan bûye, bi çavên xwe bibînim. Ji wê salê 1893 heta niha 126 sal derbas bûne. Rêwîtiya min ya berbi Vaxholmê qasî saetekê ajot. Kelecana min dema ez nêzîkî vê giravê dibûm zêdetir dibû. Pêşîyê çûme Dêra Vaxholmê û paşê çûme devera Missionshus ku Mîrza Seîd li wir tevî şeveke muzîkê bûye. Ew avahîya bi navê Missionshus ku di sala 1886an de hatiye çêkirin, di sala 1967an de tê hilweşandin, li wir paşê xaniyên nû tên çêkirin. Ev avahîya bi pereyê mezî di sala 1886an de çêkirin, mirov ji wêneyên wê demê dibîne ku avahîyeke xweşik bûye, cihê qasî 1500 kesî de hebûye. Yek ji wan kesên ku bona çêkirina vê avahîyê gelek hewl daye û pere berhev kiriye mîsyoner Carl Andersson bûye. Dema ez çûme Vaxholmê tavilê min xwest herim cihê wê avahîyê ku Mîrza Seîd berî salan çûye seredana wê. Vaxholm di sedsalên kevin de bi keleha xwe wek bajarekî garnisonî

(navenda leşkerî) hatiye nasîn. Keleha Vaxolmê di sedsalên kevin de wek girtîgeh jî hatiye bikaranîn. Paşê giringîya xwe ya leşkerî winda dike, di dawîyê de wek avahîyeke dîrokî û çandî ji turîstan re vedibe. Koka peyva Vaxholm ji du gotinan pêk tê. Vax- (şînbûna gîhayan) û ji peyva holm (giravok). Vaxholm wek bajarê komgirava Stockholmê hatiye nasîn. Li vê herêmê qasî 25 000 girav, giravok û zinargirav hene. Bajarê Vaxholmê xweyî qasî 5 hezar kesan e. Dema ez li Vaxholmê bûm û çûm restoraneke bona navrojekê bixwim, min mêze kir xwedîyê restoranê kesekî ji Îranê ye, kesekî hemwelatîyê Mîrza Seîd. Min jê re bi kurtî qala hatina xwe û serpêhatîya Mîrza Seîd kir. Em çûn dewrên berê.



Îlana ku axaftineke Mîrza Seîd li Örebroyê radigihîne (*Nerikes Allehanda*, 30/6 1893)

Mîrza Seîd di dîroka kurdên Swêdê de cîhekî taybetî û giring werdigre. Çimkî ew wek kurdê yekem tê nasîn û hesibandin ku cara pêşîn gava xwe avitiye ser axa Swêdê. Mîrza Seîd li Îranê li bajarê Hemedanê rastî mîsyonerekî swêdî bi navê L.E. Högberg tê. Dema Högberg di roja 9/6 1893an de tê Swêdê, wî vedixwîne û li gel xwe Seîd jî tîne bona perwerdeya doxtorîyê. Ew qasî sê mehan li Swêdê dimîne. Dema Mîrza Seîd tê Swêdê li vir tevî çend çalakîyan dibe, derketiye pêşîya şênîyên swêdî, di derbara jiyana xwe û welatê xwe Kurdistanê de ew agahdar kirine. Högberg di bîranînên xwe de wiha qala van rojan û kesayetîya Mîrza Seîd dike:

“Wî, çend sal li pey hev li bajarê Hemedanê li ber destê doxtorekî amerîkî kar kir û di warê pîşeya doxtorîyê de ji wî perwerdeya teorîk û pratîk wergirt. Paşê demekê bi serê xwe pratîk kir. Li gel keça keşe Sîmon re zewicî, bû xweyê maleke dilşa û aram. Dema sala 1893an ez vegeyriyam Swêdê, Seîd jî li gel min rêwîti kir bona xwe di warê doxtorîyê de hîn jî perwerde bike. Wê demê me gelek ger bi hev ra li Swêdê pêk anîn û em di çend civînên havînê ku hersal vê demê dihatin çêkirin de amade bûn. Wî kiribû adet bi zimanê xwe yê sade dipeyivî, jidil, lêbelê di eynî carê de gelek tesîrker di derbarê wê evîna ku di Îsa de tecellî dikir, dipeyivî. Min wek wergêr xizmet dikir. Piştî vê gelek sal derbas bûn, lê belê ez bawer dikim tu kesê/kesa ku di civîna “Komeleya Ansgarii ya Dalarna” li Malungê sala 1893an de beşdar bûye û guh daye axafîna wî, ew ji bîr kiriye yan jî şîretên ku li me dikirin. Demeke nejbîrbar bû. Gîyana Xwedê nêzîk bû û bandûra xwe li ser her dilê dihişt. Mîrov tu çavekî zuha nedidît”.²⁰



Dêra bi navê Vasakyrkan li bajarê Örebroyê ku Mîrza Seîd roja 1/7 1893an li wir tevî civînekê bûye

Ne tenê Stockholm, Mîrza Seîd çûye çend bajar û cîhên Swêdê yên din jî wek Malung, Jönköping, Kristinehamn, Örebro, Skagersbrunn. Rojnemeyên swêdî yên van salan jî di derbarê beşek ji van ger û çalakîyên Mîrza Seîd de agahîyên kurt pêşkêş dikin. Yek ji wan rojnemeyên mezin

20 L.E. Högborg, *Bland Persiens Muhammedaner*, rûp.193.

Dagens Nyheter dinivîse ku Mîrza Seîd û L.E. Högberg roja 18/6 1893an li devera Vaxholmê ku wek perçeyekî Stockholmê tê hesibîn derketine pêşîya şênîyan û di derbarê gelek tiştan de axifîne. Mîrza Seîd di vê civînê de bi kincên xwe yên neteweyî beşdar bûye, gotinên wî ji aliyê Högberg de bi zimanê swêdî hatine wergerandin. Gelek kes ji bajarê û deverên derdorê tevî vê civînê dibin. Mîrza Seîd bi hevokên kurt û hêzdar ji beşdaran xwestiye çî ji destê wan tê bikin bona alîkariya gelê wî.²¹ Eynî nûçe di rojnameyê de din de jî dubare bûye.²² Du hefteyan şunda Mîrza Seîd vê carê diçe bajarê Örebroyê, beşdarî civînekê dibe.

Em di derbarê vê civînê de di rojnameyan de rastî îlanekê tên ku berî vê rojê hatiye weşandin. Rojnameya herêmî *Nerikes Allehanda* ya bi terîxa 30/6 1893an dîyar dike ku “*Doxtor Mîrza Seîdê ji Kurdistanê*” di roja 1/7 1893an de li Örebroyê di dêra bi navê Vasakyrkan de dê beşdar bibe. Ketina hundir bi pere bûye: 25 öre (qurîşê swêdî).²³ Angorî rojnameyekê Mîrza Seîd roja 6/7 1893an çûye bajarê Kristinehamnê jî.²⁴ Piştî çend rojan Mîrza Seîdê di terîxa 6/7 1893an de diçe herêma Dalarna, seredana bajarê Malungê dike. Rojnameyek dîyar dike ku Mîrza Seîd li vir di avahiya dêreke piçûk ya bi navê Bönhuset de bi kincên xwe gelek bala beşdaran kişandiye. Civîna Malungê piştî nîvro dema baran disekine li derve çêdibe. Dîsa wek berî nîvro Högberg û Mîrza Seîd li gel hev derdikevin pêşberî gel. Rojname dibêje ku axaftina Mîrza Seîd ji aliyê Högberg bi wergera swêdî hatiye pêşkêşkirin.²⁵ Ev seredana Mîrza Seîd gelek deng vedide. Piştî vê civînê qasî 25 sal derbas dibin wek me li jorê jî dît Högberg vedigere van rojên berê û vê axaftina Mîrza Seîd ya li Malungê bi bîr tîne.²⁶ Em ji nûçeyê ji destpêka meha îlonê fêr dibin ku Mîrza Seîd hê li Swêdê ye. Cara duwem dîsa çûye Vaxholmê û di şeve ke mûzîkê de beşdar dibe. Di şevê de helbesteke Mîrza Seîd bi wergera Erik Nyström hatiye pêşkêşkirin. Erik Nyström (1842-1907) wek nivîskar, siyasetmen-

21 Missionsmöte, *Dagens Nyheter*, 19/6 1893.

22 Ett större missionsmöte, *Stockholms Dagblad*, 19/6 1893.

23 Predikoturer i Vasakyrkan, *Nerikes Allehanda*, 30/6 1893.

24 Värmlands ansgariiförening, *Bergslagsposten*, 8/7 1893.

25 Mötena i Malung, *Dalpilén*, 7/7 1893.

26 L.E. Högberg, *Bland Persiens Muhammedaner*, rûp.193.

dar, wergêr û oldarekî navdar hatiye nasîn. Rojnameyê di vê nûçeyê de Mîrza Seîd wek kesekî nivîskar daye nasandin. Stranbêj C. Cederstedt, kemanjen M. Månsson û pîyanîst L. Laurin tevî vê şevê bûne. Hatina şevê angorî rojnameyê bona çandin û çikandina fîdanan li Vaxholmê de bê xerckirin.²⁷ Rojnameyeke din ku vê şeva muzîkê wek nûçe pêşkêş dike radigihîne ku bernamêya şevê gelek dewlemend e, di navbera beşan de Mîrza Seîdê axafînekê bike.²⁸ Ne tenê rojnameyên swêdî yên van salan çavkanîyên din jî nîşan didin ku Mîrza Seîd dema li Swêdê maye gelek bala mirovan kişandiye. Wek mînak di bîyografîyeke di derbarê Mîrza Seîd de ew wiha tê nasandin:

*“Piştî çend rojan Högberg ji Vaxholmê²⁹ bi telefonê li wî digere bona bê bal wî û li gel xwe kincên xwe yên kurdî û xençere xwe jî bîne. Li pey vê ew û Högberg li Swêdê derdikevin rêwîtiyeke dirêj. Hin caran bi trenê, hin caran bi keştiyê û hin caran jî bi peyati ji qezayekê diçûn ya din. Kincên Seîd yên kurdî gelek bal dikişandin. Şaşika wî ya hevrişîm û bixêz, piştika wî ya dirêj ku bi nava xwe alandibû, tunika ku heta çoka wî dirêj dibû, cakêtê ku pêşîya wî vekirî bêmil bû, şalê wî, çarixên wî û berî her tiştî jî xençera wî ya kin û bikevena û destika wê bi diranên filan çêbibû ku xistibû ber kemera xwe bala mirovan dikişand. Bi rabûn û rûniştina xwe yekî bi şanaz bû. Vegotina mijarên wek derbaskirina jiyana di nav kurdan de û kirinên wî yên li Îranê hiş ji serê guhdaran dibir û gelek kêfa wan dianî.”*³⁰

Di çend nûçeyan de em dixwînin ku Högberg di havîna sala 1893an de bi tenê di hin civîn û çalakîyan de beşdar bûye. Mirov dikare bi rehetî texmîn bike ku wî, mêvanê xwe Mîrza Seîd tenê nehîştîye, ew jî li gel xwe biriye van civînan. Högberg di yek ji van axaftinên xwe de gotiye ku *“ew di kon û çadîrên kurdan de razaye”* û li herêma Agirîyê maye.³¹

Em ji bîranînên xanim Sigrîd Braune fêr dibin ku dema ew çûye herêma Värmlandê, li hêla cîhê germava bi navê Skagerbrunnê maye, ew li wir rastî Mîrza Seîd û Högberg hatiye. Mîrza Seîd gelek bala wê kişandiye.³²

27 En musikstund i Vaxholm, *Dagens Nyheter*, 2/9 1893. Angorî agahîyên rojnameyê ev şev ê di roja 3/9 1893an de çêbibe.

28 En musikstund, *Nya Dagligt Allehanda*, 1/9 1893.

29 Di bîyografiya Mîrza Seîd de ku pêşîyê bi îngilîzî û paşê bi zimanê tirkî hatiye weşandin navê vî cîhî bi xeletî wek Oxholm derbas dibe. Jay M Rasooli & Cady H Allen, Doktor Sait, rûp.74.

30 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Doktor Sait*, rûp.74.

31 En missionärs erfarenheter, *Jönköpings Posten*, 7/8 1893.

32 Fru Sigrîd Högberg, Öst-Turkestan, *Ansgarius*, 1915, rûp.45.

Mîrza Seîd û Högberg li wir tevî civîneke mîsyoneran jî dibin.³³ Çawa rojnameyên vê salê dinivîsin Sigrid Braune eynî salê (1893) bi Högberg re mêr dike, jiyana xwe dikin yek. Högbergê ku gelek salan li Îranê kar kiriye li gel jina xwe, vê carê berê xwe dide Turkîstana Rojhilat ku li wir tirkên uygur diman, ji sala 1894an heta sala 1916an li wir kar kiriye. Dema Mîrza Seîd li Swêdê maye dostên wî xwestine ku ew jî li gel wan here Tirkîstana Rojhilat kar bike. Lê belê wî xêncî Îranê nexwestiye here li cîhekî din bixebite.



Avahiya Missionshuset li Vaxholmê ku Mîrza Seîd tê de helbest xwendîye (1893)

Dema Mîrza Seîd li Swêdê dimîne tendûristîya wî berbi nebaşîyê ve diçe. Ew li Swêdê rastî pir kesian û çehreyan hatiye, axaftinên cihê pêk anîne û zêdebûna rêwîtiyan wî gelek diwestîne.³⁴ Doxtoran jê re qenckirina avê (hidropatik) tewsiye kirine. Li ser pêşneyarên doxtorêkî demekê diçe ber behrê bona hinekî bêhnna xwe vede.³⁵ Çawa me li jor jî dîyar kir Mîrza Seîd havîna sala 1893an çûye Skagersbrunnê ku bi germava xwe ve navdar bûye. Ev cihê rehetkirin û qenckirinê li herêma Värmlandê dimîne. Skagersbrunn wek cîhekî bi xweşîkbûna xwe ya şahane ve jî hatiye nasîn. Mîrza Seîd di nav daristanên Swêdê de pir gerên kurt pêk anîne û van geran gelek alîkarîya wî kiriye bona hêdî hêdî bê ser xwe û silamet bibe.

Çawa me li jor jî nivîstî Mîrza Seîd carekê jî çûye li herêma bi navê Dalarna li wir li bajarê Malungê maye. Di sala 2017an de di rojnameyêke swêdî ya mezin *Göteborgs Posten* de di derbarê tîma futbolê ya kurd *Dalkurd* de nivîseke dirêj hate weşandin ku qala serfirazîyên tîmê dike. Tiştê herî balkêş nivîs dîroka swêdî bi dîroka tîma kurd ya futbolê Dal-

33 John Hultvall, *Mission och vision i Orienten*, rûp.117.

34 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Doktor Sait*, rûp.74.

35 Jay M Rasooli & Cady H Allen, *Doktor Sait*, rûp.76.

kurd û hatina Mîrza Seîd kurdê yekem li Swêdê re girêdide. Nivîskar Joel Tivemo dîyar dike ku ev tîma futbolê di sala 2004an de li herêma Dalarna li bajarê Borlänge yê saz bûye. Di cîhekî de ew xwendevanan dibe demeke din, xwe dirêjî kurahîya dîrokê dike, dûh û îro têkildar dike û bi hev ra girêdide. Nivîskar di destpêka nivîsa xwe de serfiraziyên tîma kurd dişibîne wê tekoşîna qralê swêdî yê navdar Gustav Vasa ku di sedsala 16an de li herêma Dalarna li hemberî Danîmarkayê serî hildaye û Swêd kiriye welatekî serbixwe. Paşê nivîskar gotinê tîne ser vê “tîma bêwelat” tîma kurd ku li eynî herêmê saz bûye û niha dixwaze “Swêdê bi dest bixe”, wek Gustav Vasa bike welatê xwe. Tiştê herî balkêş di orta nivîsê de qutîyek jî vebûye ku di derbarê kurdên Swêdê de çend agahiyên piçûk tê da cih girtine. Yek ji wan agahîyan dîyar dike wekî kurdê pêşîn ku hatiye Swêdê kesekî bi navê Mîrza Seîd e ku bi belge hatiye îspatkirin.³⁶ Lê belê haya nivîskar Joel Tivemo ji rastîyeke dîrokî çenebûye! Divê em li vir careke din dubare bikin ku wek me li jorê jî got Mîrza Seîd hê berî sed salî hatiye wê herêma bi navê Dalarna ku Joel Tivemo qala wê dike. Mîrov dibîne ku herêma Gustav Vasa serî lê hildaye û Dalkurd lê saz bûye hê berî 126 salan ji kurdê pêşîn ku hatiye Swêdê ango Mîrza Seîd re deriyê xwe vekiriyê û jê re mêvandarî kiriye!

Mîrza Seîd di dawîyê de navê xwe di dîroka kurdên Swêdê de jî dinivîse. Îro wek kurdê ku yekem car hatiye Swêdê tê nasîn. Niha em êdî dikarin ji-yana wan her pênc kurdên ku cara pêşîn hatine Swêdê di çavkanîyên nivîskî bi rehetî bişopînin: Mîrza Seîd (1893), Şerîf Paşa (1898)³⁷, Leyla Bedirxan (1925)³⁸, Silêmanê Kurd (1929)³⁹ û Selahaddîn Rastgeldî (1947).⁴⁰

36 Joel Tivemo, Dalkurd-Ett lag utan land, *Göteborgs Posten*, 1/7 2017. Lê pir mixabin di vê nivîsê de sala hatina Swêdê ya Mîrza Seîd li şûna sala 1893, bi şaşî ”1913” hatiye nîşandayîn.

37 Rohat Alakom, General Şerîf Paşa li Stockholmê, *Nûdem*, nr 16/1995, rûp.13-26.

38 Rohat Alakom, Leyla Bedirxan li Stockholmê, di pirtûka: Rohat Alakom, *Dîroka Kurdistanê di Çapemenîya Swêdî de*, Apec, 2016, rûp.251-260. Herwiha vê çavkanîya tirkî binêre: Leyla Bedirhan Stockholm’da (1925), *Toplumsal Tarih*, nr 259/2015, rûp.86-88.

39 Rohat Alakom, *Silêmanê Kurd li Swêdê*, Apec, 2019.

40 Rohat Alakom, *Selahaddîn Rastgeldî*, Apec, 2016.

Şopên dema xatirxwastinê - VIII -

Nuhê Hecî Malê Herşîd

Hevgirtin (2)

Memo di ber Simo bûwû endamê rêxistina veşartî ya bi navê Hevgirtin. Lê bi rû da, endam û alîgirên Hevgirtinê kar û xebatên xwe di komeleke alenî da jî dimeşandin. Wê civîn li ser mijara sosyalizmê, mafê çarenûsî yê miletan, dirok û edebîyata kurdan û kurs bo hêvisîna zimanê kurdî çêdikirin. Wê di destpêkê da zêdetir berhemên kurdên Yekîtîya Sovyetê bi taybetî yên folklorî diweşand û belav dikir. Endam û alîgirên Hevgirtinê bi van berhemên kurdî şa û serbilind dibûn û ew li nav xebatkar û xwendevanên kurd belav dikirin.

Simo û Memo ji mala dêûbavan da bi kurmançî dizanîn yanê bi kurmançî deng dikirin. Lê gava ku wan di saye kursa zimanê kurmançî da xwandin û nivîsandina kurmançî êvisîn ew pê pir şa bûn, devê şorê ye, pê bi ewra diketin. Gava ku wan guh didan ser şîrîtên/kasetên

bi kurdî yên ku kurdên Sovyetê yên şîrhelal ji Hevgirtinê ra şandî, ew pê mest dibûn.

Simo û Memo jî ji husûrizê xwe da tevlê karên sîyasî û rêxistinî dibûn. Hevgirtin alîgira sistema Yekîtîya Sovyetan bû. Ji ber ve jî, ew bi rêxistin û komeleyên din bi taybetî yên maoyîst, kevneperest û tirkperest û alîgirên wan va di nav mineqêşeyên îdolojîk yên hîşk da bûn, carcaran ji şerê hevûdu dikirin. Li ba piraniyeke mezin ji rêxistinên tirkan Hevgirtin û endamê wê netewperest û separatist bûn.

Memo û Simo bi hev ra di odeyeke piçûk da wekî kirêdar diman. Her yekî ji wan hêleke/qunceki odeya ku ew lê diman ji xwe ra rêxistibû. Li navberê jî maseyeke piçûk û du sendaliye hebûn. Li quncikê çepê yê dawîya odeyê dezgehê mutbaxê hatibû bi cîhkirin. Pir caran ew li ser nivînên xwe jî rûdiniştin û diketin nav hoşsohbetan.

Simo xeleya sipîbelek, yadîgara dayika xwe, bi diwarê hêla xwe da kiribû. Bi xeleyê diwar dişibî diwarên Birca Belek ya li warê Bedirxanîyan, Cizira Botan û cihê gorna evîna Mem û Zînê ya ku bi destê neyaran herimî û neçûbû sêrî.

Roja ku Simo sipîbelek bi dîwêr da kiribû, wî û Memo bîstekê li ser evîna Mem û Zînê û dîlketîbûna keç û xortan, zehmetî û wêrekîyên wê yên li gundê wan û serbestîya li

Almanyayê ya derbarê vê mijarê da, sohbet kiribûn. Her ku mêvanek dihat mala wan û xele sipîbelek bi ber çavên wî diket, dîsa ev dibû mijara sohbetan.

Memo û Simo, her du jî nezewicî bûn. Ew ê ji tengî û hûkimê malbat û mezinen xwe dûr, bi serî xwe û serbest bûn. Wan jî serbestîya li Almanyayê îstifade dikirin û bi keçikên hemsalên xwe ra jî hevaltî dikirin, dostên wan hebûn.



Xerîbî

Bêrîvan Keskîn

Li vir jiyan heyamek sar û çilmisiye.
 Mîna dara bê sî,
 Mîna barana bê bîhnê emr.
 Li vir bihar payîzê dibêhnin
 Axa biyanî tovên me kuştin
 Aşê me nagere êdî.
 Rondikên me her rondik in
 Lê êşên me aş nakin êdî
 Tilsima girî bi mirina çareya dawî re rijiya
 Dilê min hêlîna kovanan
 Dilê min agirpija êşan
 Zimanê min nagere bêjim
 „bi xatirê te zimano“.

Serketin azadî ye

Yıldız Karagöz

Di berbanga sibê de ketime rê. Demeka dirêj e min rêwîtiya trêne nekirîyê. Min çiqes bêrî jî kirîye. Kelecana min mezin e, di ber sîngê min de teyreka piçûk heyê! Ji ku derê hatiye nizamim, mîna nîvane-ka Xwedê. Di guhê min de, melodîyek ji dengê Şêvînê: “bejnê, bejnê lê lê bejnê ...” biletê min bêsinor e, baterîya telefona min bisînor e. Bi baterîya cem min e heyî, baterîyê telefona xwe dadigirime.

Yekem rawestgeha min kantona Zûrichê ye. Ez dikevim nav avahîyeka fermî ya bi rengê gewr. Di hebûna xwe de min qet ji rengê gewr, însanên gewr, avahîyên gewr, tiştên gewr, kincên berê yên gewr hez nekir. Her çiqes ew tiştên bi rengî gewr rêzdarîyê bînin berçavan jî, rêzgirtinîya xwe hebe jî, lê belê ez tim lê ditirsim. Min kir nekir, xwe ji bela hîsên wî rengî xelas nekir.

Bi halekî sist, bêzar, dilnizmî min xwe bi zimanê fransî ji memûrê sekreter re da nasandin. Û dûre ez çûm cîhê ku ji min re destnîşan ki-

rin û rûniştim. Hîn deh deqîqên randevûya min hene, ez li vir sekinîm ku ez pêşnûme bikim. Çend deqîqan piştî min, jineka din xwe li sekreterê da nasandin û ew jî hat wek min rûnişt. Ji saat 08:30 de, ne deqîqek zû, ne jî deqîqek dereng, ez û jina din birin odeya hevpeyvînê. Piştî hevpeyvînê, ez fêr bûm ku jina Swîsrî wek wergêr hatiye anîn ku guftûgoyên di navbera min û kesê bi rengê gewr, ji fransî wergerîne almanî. Lêbelê, min ji wan, ji bo vê hevpeyvînê tişteki ûsa nexwastibû. Lê divê were, bawerim ji ber ku min di xeberdayînên xwe yên bi telefonê û nîqaşên xwe yên nivîskî yên berê de fransî bersiv dayîne.

Swîsre çi welatekî cupcûda û taybetmendîyên xwe hene. Dema te ji derve de lê mêze kir yek e. Di hundirê xwe de xudanê bîst û şeş dewlet, ji bîst û şeş dewletan pirtir al û çar zimanên xwe yên fermî hene. Him di hundirê xwe de ji hev ra bîyanî ne, him mîna zarokên ji dayik û bavekî bi hev ra bîst û şeş birayên serbixwe ne. Û her bira bi

hebûna xwe azad, serbest û her yek bi xwe otorîte ye. Bajarê biçûk î ku ez tê da dijîm bilem du zimanên xwe yên fermî hene. Ji ber ku zimanê fermî yê Zurichê tenê bi Elmanî ye, ew kesê bi rengê gewr ku ez hatim ba, bi xwezayî wergêr anîyê ji bo pirsgrêka zimên. Difikirim; „Lêbelê em, ji ber tirsê parçebûna welatê xwe zimanê gelekî ji çil milyonî zedetir qedexe bikin, heta zimanê wan yê biçûk dibirin û davêjin! Xelk diçe hîvê, em hîn ji digevizin peya!“

Bi bextewarî, hevpeyvîn ji hêvîyên min erênîtir derbas bû. Ez bi jina swîsrî ya zimanzan û kesê ku bi rengê gewr re destên xwe dihejînim û ji avahîya gewr derdikevime. Ew teyrê min a dawetnekirî ku sibêhê ketibû singê min, dixwest ku bifire û bifire, bi hêzekê pir hestîyê singê min bişkêne. Min rê da ku teyra min a biçûk bifire. Û dûre ji ez bedenê xwe li dû teyrê xwe dihêlim. Tu dibêjî qey ez nameşim, difirim. Bi teyrê re firîn bûye sembola azadîyê. Ma wan hîsên ku di hundirê min de heyî ji ber ku ez bi serkeftî di derîyê avahîya gewr derketim çêbûn? Rêya azadîyê di serketina re derbas dibe? Bi rastî! Azadî çi ye? Helbet herkes azadîyê cûda tarîf dike. Wê demê, di

wê hingavê de min got: «Serketin Azadî ye». Erê! Erê! Serketin azadî ye, azadî serfirazî ye.

Teyra min bêsebir e. Ez berê xwe didim rêyan, rêyên dirêj. Min berê xwe da bajarê Wintherthurê, berve hevala xwe ya ku min demeka dirêj ew nedîtîye. Divê mirov, dost, heval û hezkirên xwe hebin. Car carinan divê cîh hebin ku meriv teyra di singê xwe de difire û dernakeve, berde. Şîlanê li ber pencereya aşxanê dest li min ba dikiir. Berîya ku ez bikaribim bigihîjim, bîhnên xwarinên herêma em jê hatibûn, kolan dorpêç kirine. Gava ku ez gehestim mala Şîlanê, di derî de bîhnên nanbirîyê sîrkirî dihat. Şîlan mîna polenên kulîlka ji ber bayê ciwanbûna xwe ketibû rê û bajar bi bajar, welat bi welat, li çiya û banîya gerîyabû, cîhê çûyî ji wek gulekê carek din şîn bûbû. Yê ku bîhna wan vedibin behsa tiştan dikin ku li dor wan diqewimin, ji herkesî re dibe dilxwaşkarek, ji bo her tengasîyan dibe çare. Min ewqas bêrîya wê kiriye ku min ew xist hembêza xwe û bîhna wê hilna. Wê demê ez ketim nav hemû rengên herêma em jê hatibûn.

Meriv ji sohbeta Şîlanê têr naba. Me ji zarokatîyê de dest pê kir, ji

bajarê me Konyayê, ji gundên me bigire heta rêwîtiya me ya Avrupayê anî ziman û nirxand. Tabûyên ku wek mîna kostekê li lingên me hatî pêçandin bigire, heta çanda me ya dewlemend û dîrokî ku li ber dest û çavên me wenda dibe û li ber mirin û tunebûnê ye, anî ziman. Ji bilî van jî em bê kişandina guhê wêje, huner û sîyasetê jî nesekinin û me ew jî anîn zimên.

Dîsa jî min qet nedixwast rabim herim, di heman demê de, ez li benda kesên ji Norwêç û Danîmerkayê werin bûm. Tevî vê yekê ez naxwazim heta ji hevaltî û dostaniya Şîlanê têr bim û derkevim rê. Dema berê bûya ji ber ku mêvanên min ê werine, min a niha li malê derî û pencere an jî xali û gelt pakij bikirana. Yek jî li aşxanê bi şeq û teqa biroş, kevçî û batikan re mijûl bibiyama.

Berê yek jî xwazginciyên keçikan hebûn...off! Ew çi zulm bû! Keçikên belangaz ku zarokatîya wan ji dest hatîbû girtin, ji bo kesên ku wan wek kole biecibînin xizmeta belavkirina qehwê gerege baş bikirana. Li dawîya pêşkeşkirina qehwê bi şunda, ser da jî pakijîya keçikên ji bo lawên xwe yên asîlzade bixwa-

zin kontrol dikirin! Ji yên kêlekên xalî û geltan, doralîyên penceran, li ser mobîlyên malê de toz û gemar mêze dikirin re çi bêjî... Ma hîn ji keçên ku bi wan adetên xedartir radibin hene? Na! Na, divê tunebin. Baş e! Wê gavê, gelek keçên ew rezîlîyên tînin kirin baş bibînin û cil û bergên xwe yên xwaşik li xwe kin, xwe çêkin û nazan jî bikin!

Di rewşên ûsa de, ez a bi darê zorê be jî çiqas hirs bûyama. Lêbelê ez bi reaksiyonên ku li hemberî min dane rast bûm. Ji ber ku di wê demê de, ji hêla kesek normal ve nedihat hesibandin, carinan min xwe jî rexne dikir. Ji ber ku dema herkesî ew pergala û tiştên dihatin çekirin pejiwandibûn, tenê ji bo min xelet bûn. Ew jî ji bo min dibû pîrs û min bi xwe re şer dikir. Dîsa jî min nikarîbû fahm bikim çima ez ûsa dikim. Ez niha difikirim, ew serhildan û hemberderketina min a ji bo êrişên li ser mafên min, azadîya min bûne. Dema ku ew êrişên ji bo maf û azadîyên mirov dibûn, min nedikanî xwe kontrol bikira. Wê demê da jî çawa ez li hemberî wan şaşıtiyan derdiketime aniha hîn baş fahm dikim.

Siyarên deşta Anatolîyê

Xidir Uso

Siyarên deşta Anatolîyê, roman-ek di derbarê kurdên li Anatolîya xwecî ne, ji alî Muzaffer Özgür ve hatîye nivîsandin.

Muzaffer Özgür bi hinek hevalên xwe ve, ev bîst sal in ku, di derbarê kurdên Anatolîyayê de kovara bi navê Bîrnebûnê diweşînin. Ev kovar jî bi her alî di derbarê kurdên Anatolîyayê de aghdarîyên girîng dide me.

Helbet di derbarê dîroka nuh û kevin ya kurdên Anatolîyayê da, pîranîya kurdan ne aghdar in. Qet nebe, ji bo demeke dîrokî, ev pirtûk aghdarîyekê dide me.

Helbet nivîskarê hêja Muzaffer Özgür ev pirtûk ji serpehatîyên bav û papîrên xwe, ji qewimandinên civata kurdên Anatolîyayê pêkhatî, berhev kiriye.

Gava meriv vê pirtûkê dixwîne, meriv nahizire ku behsa civatek kurd a li welatekî bîyanî dike, meriv divê qey behsa civatek li herêmeke Kurdistanê dike.

Pirtûk mîna ku di pêşgotina wê de jî tê diyarkirin, bi zaravê kur-

mancî, bi devoka wê herêmê hatîye nivîsandin. Loma hin gotin hatine kinkirin û guhertin, hin kîteyên gotina berevacî bûne û hin gotinên biyanî tevlê bûne. Hin gotinên êdî li Kurdistanê civat bi kar nayne, yên resen kurdî jî hatîne karanîn. Wek: dastandin (rawestandin), îşmar (işaret), hevşo (gov, gom), koçerî (zozan) û wekî din...

Mîna hin devokên kurdî, di devoka kurmancîya Anatolîya Navîn de jî, hin gotin ya tîkî kinkirin yan jî forma xwe diguherin. Mîna siwar bûye siyar; seba yan bila bûye ma; çandin bûye çinandin; pîvaz bûye pîzav; hejmar bûye dêmjâr/êmcar; biraştin bûye bijartin; dahol bûye dol; kilandin bûye kuvandin; hîkaye yan hikayet bûye hekat; zuha bûye ziya; histirî bûye sirî. Xerman: bênder; qoş: gêre; lihêf: orxan; solix: bêhn; merlix: meriv/lêzim; serîn: hênîk.

Lê ji xeynî çend gotinên cuda, pirtûk bi kurmancîyek ku her devoka kurmancî têde bigehîje hatîye nivîsandin.

Pirtûk, bi sêwirandina erdnîgarî û rewşa pîncar û heywanên deşta

Anatolîya Navîn ku kurd lê bi cih û war bûne destpêdike. Bahsa jîyana gel a aborî, civatî û çandî dike. Gelê kurd ku li wir bi cih û war bûye, ji kîjan herêman çûne, ji kîjan eşîret, ber, malbat û bavikan hatine, li ku gund avakirine nivîsandîye. Behsa zordarî û xwîkîti, serhildan kuştin û koçberkirinên dewleta Osmanî dike.

Li gor nivîskar, hemû kurdên Anatolîyayê, bi darê zorê nehatine; hin malbat jî ji ber sebebên cuda-reng mîna ji bo çêra pez yan ji ber nakokîyên civatî hatine, li wir bi cih bûne.

Şer, kuştin, dijmintî û pirsgerêk û nakokîyên navbêna êl û eşîrên kurdan de, li vir jî dem dem xwe rêdide. Têkilî, orf û edetên civata kurd bi gelek awayî dîyar dike.

Nivîskar, di pirtûka xwe de, bi hestên rastgoyê civata kurd, rewşa vê civatê ya siyasî jî ronî dike û disêwirîne. Piştî avabûna Komara Tirk, bi înkara hebûna gelê kurd û qedexekirina ziman, dîrok, çand û hemû rûmetên netewa kurd, ew jî li Anatolîyayê para xwe ji wê înkâr, qedexe, tade û zordariyê wêrdigirin!

Wek civatek ji maf û azadiya xwe ya demokratîk bêpar maye, her çiqas nikare serî hilde jî guhdarî Kurdistanê ne û dixwazin bi şeweyekî alîkarîya



birayên xwe yên serhildêr bikin.

Dewleta mêtinkar, li herêma Anatolîya Navîn jî li hember revok û mahkûmên kurd bi xayintî tevdi-gere, ji bo otorîteya xwe serî li her qulp û hîleyê dide! Loma pirtûk, bi drama darvekirina lehengên romanê, şîn û negihîştina miradan bi dawî tê.

Ev pirtûk di warê dîrok, çand û jîyana civata kurdên Anatolîya Navîn de belgeyek bêhempa ye. Gava meriv dest bi xwendina vê pirtûkê dike, heta ku neqedîne, meriv nax-waze ji dest xwe berde! Hêja ye ku her kurdek vê pirtûkê bixwîne!

Çend gotin

Berhevkar: Seyfi Dogan

1. Salta(salte): curesaqoyekî bêbişkîk û qulpok ku milên wê jî laporî ne. Kinceka jina ye
2. Pišta terebusê: pišta ser kincan ya jina ye
3. Kum: şewqe
4. Kolbax (kolbagi): Ji tirkî ketiye nav kurdi. Jin li pîyê xwe dipêçin
5. Kîyû: gava pez dikeve dûv hev û yek yek rêz dibin û serî xwe dikan bin sihe yê ber xwe
6. Örk (Wêrk): Hesine/darê (kuteg) ku dikutine herde û pê heywan tên girêdayîn.
7. Hefser (hevsar): hesp yan ker pê têt zeftkirin û girêdan.
8. Dallikî: dema kûçik tene qizanê
9. Zayîn: ji bo heywana tê gotin.
10. Neban: dayika ku nexwazê bimijîne (ji bo heywana)
11. Paşkêş: pezê ku li paşîyê dimîne.
12. Xam: pezê ku carê avil bizê.
13. Bijajtîr: pezê ku cara duyêmin bizê
14. Berdîr: pezê ku cara siftê warê bêrên
15. Fodil: xwaşîk, cazîbedar
16. Saklavî: nexweşîyake hespan
17. Bitirî: her tiştî têr xwarî
18. Zaxdayî: ji bo kûçikên ki baş hatîyê xudîkirin.
19. Arik: zaif
20. Helpugî: Nexweşîyake pisikan
21. Dudil: hevnegirtî, bêqerar
22. Vedigevze: di navda ajni kirin û lîstik
23. Vegetî: ters cerx bûye
24. Ragerîn: bi hers bûn
25. Vakurinî: bi hemdî xwe avandin
26. Gij: bala (Birbelav) bûn
27. Gumara: budala
28. Fîspa gemil: tembel
29. Cerbandîn: pastorîze kirin
30. Perrov:
31. Kinov: benê ji hirîyê.
32. Ezî xwerbilim: nefes teng im
33. Deşt: erde dûz, ova

34. Qereçikinî: rivîyê zik reşbûyî.
35. Kakirci: borîya xwarinê
36. Rivîyê surik:
37. Deq: nuqte reş
38. Reşmiz: mîya ku bi mîza xwe ranê xwe reş kirîye
39. Tolik: xanîyê biçûk î ku ji bo şivanan tê bikaranîn
40. Lod: tinasa ka an ji gîya.
41. Cêc: koma cê û genim û hwd.
42. Nal: cîyê kort
43. Qavor: korta di navberê du cîyan da
44. Qiras û derpê
45. Hişgamiz: haqê şivênî serî pezekê
46. Enîgî: bermayî ya ku ji ber gûr mayî ye
47. Hişkaco: çoyê zîva
48. Pevr: heft stêrk
49. Çik sayî: ezmanê bê ewr(bi şev)
50. Avrovî: ezmanê bi ewr
51. Koka-kok: kevirê kort
52. Curn: korta ku av lê kom dibe
53. Kafkon(kevkonî): ji hirîyê çêdikin, ji bo ku kevira bevêjin
54. Bizbênd: benê ku li fêzê davên stuyê pezekê ji bo ku şivên hişyar bike
55. Zoxale: çoyê şivên î ji darê kondil
56. Tengî: qeyîşa semerî kerê
57. Hengur: şeverêş
58. Berbang: devdevê sibê.
59. Gureh: kucikê ku gur kuştine û dikujê
60. Manker: kera mêh
61. Cîrî: nanê şivên î ku dor çax dibe
62. Şevin: kerîyê pez ji bo ku biçerînin bi şev ji fêzê rakirine
63. Kel: pezê bi stru
64. Kur: pezê ku ji zayînê da guhên xwe qut.
65. Toll: şîrî xwe hendik
66. Şîrû: şîrî, yê ku şîrê xwe pir
67. Kav: rengê gewr
68. Kotreş: pezê ku serî xwe reş.

69. Fêz: ciyên ku pêz bi şev lê mexal dikan.
70. Hafşo: ciyên ku zivistanê pez lê xwedî dikan.
71. Qolût: koza berxan. Erd dikolan û koz ava dikirin.
72. Xemilî: xwe çêkirin
73. Marosî: ji bo salên kuçikan tê bi karanîn.
74. Tormik: cêleyê hêştiran
75. Gisek: karrê dusalî
76. Karr: cêleyên bizinan
77. Qert: bisal, biumir
78. Mayis: rixa pêz a biharê.
79. Pişkûl: rixa pêz a wek qilot
80. Ginci: pîşîyê ku bi binê dûvê pêz de hişk dibe
81. Dagirtin: amade kirin
82. Persikeştî: qurbanê qedarê
83. Sersî: goştê ku bihn ketîyê
84. Civ: herdê kort
85. Azcî: ziyaretçiyên ku terin malê bi yas
86. Berbucî: koma ku tere henê
87. Xwazgincî: koma ku terin mala dê û bavê keçikê ji bo xwestinê
88. Çorefan: ev kesên ku pir deng dikan
89. Dest reîsan: nişan kirin
90. Tewrende: xwarina xweş
91. Rela bûkê/rihala bûkê: cîzê bûkê
92. Resmal: xeleta ku li malê dê û bavan didin bûkê
93. Bapusk: bayê bi xortumî biçûk
94. Kozkirin: demeka berxan piştî dankirinê ji dayika vedidin
95. Dê û dot: merlixî
96. Malhile: kur fikirin
97. Bilezûbez: ecele
98. Surecan: nankor (zem kirin)
99. Ji wêskada: ji nişka ve
100. Qêwat: îftera

Colo -1

Berî ku di ser susê re derbas be û xwe bavêje Text, Colo xwast bîstekê li ew cîhê ku newal bi dawî dibe, bêhna xwe bigre - pir westiya û pir jî tirsîyabû. Di cîh de bi desta kete ser çokan, du cara kuxîn pê ket. Bi kuxînê re giliz bi devî Colo ket û giliz bi ser meresê wî yê rastê de herikî. Çav di ser çokan re li derling û goreyên tijî xurnîg û di wir re jî li ser sokyoyên wî ketin û bîstekê li wir man. Divê berê bêhn vebida. Dest, enîşk û çokên wî servahatî bûn, ji cênigê xwîn diçû. Destê xwe yê qilêr avête cêniga xwe û xwîna tê geriyayî bir di şalê xwe da. Wekî ku bê haya wî jê hebe „Tu qulê heşê xwe nim. Serê çî li min geriya bû? Ji xwe ra bi te kenîn, te jî ji wana bawer kir. Kerî ji kerawo!” ji devê wî derketin û mîna kalekî hêdî hêdî piştî xwe de dîwarê pirrê, ningên xwe dirêj kirin û avêtine ser hev.

Çavên wî hema çûne ser Îna Heselmên ku ew berê bîstekê wekî ku bi cina ketibe jê revîyabû. Di-hat texmînkirin ku şikeft ji kevirê gewr î nerm ji alîyê mesîhîyên yekem va hatibû kolandin. Mesîhîyan

İhsan Türkmen

ji ber tada bîzansîyan xwe li wir weşartîbûn, xwe spartîbûn çiyayên destpêka deşta Konyayê. Şikeft bi sê derîyan bû: Yê yekemîn ji du odayên bi teqên biçûk pêk dihat û hundirê wê ronî bû. Ya diduya nîvbinerdî û pir mezin bû. Wekî gomekê bû û teqeke biçûk di astêr de hebû. Ya sisêya pirodeyî bû. Kesî nedizanî ka çend odayên wê hene. Hinek cîhên wê hilweşîbûn, li hin dera jî kort hatibûn kolandinê. Xezînegêran bawer dikir ku di şikeftê de zêr hene.

Bi ro nîvra dihatin hundirê şikeftan dikolîn û hinek caran jî bi dînamîtê didan teqandin. Dîwar qul kiribû û ode û xezneyên veşartî derxistîbûn holê. Ev şikeftên ku hezar salî ji her cure însan û heywanan re bûbû star, ji devrûyê çend xeyalperestan de, li ber hilweşîyînê bûn. Hilweşandin, teqandin, kolandin pê nedikir, bi tîpên mezin navên xwe dinivîsîn, tu yê bêjî qey ew ne xirabker, lê avaker in.

Di nava şikefta mezin de, meriv dikarîbû ji odayekê derbasî odayeke din be. Di hinek odeyan de qulên mezin di astêr de hebûn. Ew qulana jî bi serî xwe odayên fireh bûn.

Ew alî ji du şikeftan pek dihat ku bi quleke girêdayî hevdu bûn. Daku meriv xwe biavêje aliyê din î şikeftê, divê meriv di vê qula teng re derbasbûya. Ew qul nêzikî pênc metre dirêj û nîv metre jî fireh bû. Divê meriv tê de xwe bi xwêr re bikşanda. Li aliyê din î qulê odeyeke pir fireh hebû û tam di navê de jî argûneke biçûk. Li seranserê wê cîhê rûniştinê hebûn, wekî odeyeke civînê bû. Di koşeyên wê de xezne hebûn, hinek mezin, hinek biçûk bûn. Lê yek ji wana ji yê din cûdatir bû. Di quncê herî tarî yê odeyê de bû. Metreyekê fireh nêzikî deh metreyan kur bû -bi xof bû, dengvedan, heta bêhna meriva dibû deh qat, dihat û li meriva vedigerîya.

Colo berê wê jî ew bîra dîtibû, ew ne cara yekê bû ku dikete vê şikeftê. Meriv berê bi lambeyên qazê, yan jî lokisan dihat diketin şikeftan. Lokis û lambên qazê hinek cara ji xwebera vedimirîn. Wê carê hazîrîya Colo tam bû. Lambeya wî ya desta pir baş bû. Lambe çarpîlî bû xwe baş top fikir, bi gotina wî heta hîvê dida. Colo lambe girt da dîwêr ronahîya wê da ortê top kir û da binê bîrê. Bi dayînê lambê a binê bîrê ve, şîrpinek bi gepira Colo ket. Colo vecînîqî û qîrînîyek bi

ser ket. Ji tîrsa lamba destê wî kete bîrê û vemirî. “Way lale, way lale!” bi wî qîrînîyê çû bi serî li dîwêr ket. Colo ji qîrînîya xwe, ji dengê bilind tirsîyabû, ji ber ku her deng, deh cara di nava şikeftê de deng vedida.

Wî ji tîrsa re piştî xwe de dîwêr û du sê cara bêhneke kur girt “Na, ez ê di vir de bimrim, îmkan tune ku ez xilas bim. Ez ê di vê tarîya weke dulmat de can bidim.” Tayê bi laşê wî girtibû. Dest û ningên xwe bê hemdî xwe ba dikirin -tu yê bêjî dixwaze li yekî bixe. Bi ser wê ve dengê ji jor hat û hema hate birîn. Dengêkî nizm ji Colo derket: „Tu kî yî?” Colo xwe bi dîwêr de nuskand, bêhna xwe girt, guhên xwe bel kirin. Ne dengêk, ne jî qeratîyek hebû. Colo dikarîbû bireve, li gor hesabê wî, qul ne li dûrê bû, lê nedîwêrîya. Lê ew tiştî du qulê de be, yan jî ji paş va ningî wî bigre. Lê li wir sekinîna wî jî bi kêrî tiştêkî nedihat. Bi gavên biçûk berve qulê diçû. Gava li gor hesabê xwe nêzikî qulê bû, ningê xwe di dîwêr kutan daku bizanibe qul li ku ye. Nêdît. Du gavê din avêtin û hênîkayîya bayê qulê hîs kir. Li ser çoka runîşt, destê xwe da qulê û fikirî: Li ser serî ketina qulê nabe. Lê ew tişt di ningî wî re bigre û berneda? Baştir e ku ew



Herçiqes niha hinek bi navê Îna Mihî Usiv dinasin jî, navê xwe yê kevn Îna Heselmên e.

li ser qunê têkeve qulê. Kete qulê û
bi carekê re mîna marekî bi lez xwe
avête aliyê qulê yê din. Dest, çok û
enîşkên wî birîndar bûbûn, lê ne

xema wî bû. Rabû ser xwe û berve
derîyê biçûk ku tê re ronahî xûya
dikir, bezîya. Xwe avêta oda mezin
û di wir re odeya biçûk a ber derî.



Hundirê Îna Heselmên

Berî ku ji şikeftê derkeve, ningê wî kete kortê û bi devûrû kete erdê. Mîna cenîyekî xwe top kir û xwe avêt der û heta ku bêhna wî miçiqî, meşiya. Xwadê şikur xilas ji destê wî neyisizî xilas bû. Erê, ew „neyisiz bû“. Di şikeftê de nehate bîra wî, ka ew çî bû? Bi ya wî ne cin bû. Cîna xwe venedîşartin. Ew ê têketiba tonekî heywanekî yan jî însanekî û xwe nîşanî wî bidaya. Cin, dikevin tonî bizinan yan jî pisikan û di şevreşê de didin dû merîya yan jî li ser kulingan govendê dikşînin. Colo baş nedizanî ka xuyê neyisiza çî bûn lê ew bibûya bibûya neyisizek bû. Wekî din çima li gepirî wî bixista û xwe veşartiya.

Colo hê dicirifî, tam nebe jî hê xof li ser bû. Dîsa çavên wî bi şikeftê ketin, lê zû zû serê xwe berve kanîya miçiqî kir ku li jêr şikeftê bû. Meriv ji kanîyê bîstekê berjêr here, digihîje nalekê. Ew nal, Nala Pîrkê ye. Kesî nedizanî bû ku ew nava ji ku tê û Pîrik yeke bi çî halî bû yan jî çima ew hatibû dayînê. Nal ji ber navê xwe bi xof bû. Rê tê re derbas nedibûn. Daku di nav nalê re derbas nebîn, şivana rêya xwe diguherî, peya nêzikî wê nedibûn. Kesekî Pîrik bidiya, ew berê dîn dibû û pir nedajot, dimir. Heval û

cîranê Colo, Kemalê Îbke, xortê ji xwe xweş, bi tehsîl jî di zik nalê û Pîrkê de bû. Bi şev, gava Kemal ji Kozanlîyê vedigeriya gundê xwe, li qirara Nala Pîrkê bi cîna ketibû û bûbû nexweşê çend mehan. Ew mesela hate bîra wî û xofek daket ser, lê ew zû derbas bû. Bê ku xwastibe, ketibû nalê. Colo ne ji nalê û ne jî ji Pîrkê jî ditirsiya. Wî dizanîbû ku Pîrik bi şev derdiket û xwe rayê peyayan, şivanan û siyaran dida. Roj, kêmtir wê di du sê saetan de biçûya ava. Hê wexta wî hebû, lê divê hê biçûya Girî Qocê, ba destbirakê xwe Husîn. Navbera Nala Pîrkê û Girî Qocê bi peyatî rêya saetekê bû, bi gavên şivanan çil deqe.

Colo bi carekê re destê xwe da ser kevirê temelê pîrrê û rabû ser xwe. Xwe dawşand, dest bire cêniga xwe, xwîn nedihat, herweha enîşk çîp û çokên wî jî baş bûn -tenê serva hatibûn û hindik diêşyan. Şalê xwe kişand. Bi kişandina şêl re lê çû ferqê bi xwe de mîz kiribû. Lê nekire xem. Çi hebe ji neyisiza xelas bûbû. Colo ji kortê derket çû kêleka susê û bi lez xwe avête alîyê Text. Berî ku bi rêkeve, careke din bi nîvdilî li paşîya xwe mes kir, paşê piştî xwe da çiya, berê xwe da deştê, berve Girî Qocê kete rê.

Şadiyê dirêsim

Xîzan Şîlan

ez
lehengê destaneke hemdem
yê bargiran im
di dilê gelê xwe de
karwanê rêya azadiya
welatê xwe me
li firtûneyên jankêş
rêwitiyê dikim
û bi gavên lez û bez
ber bi rêya aramiyê ve
dimeşim
dostên sadiq hevrêyên min in
kirasê taristanên mijgirtî
bi tîrêjên hêviyê
vedîçirînim
ji pêşîrên strana Derwêşê Evdî
meya sebirê dinoşim
û di sergêjiya bîranînan de
mest dibim
ramanên heqîqetê
qiblegeha dilê min yên hejar in
kilîda dergehê perestgeha xwe
ji hemû ol û bawerîyan re
vedikim
xweşbînî cewhera derûniya min e
li dor ferîşteyên gunehkar
semahê digerrînim
duayên nimêja min
bi zimanên rengîn in
li heyveroniyê
konê serkeftinê vedigirim
û teşîya şadiyê dirêsim
bafiroka bextewariyê

ber bi keskesora aso ve
difirînim
bi çîra tenêtiya bêhteng
hinavên reşbûyî dibiriqînim
her şev
awaza têlên tembûra melûl
perdeya guhên min
dixemilînin
gulsosinên zozanan
di bişîrînên yara bedew de
dipişkivin
li ber dengê def û zirneyê
agirê dîlana evînê geş dibe
û meydan dilerize
wêneyên çaxên genî
li kefenên darbestên wan
dipêçim
û rengê biharê li dilê xwe
nîgar dikim
li şabûna sibeheke dilpak
ji nav qirêja lepên minafîqan
difilitim
û xwe dispêrim hembêza
tovên qencyê
xirabiya qeşa girtî
li ber peşkên barana xweşikiyê
dihelînim
li şevistanên nîvmirî
keziyên ronahiyê dihûnim
xumxuma çemên zelal
di nalîna hestên xewnên min de
diherikin

Varan

Rûjhat Esîman

P erdey gulneqîşage yê pencîrey textike, le veri va seme dikerî; rake, derige je şewê dwêgîne ew heta sewazû ewkerag mage. Rûjna, nişkew je xewe elistaye û le telefonê xwê ngerî ke saete hatige we nûyane. Balife serrast kird û pîştî xwê daye wê. Cixare û kîfrite elgirt, le veri rûjnageli mirag i pencîra wêxist. Je rû sermey şewe famîleyî xurîn dêkird. Cixarey nîme de naw xwelîdanige ecikand û betanîye je bani xwê erdirand. Elistaye pa ke wiçû veri pencîra. Derigê ewkerage kemî din kirdewe û le der ngerî. Bû xomir je heway şêre dîyataye. Dargeli perxel, rengi welgeli xwê ke sewz wîyin ewgûrandigine zerde, çaqire, swêre û pûrteqaliye. Dîmenê der, çûnde wîneyîki şaheser i Romantîkeli Engliz estiwî. Rûjna, je zarûwitî ew xweşiyê we ey dîyarîgel dîyay. Hate vîriyê ke, wextê lîsa, le

veri pencîrey textike yê pansîyone mûzigeli Farid Farjad gwêdarî dikeraye. Ra eye, demsalê Payîze ra ewî manaxawind wî. De sî mangê ey demsale, kîtiwgeli helwest û romangeli qewî dixwînî. Ne jimargeli rûwelgel ray firê girîng e, ne îj perey kîtiwgel ke hatigin sendin muhîm e. Tiştgeli ke aramî didî wê, le naw ey zendeganîye rîyegeli cenete nîşan dida. Çûnke de kîtiwê “Sîmyavan”e rîvantiyê şwane hestin, le ey kîtiwê zendeganîye îj hewsanigîki dîrij û nexelas i Rûjna hestiwî. Cwanejine, de rûwelgê bîstegîne sênaryoyê xwê ha dinûsî.

Çiye aşgehe ke neştay xwê amade wikerî. Awê çaye naye bani kuçike. Televîzyonê sihî û heft êkrane wêxist ke hebergeli sewazû sêr wikerî. Çewige kemî teng wî ray, rake je xwendekarî ewqas tanist eyre wigirî. Car-car eyane guman dikeraye, welê; pencîrey bûçike yê aşgehe

Têbînîya red.

Di alfabeya kurdî de herfa Û û Ö tuneye. Di şûna Û yê de û di şûna Ö de wê dinivîsin.

Nimûne: çünke= çünke, gö = gwê, şön = şwên

le darê arûge dingeraye. Ra eye, xweşî we ewre dîyay ke we heway temize ew henasig wikîşî. Wexti ke mesay neşta amade diwû, heberîki varandarî hewî le ser televîzyone. Le Rûjawa varanîki xurt divaraye. Verdi mûzîgê lûlikê çaydanige ke tisketiskî ye, dengi xuşexuşê varangel je televîzyone dîyataye. Sewzîyatiyê dêgeli Rûjawa, le bini varane çûnde wînegeli pastoral we hemigi xwê-zayîyi xwê çewi îsangel tîr dikeraye. Esîmane û dîtana nîm-têrikandig wî û tême dîyataye.

Nişkew, awê kulage yê çaydanige pilqaye û Rûjna seri xwê elgerdande layê çaydanige ke awe hatige ser. Cwanejine, arigê kuçike ewmirand û verdi çayê germe hate seri mesa. De seri rûwelgê salnama mangê Eylûle nûstîg wî. Rake rûji Ayîne ye, cwanejine xwestekar nîye ke wiçû derse. Xwendinê beşê Zwan û Edebîyati Englizî kêf didî wê. We taywetî, Rûjna wexti ke otopîse ew rîvantî dikerî, helwestgeli Edebîyati Nûjen i Amerîkan û şîrgeli kwêne yi Shakespeare dixwîn û eyane verdi mûzîgi klasîk xweş diwin. We eynî, şîrgeli zwangelî kirmancî îj ewqas tamxweş diwin verdi gûranîgeli vercegîn.

Je pencîra dengi tikandine dîyataye: varan divarî. Ewrgeli l'esîmane ke zatîm sî wîyin, îcare xwêyan verdan û tike we tike keftine rûzemî. Tême je sedgel kîlometre ewla ew hatiwî girdgeli şêre. Vîriskeyel çûnde çankuşê Thor dengî gewre xiste esîmane û xureyî bilûnd naw sanîyegel gerdî. Rûjna, derigê textike yê pencîra pûşand. Pîştî came ew le şêre dingerî ke mêrikel sawangelî xwêyan ewkirdigin, yekeli ke bî sawan in îj we restandin werî diçin ke cîyeyî girag wîninewe.

Tikeyeli seri came xwêyan diawîtayine serejîr. Germatiyê payîze we xatîrxwestini xwê ew çiye ewla dûna. Cwanejine, car-car le ser ey zendeganîye gumangelî qwêl û dirîj dikeraye ke raçegîngeli bîciwaw witaşî û mana wêyan dî. Xweste ke winemî bin û kemî hewa elgirî. Girdi male girdew kird, gûrwey zimistanîye û eway varanîye îj dêkird û derkeft. Sawanê sîye ewkird û girte bani seri xwê. Rîgel je varane şil û cil wîge. Vergwêçikel naye gwêyel, gûranîyî englizî wêxist: "It's Raining". Pîrçê je hêli serê ew eldişekî, kapşûne ew serige pûşandige. Cadegel, kûçegel, rîgel gerdî, gerdî û gerdî. Le veri nîşangelî trafîke vista ke er-

ewangel elvigirin. Dûya ke rûjnay
sewze wêkeft, elvigirte ûla. Camê
dûkanîk ew le xwê ngerî; rengeli
eway, swêr û kewig e; şwarê qote û
kewşgeli bot mûşê wîgin. Guman
dikeraye ke firêtir wextê payîze û
varandariye rindtir estin. Heta, xwê
çûnde “Dwêtê Varane” diçiraye.
Ey nawe lay firê xweş diyataye.
Çewgelê, je awê varane ew hati-
wîn kirdin; rûyê, j'ewrê esîmane
wî. Dengi xuşexuşi varane, helwes-
tane diway. Pîsigeli rwêki rîgel rake
le bini varane magin, tûkeliyan cil
wîge. Rûjna, desti xwê dirîji pîsigî
çermig kird welê ajale firê tirsinok

wî, nişkew vaye bini tenekey çope.

Dewami rîyey xwê kird. Tikeyel
je nûkeli sawane ew dikefin, vada-
riyî bûçik hest le rû cadegeli. Werî
çiye. Dî ke le seri zemî welgeli zerd
keftig in. Çemayewe ke lêyan baş
wingerî. Rake awê varane dikefi
wêyan, firê rind û paqij diyar di-
kerayin. Le çepe ngerî, firêtir hest,
le raste ngerî, xeylî ye. Girdi Rûjna
piri welgi keftig e, gî'j xweş in ke
hawîşê diyarîyî je wîneyîk e. Cwa-
nejine, henasiğî qwêl kîşaye û dûya
ewpûşandini sawane, rûye girte le
esîmane: hemigi tikeyi varane lay
dikefayin.



Kekê hêja, silav!

Ez çiqas spasî we bikim bo hişyariya we ya di heqê Birnebûnê de wê têr neke. Di pirtûka "Horasan Kûrtleri" de min zêdetir bala xwe dabû ser eşîrên li Xoresanê. Lê ji bo diyarkirina baskên wan eşîran li Kurdistanê û Anadolê, min tenê li pirtûka Cevdet Turkey nihêrî. Piştî hişyariya we li Birnebûnê vegeriyam ku erşîveke ezamet çêbûye.

Min li hemû hejmaran nihêrî û tenê bo mijara Xoresanê min heşt rûpel not girtin. Ji bo karên di jî gellek çavkanî û agahî hebûn, min ew jî wek not danîn.

Di xwendekariya xwe de, li Enqerê, min vê kovarê her didît. Lê nizamim bo çî, di navbera me de valahiyek hebû. Min çend hejmar peyda kirin, lê niha têdigihêmin ku çî ji deşt çûye.

Bi gera bi dirêjahiya 74 hejmaran meriv keda we û dost û hevalên we yên hêja dibîne. Xezîneyek e bo Kurdî û Kurdayetiyê. Mala we her ava be.

*Ez ê bo çapa kurdî hemû notên min girtine bi kar binim. Çapa tirkî, ji ber sere-
raştîkirina Indeksê zehmet e. Dibe ku em careke di Indeksê amade bikin. Lê çapa
4an çû, ez ê bigijînim çapa 5.*

Bimînin di xweşiyê de kek Nûh Ateş. Netewe û zimanê me deyndarê we ne.

Ligel silavan,

Selîm Temo



Jana dil

Pel weşîyan li daristan
Gul çîlmisîn li gulistan
Li dil dîsa zivistan
Li dil jana kurdan

Wenda bû roja li esman
Wenda bû hîva li şevan
Wenda bû şewqa stêrkan
Li dil jana kurdan

Berba bûn pelên payîzan
Tunebû gotinek ji ezîzan
Tunebû kesekî pêzan
Li dil jana kurdan

Li vê derê, li van waran
Tunebû taldeyekî dîwaran
Tunebû hespekî siwaran
Li dil jana kurdan

Şeveke payîzê

Bar kirin çûçikên esman
Pelên darê weşîyan
Gul çîlmisî
Pêlên derya ketin xewê

Îşev bajar bêdeng e
Şev li min dirêj û teng e
Esman tarî û bêreng e
Bes e were dereng e

Îşev dil dîsa şeveder e
Mîna hîva şevê şiyar e
Îşev dil dîsa nobedar e
Îşev dil dîsa evîndar e

Li der stêrkên şevê
Li hundir awirên te
Bi ser min da dibarine
Li vê şeva payîzê

rojê payîzê
yê xwe germ
û dunê me jî ronî dike

bihnê axê
hewa serxwoş kir
lêh bi hemdî xwe diherikî

pelên dawiyê
jî weşîyan
sîh dirêj bûn

ez bi tenê timam
stêrkên dirêjîn
dibin hevalên min

ba dar hêjand
zerdele ketin erdê
kervanên mêrîya suwar bûn

neynika li dîwar
peşî ronî
pişt tarî

mala bi tenê
hîvronî û pisika birçî
hêstirkek kenîya

tarî,
tarî û tarî
bê dengî

Çend peyv û gotinên me - 2 -

Mehtab Îdelî

T

Talez: Ecac (Toz fırtınası)

Tali/î: Şans, bext, talih (Şans, kismet, talih)

Tar: Meger (Meğer)

Taq/Taqe: Pencere, pace (pencere)

Tavnere: Hema (Hemen, aniden)

Teberek: Yadigar, bîranin, diyarî, şabaş (Yadigar, hatıra, hediye)

Telak: Yek (Bir tane, bir tanecik)

Tema: Kanê (Hani)

Temekirin: Qewitî kirin, tembîh kirin (Tembihlemek)

Teng/ê: Hin, hinek (Biraz, birazcık)

Tengil: Awir (Sert ve dik bakış)

Ter(Ter paşî, ter pêşî): Herî (En arkada, en önde)

Tereke: Dewarên mezin (Büyük baş, inek)

Teşîr: Yê ku pîvanê digrê, pîvangir, pîve (Ölçen, biçen)

Tevr: Bitir (Balta)

Tevakirin: Xelas kirin, qedandin (Bitirmek)

Tevîş/î : Razî bûn (Razı olmak/razı olsun)

Teyr: Perperok (Kelebek)

Têbêk: Say ke, qey (Sanki)

Têre: Refîk (Raf)

Ticilîjî: Yê ku li xwarinê digere, çavbirçî (Gözü aç, sürekli yiyecek arayan)

Tivanc 1): Teviz , Vekêşîn (Gerinmek)

Tivanc 2): Sancî, acî, îştîrap, sızî (Kaslar için)

Ton: Tîp, cure, şekil (Tip, şekil)

Toqilme: Gotin, pê ve danîn(mec) (Laf atma, laf dokundurma, laf vurma, gönderme)

Tupek: Pûnc(Bir tutam ot)

Tûr: Bêxabet (Aylak)

u

û

Ûd: Xelat (Hediye, ödül)

Ûlîn/ûlandin: Mûnandin, hûnandin (Saç örmek, ip ve benzeri şeyler örmek)

Ûz: Qurnaz/jêhati (Kurnaz/ usta becerikli)

V

Vedan1: Bijartin, nîşan kirin (Seçmek, belirlemek)

Vedan2: Vedan (Eşelemek, kazmak,deşmek)

Venciqandin: Bizdîn,Tirsîn, jêdûrketin (Ürkme, korkma, uzaklaşma)

Verşêkirin: Veşartin, helanîn (Saklamak, gizlemek)

Vesandin: Sipariş, radî/gazî kirin (Ismarlamak)

Vêsandin 1): Dinlenmek

Vêsandin2): Rehet bûn (Rahatlama, rahatlamak)

VêxistinPêxistin(çira) (Işık yada ateşi yakmak)

Viqas/Vaqes: Ewqas (Bu kadar)

W

Wang/Weng: Weha (Böyle, bu şekil)

X

Xafi: Dedektîf, teqîb (Dedektif, takipçi)

Xagî: Fîz (Kibir, çaka, çalım)

Xagî kirin: Fîz avêtin(Kibirlenmek, çaka _ çalım atmak, hava atmak, burnu havada)

Xanedar: Mêvanperwer (Misafirperver)

Xarkirin: Revîn, bezîn (Koşmak)

Xat/Xet: Kaxiz, perr (Kağıt)

Xere/Xêr e (Te xêr e): Çima (Neden, niye)

Xiş û Xal: Bêhal mayîn (Halsiz kalma, tükenme)

Xûlî bûn: Hêrs bûn, tûre bûn (Sinirlenmek)

Xû-Tebat: Xû- xeyset (Huy, tabiat, karakter)

Xûş bûn: Xij bûn (Kaymak)

Xwas bi me/we/te: Xwezî bi me/we/te (Ne mutlu bize/size/sana)

Xwedê tevîşî te be: Xwedê ji te razi be (Allah senden razı olsun)

Y

Yar: Laşê/Hîz (Vücut, Tulum)

Yarê: Bi raştî, bi cih, eseh (sahi, gerçekten)

Yêga: Dorpî (Törpü)

Yêkinî xwe kirin: Peyandin, li ber rabûn (Yeltenmek)

Yol: Dîyarî, Qedr (Hediye, değer)

Z

Zarêş: Anjîn (Anjin)

Zarik: Tas, sekre (Tas)

Zewar: Kepeka kûçikan, yal (Köpek yalı yapılan malzeme)

Zêm kirin/Zêm ê dikê: Paş de gotin, pirsguhazdin (Dedikodu)

Zibil: Zivîl (Koyun dışkısı ve sidiğinin karışımı ile oluşan sıvı dışkı Kuruduğunda yakacak ve gübre olarak kullanılırdı)

Zinakî bûn: Bêzar bûn (Usanmak)

Zîştanî: Duxaskanî (Loğusalık)

Zûrî: Malik, Malûlk (Solucan)

1) Bejê û biwêjeyên ku li derveyî wateyên xwe yên bingehîn tîn bi kar anîn. (Aynı kelime ve deyimlerin başka anlamlarda kullanılması)

Çortan: Çirik, pilûsk (oluk)

Danandin: Dabinartin (Dikmek;ağaç,bitki,direk vs)

Danandin: 1)indirmek 2)Koymak, kurmak 3)Kısmak (ışığı veya sesi azaltmak)

Gêr bûn: Ketin (Düşmek)

Gêr bûn: Yuvarlanmak

Gurmik: Hesû,heşû (Vatka)

Gurmik: Yumruk bwgurmik lê xîştin: Yumruk vurmak

Kenk: Êş/Êşe marîpişt (Omurilik ağrısı, fıtık)

Kenk: Kepek (Saç kepeği)

Lêdan: Kurtûpişt, galecî (Dedikodu)

Lêdan: Dövmə,vurmak/dayak atma (Wekî lê xîstine me)

Ji xwe xweşe: Rind, nazenin, bikok (Güzel , alımlı, süslü)

Xweş: Güzel (iyi, hoş, lezzetli, tatlı)

Mala xwe avakir: Kêf kirin, şahî kirin (Keyf etmek)

Mala xwe avakir: Evini kurmak, inşa etmek

Neqep: Gimt, girik (Tepe,baş)

Neqep: Geçit, ara, aralık, derbent, boğaz, çit kapısı, çeper kapısı

Qelew: Dewlemend (Zengin)

Qelew: Şişman, kilolu

Şîp: Deqîq û jîr (İşini hızlı yapan, aceleci, becerikli)

Şîp: 1)Akak (su için; ivinti yeri)

2)Akak (eğimi, inişi fala olan yer

3)Çağlayan, çağlar, şelâle

Tivanc: Teviz, vekêşîn (Gerinmek)

Tivanc: sancı, acı, ıstırap, sızı (Kaslar için)

Tûr: Eware, toranî, tortore (Aylak)

Tûr: 1)Sürgün, ince dal

2)Torba, küçük omuz çantası

3)Tur, dolaşmak

2) Bêje û biwêjeyên ku tîpek an jî tîpên wan guherîne. (Anlamı aynı olupta harfleri farklılaşmış kelime ve deyimler)

Bajar: Bazar (Yıllık, yada nişan ve düğünler için yapılan toplu kılık kıyafet alışverişi)

Bîlîv/Bîvil: Fırn, fırnik (Burun delikleri)

Bêvil: (Burun)

Dun/ Don: (iç yağı, kuyruk yağı, makine yağı)

Dûgan/ Düven: Gam, moşen (Düven, döven)

Êvîsin: Hewîsîn (Öğrenmek)

Êvisandin: Hêwisandin (Öğretmek)

Êvşandin: Hêvişandin/gûrez, bi îdare (Kayırma, sakınma, tutumlu)

Firî/Firuh: Firo(Ağız)

Heşarî xwe bûn: Hişyar bûn, ji xwe hesî, bi xwe hat (Kendine gelmek)
Hûnijîn: Hênijîn, pirnijîn (Uyuklama, uykuya dalmak)
Hû bûn: Ho bûn (Öğrenmek, alışmak)
Imayî/ Ama: Korî (Kör)
Îzbend kirin: Veqetandine bizin, kavir û miyên jar (Zayıfları ve irileri birbirinden ayırma)
Îzbandûd: Kocaman, iri yarı
Kûşkûr: Keşkûr (Tezek, kuruyan hayvan mayısı)
Lêblam/Lebalam: Feqet, bi ya min (Fakat ama, kanımca)
Belam lêbêlê
Lêbam: Li ba min (Bana göre)
Li şiv xwin: Bi hev re şiv xwerin (Birlikte yemek yeme)
Loma: Lewma (Dolayısıyla, ötürü, onun için, zira)
Mêjîn/Mîtin: Mijîn, mêhtin (Emmek)
Merdi: Mînder, palas (Minder)
Mizêz: Mîmîzokî, ne razî (Razı olmayan)
Nîvrani: Nebîrani (Aşermek, aş yermek)
Nugin: Nogin (Düve)
Qirnaş: Qirni (Kene, koyun kenesi)
Qizik: Cixiz, heramsîker (Oyun bozan)
Sûhva hatin: Sih/Suh ketin, xeyîdin (Küsmek)
Şehîn: Şihîn (Kışnemek)
Şelmaq: Şeqam, Sîle (Tokat)
Şêling: Şêlî, Şêlî bûn (Bulanık, bulanıklaşma)
Şeqebişeqeyî bûn: Şeqitî (Parça-parça, bölük-bölük olup dağılmak)
Şukirin: Şekirin, şıyan, kanin (Yapabilme, becerebilme)
Şûjî: Jajî (Peynir suyu)
Tali/i: Talîh, şans, bext (Talih, şans, kismet)
Tevr: Bivir (Balta)
Ûlîn/Ûlandin: Mûnandin, hûnandin (Saç örmek, ip ve benzeri şeyler örmek)
Verşêkirin: Veşartin, helanîn (Saklamak, gizlemek)
Vêxistin: Pêxistin(Çıra) (Işık yada ateşi yakmak)
Viqas/Vaqes: Evqas, ev çand (Bu kadar)

Wang/weng: Weha (Böyle, bu şekil)

Xarkirin: Xarîn, revîn, bezîn (Koşmak)

Xwas bi me/we: Xwezi bi me/te (Ne mutlu bize/ size)

Xûş bûn: Xij bûn (Kaymak)

3) Bêjeyên ku li gora kar û tevgerê hatine afirandin

(Yapılan iş ve eyleme göre üretilmiş kelimeler)

Pali/Palî: Palût (İmeceye katılanlar)

Xafi: Dedektîf, teqîb (Dedektif, takipçi)

Xafil girtin: Gafil, aymaz, gafil avlanmak

4) Bêje û biwêjeyên ku ji bêjêyên zimanê erebî an tirkî jî hatine afirandin. (Arapça yada Türkçe kelimelerden üretilmiş kelime ve deyimler)

Açki/î: Ronahî, ronî (Aydınlık)

Gwoz: Çavî, Ode, hucre (Oda, göz)

Çav qirkirin: Çav neqandin (Göz kırpmak)

Li xofa min çû: Ecêb ditîn (Tuhaf geldi, tuhafıma gitti)

Hoflanmak: (Korkmak, irkilmek, irkilmek)

Marşav: Simkot (Maşrapa)

Qêmak: To, twik(Toyê maşt) (Kaymak)

Ûz/ Uz: Qurnaz/Jêhatî (Kurnaz/uşta becerikli, uzman, eli işe yatkın, işini iyi yapan)

Ducarî/dubare

Aqil û fikir

Çiya û banî

Bax û baxçe

Çil û çamir

Bax û boştan

Çîn û çortan

Berf û baran

Dar û bar

Berzaq û berênî

Dar û cira

Bîn – beq

Dar û dariştan

Cîran –mîran

Destû pê

Deşt û rû	Meri û meriştan
Dev û didan	Meş û moz
Dê û dot	Nal û nalça
Dil û xatir	Nav û nicik
Dol û dawet	Paş û pêş
Dol û dûdik	Pili û pirtu
Dol û mol	Pirtu û pal
Fedî û heya	Por-bisk
Feq û fecûr	Qeyd û qamat
Feqîr û fiqare	Qul û qevar
Ga û golik	Raq û rût
Gil û gemar	Reş û belek
Gil û gû	Rezil û rûswa
Giran- giran	Rî û rahmen
Hal û heket	Sal û zeman
Hendik –hendik	Ser û bin
Heyî û tuneî	Şil û şapalî
Hîş û aqil	Şor û gotin
Hûrik û mûrik	Text û tac
Hirtik û pûrtûk	Teq û req
Kal-kal	Tî û birci
Kal û xort	Toz û talaz
Kap kacak	Toz û dûman
Kavir û dar	Xêr û xaşî
Kel û keçel	Xild û xiş
Kevçî û kotik	Xû û tebat
Kinc û kol	Xoş û bêş
Mal û kulfet	Zêr û ziv

Roja ku tu ji min veqetî û te ji vê dinê bar kir û keç û lawên te, cîran û xizmên te tu xistin bin erdê, ez jî li vir, li vî bajarî ketim bin giraniya dilê xwe, bin nefsa xwe. Ketim nav porê xwe, porê min dirêj bû, spî bû, wisa bûbû ku wek ku tu di hundirê min de ristî û tu ji hundirê min derketî der û ez bûbûm tu.

Wisa dayê, wê roja ku tu mirî, ez jî li vir mirim.

Bi sala ne ez ji te dûr bûm, ne li ba te bûm, min careka din tu nedîtî, min destê te maç nekir û careka din tu hembêz nekirî. Ez ne li wir bûm. Ku ez li wir bûma, min ê xwe biavita ser meyîte te û bigîrîma û min ê bigota min jî bibe bi xwe re. Çawa ez ji bedena te hatibûm vê dinê, wisa te ez jî dîsa bi xwe re bibirama.

Lê nexêr, nebû, tu bê min çûyî, ez li vir mam.

Pîştê ku tu çûyî, li vir kes bi ber dilê min ve neçû. Xwîşka min, delalê dilê min wisa got ji min re. Rast bû, kes bi ber dilê min ve neçû.

Ji xwe wê rojê dilê min bi min re bû an na, min jî nedizanî.

Wê şevê ez li vir, di bin siya îşîqê qendîlekê de sêwî mam. Ez bi ser xwe ve barîm, qendîl jî bi ser xwe ve... Em barîn, barîn, barîn û barîn, hetta ku em herdu jî heliyan. Ez ji bîrva çûm, qendîl jî bûbû hêsiyê zelal.

Ez ji te wisa veqetîm, lê nizamim tu ji min bi çî nefsê veqetî? Berê ku tu çavên xwe bigirî û ew careka din qet venabin, çî hebû li ser zimanî te, te yê çî bigota ji min re, nizamim. Ew nezanîn jî kuleka ji min re, kuleka kûr e.


Wisa dayê, ew roja ku te mala xwe xist nav hundirê xwe û tu ji vê dinê çûyî, em çend kes bi dû te ve sêwî man. Ez li vir û ew li wir.

¹ Bi sedema mirina dêya min li meha îlonê.

Guldesteyek ji edebîyata cîhanê

Ez ji Xelikan im. Jê re Xelikê Dondurme
an jî Xelikê Jêr jî tê gotin. Xelikê Jor re
Qerejdax, Xelikê Qemaran jî heye, bi
tirkî jê re *Yapalı* dibêjin.

Niha bi tirkî ji Xelikan re Golyazi tê
gotin. Yanî em esas Xelikî ne.




Yusuf Kaynak

Min bo çi “Guldestek ji edebîyata cîhanê” nivîsand?

Derê divê bi çend bêje û hevokan
xwe bi xwendewarên Bîrnebûnê û

reya gelemperê bidim naskirin. Ji
zarokîya xwe naxwazim bahs bikim
ji xwe nîfşê nû pir ji wan nizanin
tiştê ku ez jê behs bikim, dirêj ne-
kim ez li biharê di meha gulanê de
di toleke ji qamiş de hatime dinê,
dîya min hê xwaş e, şahîda van go-
tinê xwe ye. Jiyanê kesekî nizamim,
belê ya min bi şanseke pir nexwaş
dest pê kiriye. Û heta îro ew tale/
bext bi min re der bi der digere.
Tenê nîfşê berê dizanin bi gunde-
warî jiyan çi ye û çawa ye!

Belê, berî salê hezar nehsed
heftê çaran yan jî çar salên berî he-
zar nehsed heftî de ne kehrûbar/
cereyan hebû ne jî xaniyê me yê
ser bi kirmît hebûn; û em di bin
dilopê baranê û şevê tarî de di nav
hinek nivînê gir û giran yên herîyê



de fetidisîyan ku dersê xwe li mal bixwînin. Xwendin li ber çirê an li ber lamba qazê an li ber loksekê dibû. Loks jî pirr luks bû, li her malekê tunebû, tenê li mala axa û bega hebû. Em gundîyê belangaz şevê dirêj bi çîrokên derewînî yên bi xof ji devê mezinan derdiketin, mezin bûn. Por ji ber tirsan cinewarê çîrokan li serê me bilind dû, gij dibû em bi wan tirsan diketin xewê. Hele ew dêwê ziman dirêje agir ji dêv dipûrîn ditirsîn diketin bin nîvîna wer sibhe li me dihat. Sibe onlikê reş lê û yaka spî di ber qirke de şepqê bi bayraqê tirkan di serî de diketin îçtîmayê û bi xwendina îstîqlal marşî û ‘tirkê bextiwar im’ diketin dersê; em bi van êş û cefan mezin bûn, hatin van rojan.

Hêsan nebû hatina me vê derece, em di qûna derziyekê re derbas bûn gehêştin dibistana sereke û ya navîn li Xelikan û lîse jî li Konyayê xwendin, dû re fersend nedît bikevin zanîngeheke li gor dilê xwe; bi dizî, qaçaxî hatin Ewropa rojava di sala hezar nehsed heftê heftan de. Bi temamî va bû çel du sal in ez li Hollendê dijîm. Hatina min bo xwendinê bû, min dest pê kir berê qursa zimanê Hollendî li Zankoya Nijmegenê berdewam

kir. Di vê navberê de ketim pey mafê nîştecihî girtine bi rêga mafê xwendewarî salane îqamet girt. Di navberê de jî xwe ji *Colloquium Doctume* re amadekir yanê ketina îmtihanê zanîngeheke li welatekî biyanî. Min di Zanîngeha Teknîkê ya Delftê de di beşa Dizaynkirina Endustrîyê xwe nivîsand. Îmtîhana ‘Colloquium doctumê qezenc kir. Du sala xwend, lê serneketim, derbasî sinifa duwemîn nebûm/propedeuse negirt, dersê li Tirkîyê wergirtine têra vê beşa teknîkê nedikir, dest jê berda du sala jî çûm danîşgeha Laheyê bo Computer li wê jî ders hemû Îngîlîzî bûn nekarî dewam bikim, çûm li zanîngeha navdar Leydenê ketim îmtîhanê. Destpêka beşa zimanê rojhilata navîn beşa Tirkî-Farsî-Erebî; min bi sê zimana îmtîhana edebîyata îngîlîzî, almanî û hollendî kirin û necîh bûm. Di her dawî de beşa zimanê tirkî yê kevnare û nûjên di hezar nehsed nodûdudu qedand. Teza qedandinê li ser *Jiyana Cigerxwîn û berhemê wî* nivîsand. Ew bi resenî bi zimanê hollendî bû û dû re min wergerand kurdîya kurmancî û berfireh jî kir di nav weşanê Do de li Stenbolê di sala 2014an de weşand. Ji wir meyla min çû ser

bîoxrafi nivîsandinê yanê jînenîgerî nivîsandine.

Divê ez hinekê jî ji çalakîyê xwe yê taybetî behsbikim; ez nizamim ew çiqas kesatî ne ango kesanî ne, ji karesata Maraşê 1978an de ez li keleka xwendinê ji bo pîrsa kurd ketim nav çalakîyê polîtîk. Min li Tirkîyê dizanî li Hollendê komelek an dezgehekê kurdan a fermî ji alî kurdên bakurî ve hatî saz kirin tunebû. Lewra heman min ji roja qetîlama Maraşê de dest bi avakirina însîyatîfeke ango komîteyeke çalakîyan kir, li Lahey komîteya Newrozê amadekirinê bi şun de di 1979an de bi fermî *Komela Karkerên Kurd li Hollendê* bi yek du hevala va damezrand ku yekemîn komela li Hollendê ji alî karkerên kurd va hatiye sazkirin. Lijneya navendî em du xwendekarên zankoyê bûn. Divê sê kesan komele sazkirana yê seyemîn kesekî newêrîya bihata noterê li hizûra noterê navnîşanê xwe bida. Wê çaxê herkes ji xwe û kurd bûna xwe direvîya, ditirsîn ku nerin Tirkîyê. Min komelê heta demekê bi kurdekî Başurî li Hollendê penaber bû, bi wî re damezrand. Divê meselê dirêj nekim di demeke kurt de hevalê PKKê hatin bûn endam, ketin nav hevalan dest bi zext û probaxendê sexte kirin bi zorê komele zeft kirin dan terefgîrê xwe. Hê jî li Hollendê ew komela min

û Wuriya Karadaghî (xelkê Kerkûkê li Hollendê mîmar e) saz kiriye karûbarê xwe dimeşîne û gelek liqê xwe li bajerê din jî vekirine. Piştî hinek pîrsgirêkên siyâsî me herdu sazkerê KKKHê dest ji komelê berda û em çûn xwendina xwe derdewam kin. Komele ji hevalan re ma, lê ew ji jê hatin avêtin û hinek ji çûn welêt nezivirîn.

Belê, em bizivirin ser xwendina li zanîngehê me him zanîngeh dom kir û him jî li pê siyasetê doza Kurdistanê bûn, lê em carê bûne şervanê siyaseta nav malê, nikarin bisekinin bê çalakî, hêjî piştî du salê rejîma awarte 1982an min vê carê li gel çend karkerên kurdên Kurdistanê bakur me dest pê kir ji bo kurdê nîştîmanperwer û neteweperwer careke din bi navê *Komela Yekîtiya Karkerên Kurd* li Hollendê damezrand. Çend sal derbas bûn komela me tê de karê siyâsî û çandî dikir, ji ber dijîtiya kurdên sosyalîstên dijî nasyonalîst/neteweperesta ket destê sosyalîstan ango alîgirê PSK/KOMKARê. Ew komela hê jî heye û yek himdare/dameznêrê wê ez û nivîskarê ferhenga kurdî Dr. Îzolî ye ji Dersîmê bû.

Min piştî qedandina danîşgehê dest ji siyasetê aktîf berda. Çûm çend sala şixul kir bo ku dabara xwe bikim. Bi çend salan mutercîmî/wergêrbûm. Buroyeke geştiyarîyê

li Laheyê birêvabir. Niha nêzikî teqewutîyê me. Destê xwe ji dewlemendîyê berda. Ger wext bibe ez ê binivîsim. Jixwe min nivîsandin û jiyana xwe bi plan û proje bi rêva nebirîye Xwedê çi da ye her ew e.

Nivîsandin, min got ne bi amadekirinê yanê ne li gor projekê ye, bi tesadûfî. Ev çalakîyê min e sîyasetê li Tirkîyê li Lîse û saleke li Stenbolê mabûm, ketim rîya Rizgarîyê, çend hêjmar di 1975-76an de xwendibûn. Meraqa min a ser kurmancî û sîyasetê ji wir dest pê dike. Ew mijar dirêj in hewce nake serê we biêşînim. Min ji bo *Kurdistan Pressê* ya Orhan Kotanê rehmêtî re çend nivîsar ji rojnamên Hollendê yên di derbarê kurdan û çanda kurdan wergerandin di *Kurdistan Pressê* de bi navî *Uso* weşandin. Heta min çîrokeka xwe ya kurt a yekemîn bi navî *'Siluet'* bi kurdî nivîsand di *Kurdistan Pressê* de weşand. Ez hêdî bi xwe bawer bûm ku ez ê bi kurdî jî binivîsim û necîh bibim. Dûre ji *Dengê Komkarê* û ji *Dengê* re nivîsîn; di tora medya digital de di *Netkurdê* û *Kurdistan-poste.com* de çend cara nivîsarê lêgerîn û lêkolînî amade kirin. Di demê xwe yê vala de, di dema xwendewariyê de *'Navê*

Mîrovan Bi Kurdî' pirtûkek ji sê hezar zêdetir navê mêran û sê hezar zêdetir yê jinan komkirin şandin Tirkîyê di 1991an de li Stenbolê ji alî Weşanên Dozê ve hatibû çapkirin. Ew roj roja min sozdabû xwe ku ji dest min bê bi kurdî ansîklopedîyek an berhemêke wêjayî ku hemû kurd jê sudê werbigrin û bo dahatuya çand û wêjeya kurdî bikeve nav rûpelê dîrokê ku keda min berhewa neçe ji nîfşê nû re bimê.

Di dema rêvabirina *'Komela Yekitiya Karekerên Kurd li Hollendê'* de li ser navî komelê bi zimanî hollendî *'De Koerden'* berhevo-keke ji çend hezar nushan li ser dîroka kurd û Kurdistanê û kurdê li Hollendê weşand. Piştîre bi rêga pêwendîyê me yê li gel KOMKARA Almaniyê navend li Frankfurtê dû re Kolnê me berhevokeke wan a ji helbestvanê navdarên çar parçên Kurdistanê tomarkirî bi almanî weşandine, li Hollendê jî bi navî *'Kulîlkê Kurdistanê'* (*Koerdische Bloemen*) weşand gellekî bi kêrî hollendîya hat, çunkî ew berhevok bi zimanî hollendî derbarê kurdan de bû. Di wê çaxê de kêma agahdarî derheqê kurdan de hebûn. Ji xwe rêxistinîya kurd di wan salan di hezar nehsed heştê yî de destpêkir.

Heta nû behsa xwe û karê xwe yê ku min kirine bi kurtasî anî ziman. Ez bo çî ketim bin barekî giranî hêja yê ne bi mîrovêkî diviyabû bi komêk mîrovê zana û ehlî karê wêje û akademîk ku bike, min bi serê xwe dest pê kir. Li welatê ez li dimêmin kesê ku vî karî bike nebûn yan jî min nasnedikir. Lewra dest pê kir ku klasîkê cîhanê bi kurdî bi kurdan bidim hezkirin û kutubxaneyê kurdî hinekî dewlemendtir bikim. Jixwe karê min dixwest bikira min ji teza xwe danîşgehe ya Leydenê pirr sud girtibû. Nivîsandina jiyana Cigerxwîn bû, karekî weha bo destpêk. Min bawer dikir ez ê vî karî di çend salan de (ger temenê min bes be) bibim serî. Û jixwe karê bo dabara xwe kesayetî min gelek safî kiribû, min digo dûre di dema vala û teqewûdê de çêbikim. Biryar girtibû ji 2009an de dest avêt ansîklopedîya û wikipedia/internet an googlê belge û dokuman tomarkirin û xwe diceriband ji bo vî karê pîroz. *Guldestek ji edebîyata cîhanê* cîld I derket di nîsana 2019an de li Tirkîyê. Heta niha hê ti rexne û danasandin li ser wê çênebûne. Zahmetê ku hatine pêş min di amadekirinê de:

Edebîyata klasîk nav li ser e, kevn e û dem û dewr ser re derbas bûye; bi sedsala dem ser re qewimîye, jiyana û tore û civakê wê demê nivîskarî û nivîskar bi xwe di çî rewşê de bûne; me ev hemû kirine pîrsgirêk ji we xwendewarê kurd re hinekî zelal bikin û pê re jî hêsan-tir bikin ku jiyana wî/ê nivîskarî/ê di çî şert û mercan re derbas bûye; ku kes ji ber xwe nebûye nivîskar û navdarê klasîkê cîhanê.

Bi kurtasî bînin ser mijare; nivîskarê klasîk ji bijarte nivîskaran wergirtin, tabî ne mimkûne derbarê hemû nivîskarê cîhanê de lêgerîn û lêkolînê bo ansîklopedîyeke bi zimanê kurdî bikî, ev ne karê kesekî bi tenê ye. Li cîhanê belkî bi deh hezaran belkî bi sed hezaran nivîskar hene. Me ew mijar ji xwe re nekir armanc, armanca me bi çend bijarte nivîskarê nûjen û klasîk bisînor kiriye ku ji kutubxana kurdî re alavek yanê arîkariya îlmî û zanyarî bînin holê ku nîfşê nû û nivîskarê heyî û yê bînin jê sudê bigrin. Mînak me Goethe alman girt wek nimûneke cîhanê pê dizane ku Goethe îlham daye dinê û ji cîhana îslam jî wekî ji Hafîs û Şîrazî yê Farsî kelk girtiye. Bi xwe gotiye min heta ew

çarînê wan yê efsanewî nexwendin ez ewqas jîr jêhatî nebûm li ser dîwana nivîsandîye bi zimanê almanî. Wî gellek helbestê rûhanî û sûfîsma ewropî û rûhanî nivîsandine û îlham jî daye wêjeya cîhanê. Lêgerîna derbarê karê ansîklopedîk de ziman zanîn yekem zor girîng e, ger çend zimana pirr baş nebe jî pêwîst e tu bizanî, dibê tu hinek îlmê ansîklopedîkî bizanî, ku tu çi karî ji bo kê/kî dikî, daxwaza te çi ye û merama dilê te çi ye, ger tu van bizanî qonaxê tê re derbas bî hinek hêsantir dibe.

Çimak tu klasîka dixwinî divê hinek pêwîst e tu baştir ji klasîkan fahm bikî, dewr û dema wan binî berçavan. Ger tu bêjeke weke surre-alîzm, kubîzm an ekspresîyonîzmê rastê hatibî, dibe tu ne ji bo xwe ji bo raya gelemperî û xwendewarên ku te kirine armanca lêkolînê xwe, divê tu pirr baş bizanî ku di nivîsarê de ew bêje bikarhatî wan jî şîrove bikî an jî bi jêrenotan ji civakê gelemperî re zelal û aşkere bikî ku têbigehêjin.

Di rastîyê de nivîskaran bi xwendewanê xwe bidî naskirinê û jiyan wî berhemê wî jî di nav de. Yek din jî hemû berhemê nivîskarê min kirine armanca lêgerînê ne mimkûn

bû ku wan hemûyan rave bikim. Yê ku min xwendî hebûn yê ku min bi kurtasî xwendî hebûn; yê ku min hîç nexwendî jî hebûn; hîn caran jî bi kurtî li ser wana dişopand ku ew di kijan qonaxan re derbas bûne hatine gehêştine rojên me. Hinek nivîskar hene tenê jiyan wan weke bîoxrafîyekê an nivîskar hene bi xwe oto-bîoxrafîyê xwe dikarin di salekê de jî an di çend salan de jî biqedînin. Ev dîsîplînekî bi serê xwe ye. Lêkolîner an oto-bîoxrafî-nivîsar gellek ked û zemanê xwe divê bide vî karî. Di derheqê hinek nivîskarên weke Schiller an Goethe an Shakespeare bi sedan bi hezaran pirtûk, maqelên zanistî hatine nivîsîn ewqas bilindîya kutubxanekê. Lewra ya ku min kiriye beşeke ji jiyan wan nivîskarên bi berhemên nêrx bilindbûyî ye tiştekî li pirtûkxanê kurdî zêde bike. Ger wek xwendewarekî perwerdeya navîn li jiyan xwedan klasîker bigerî bi hêsanî ji vî berhema dest we de sud werbigrin. Hunermend û berhemê hunermend ji hevdu cuda nabin.

Çiqas hunermendê wêjeyayî kirine nav rûpelê pirtûkê ez ê ji we re bi nav rêz kim ku hûn bi hêsanî bibînin û bala we bixşînim ser vî

1. Necip Mahfuz (1911-2006, Misir)
2. Sadik Hidayet (1903-1951, Îran)
3. Amin Malouf (1949--, Lubnan)
4. Mahmud Derweş (1941-2008, Filistin)
5. Harry Mulisch (1927-2010, Hollende)
6. Jan Wolkers (1925-2007, Hollende)
7. Eduard D. Dekkers (1820-1887, Hollende)
8. J. W. von Goethe (1749-1832, Almanya)
9. Günter Grass (1927-2015, Almanya)
10. Heiner Müller (1929-1995, Almanya)
11. Frans Kafka (1883-1924, Almanya)
12. Bertolt Brecht (1898-1956, Almanya)
13. F. von Schiller (1759-1805, Almanya)
14. Thomas Mann (1875-1955, Almanya)
15. Gerard Reve (1923-2006, Hollende)
16. Gerrit Komrij (1944-2012, Hollende)
17. August Strindberg (1849-1912, Swêd)
18. Selma Lagerlof (1858-1940, Swêd)
19. Astrid Lindgren (1907-2002, Swêd)
20. Andre Gide (1869-1951, Franse)
21. Jean-Paul Sartre (1905-1980, Franse)
22. Albert Camus (1913-1960, Franse)
23. Simone de Beauvoire (1908-1986, Franse)
24. Frantz Fanon (1925-1961, Franse)
25. Gustave Flaubert (1821-1880, Franse)
26. Honore de Balzac (1799-1850, Franse)
27. Victor Marie Hugo (1802-1885, Franse)
28. Amos Oz (1939-2018, Îsrail)
29. Samuel Yosef Agnon (1888-1970, Îsrail)
30. Voltaire (1694-1778, Franse)
31. Emile Zola (1840-1902, Franse)
32. Samed Behrengi (1939-1967, Îran)

karê min kiriye:

Ev nivîskar tev jiyan û berhemê xwe di pirtûka min a bi navî *‘Guldestek ji edebîyata cîhanê’* de kirin mîjar. Hûn ê di derbarê van nivîskaran de ji her alî de bibin xwedan agahdarîyên bêhempa, çimak evqas nivîskarên bijarte di vê cîlda yekem (I) de cîh girtine. Ku mîrov bi enterese bibe li ser wêje û zanîsta edebîyatê pêwîste her kesayetî bibe

xwedan cîldeke ji vê berhemê bi keda deh sala ne. Ez wek kesayetî bi serê xwe xwedan dozekê me ku min ev berhem gîhande dest xwendekar û ronakbîrên kurd. Ji wê jî xwendin û nirxandin daxwaza me ye ku emek û keda me cîhê xwe dîtibe di çanda me de.

Jêrenot: Cîlde 2emîn çi wextê ya derkeve bi teqat û rewşa tendûristîya me û temenê me ve girêdayîye.

Ma tu nizanî

Bijangên wek tîran
Sîng qelaştin dil xwîn kirin
Çavên şîn
Wek ewrên li asîman
Tijî baran
Lehî ya jîyanê de
Ser û bin av kirim
Çend caran
Min girtî bû
Bi ta û telakî por û biskan
Ne fetisim.

Xwazî dengbêjek bûma

Ser rêça evînê bûma
Stran biweşandina
Bi dildamayî ya te
We bidîta
Dildayî çi ye
Evîn çi ye
Evîndar kî ye.

Xwazî bilûrvanek bûma

Ber bêlek pez şivanek bûma
Li deşt û zozanan
Dengê bilûra min
Sermest bikira bêrîvanan
We bidîta
Bêrî çi ye
Bêrîvan kî ye
Dildarî çi ye
Bilûrvan kî ye.

*Hesina, dîrok, civak û
folklor* kitêbeka li ser
gundê Hesina ye. Mehtab
Îdelî û S. Erdem li ser
folklorê gundê xwe
lêkolane.


Ji dîrok û ji
damezrandina gund
heta pêşvehatinên
nû: ji coxrafya,
ziman, malbat, heta
kevneşopîyên gund,
ji rengê babetên
xwarinan, heta
berhemên gund yê
taybet nimûne hene:
tevn û teşî, kinc û

kol, ji edet û rizmên xwe, zewac û dawet, mirin û şîn, lîstikên zarokan,
çîrok, meselok û pêkenîn, ji zargotina xwe kilam, dengbêjên gund, lorîk,
zûgotinok, mamik, gotinên pêşîyan, dua, nifir, azar, çêr, lome û tokilme
berhev kirine û di vê kitêbê de bi cî kirine.

Mehtab Îdelî û S. Erdem bi vê xebatê xwe ya hevpeş û kolektîv zanyarîyên
folklorîk ên kurdên Anatolîyê dewlemendtir kirine û gotinên ku li ber
wendabûnê parastine.

Beşa li ser çêkirina xwarinan, bi resimên rengîn in.

Kitêp bi wêneyên kevn û nû yê ji gundê Hesina ve hatiye xemilandin.





Salên 1930î li Încovê hilanîna xermanan
Yê ku li ser dûganê ye, kurê Hecî Mistefa, Hecî Musa Kart e.